


# NÜDEM

No 8 1993



Kovara Hunerî, Edebi û Çandî

# XELATA NÜDEM YA ÇIROKAN

Wek me berê jî dabû xuyakirin, wê kovara me NÜDEM xelateke edebiyatê bide. Niha diyar bû, ku em ê sala pêşî ji nava şaxên edebiyatê, xelata kurteçirokan bidin. Di salên pêş de jî, bi jûriyên cihê cihê, em ê di warê helbest, roman, lêkolîn û resim de jî xelatan bidin.

Kurteçirokênu ku beşdarî xelata NÜDEM'ê bibin, divê berê li tu cihan nehabibin weşandin, bi kurmanciya alfaba latînî bin, bi celebekî ku xweş bêne xwendin ( daktîlo, computur, an jî bi destniviseke zelal ) hatîbin nivîsandin.

Ji bo beşdarêni li derveyî welêt û yên li Ewrûpa şes kopyayêñ çirokê, ji bo yên li welêt jî, ger îmkan tune be, kopyayeke çirokê têr dike. Her beşdar divê resimekî xwe û bi kurtayî jiyana xwe, di zerfeke piçûk de, di hundurê zerfa xwe ya mezin de bişne.

Xelatgirê yekemîn **4 000 000** Lîrayêñ Tîrkiyê.

Xelatgirê duwemîn **2 000 000** L.T.

Xelatgirê sêyemîn salek abonetiya NÜDEM'ê û şes pirtûkên Weşanên NÜDEM.

Kurteçirokênu ku xelatê bigirin, ew ê an di eynî hejmara NÜDEM'ê de, an jî di hejmaren cihê cihê de bêne weşandin. Yênu ku xelatê negirin, lê hêjayî çapê bin, ew ê bi hilbijartina jûriyê û bi hersê xelatgiran re mîna pirtûkekê bête çapkirin.

Xelata NÜDEM ya çirokan wê ji salê carekê di demsala payizê de bête belavkirin.

Ji bo demsala 1994'an, divê çirok derengtirîn heta dawiya tîrmeha 1994'an bigihîjine me.

Ji bo enformasyoneke hê zêdetir, hûn dikarin ji NÜDEM'ê re binivîsinin.

Jûriya NÜDEM'ê ya kurteçirokan ji van kesan pêk tê:

Nacî KUTILAY (Nivîskar)

Mehmed UZUN (Nivîskar)

ROHAT (Lêkolîner)

Şahînê Bekirê SOREKLÎ (Nivîskar)

Fawaz HUSSAIN (Nivîskar)

Firat CEWERÎ (Nivîskar)

## NÜDEM



Xwedî û Berpîsiyare Gîşî:  
*Chief Editor*  
Firat CEWERÎ

Hejmar: 8  
Zivistan: 1993

Şertên abonetiyê (salek)  
Swêd: 190 Skr.  
Amerika û Australiya bi balâ-  
firê 49 \$  
Welatên din 39 \$  
Postgiro: 636 36 25-2  
ISSN: 1103-1964

Wêneya bergê: Tekin Firat  
Pergela rûpelan: NÜDEM


Nivîskarên vê hejmarê:  
F. Cewerî, R. Barnas, H.  
Qazî, Malmîsanî, Rohat, M.  
Uzun, F. Huseynî, B. Epöz-  
demîr, N. Hêcîbî, Z.  
Haco, X. Duhokî, Jan Dost, S. B.  
Soreklî, M. Keleş, R. Xerzî, N.  
Kutlay, M. Aydoğan,  
A. Bîçer, H. Hebeş, M. Mayî, Y.  
Erdogân, Z. Zinar, A. Cantekîn,  
L. Polat, D. Mêgerî, M. Ferho, F.  
Pîrbal

---

**Navnîşan**  
Termov. 52  
175 77 Järfälla  
SWEDEN  
Tel û Fax:  
08-583 564 68

## NAVEROK

- SEDSALIYA CELADET ALÎ BEDIR-XAN / F. CEWERÎ, 3  
MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN / R. BARNAS, 14  
ŞAHŞIWARÊ QADA ZANÎNÊ; CELADET BEDIR-XAN /  
Haviz QAZÎ, 16  
ROLA CELADET BEDIRXAN / MÂLMÎSANIJ, 17  
PIYONEREKİ ZIMANÊ KURDİ; CELADET BEDIR-XAN /  
ROHAT, 19  
RONAKBÎREKÎ BÊHEMPA; CELADET ALÎ BEDIR-XAN /  
Mehmed UZUN, 20  
EZ XWÎNA XWE NADIM TE / Fethula HUSEYNÎ, 21  
PÊNC HELBEST JI / Rojen BARNAS, 22  
SÊ RENGÎN KESKESORÊ / Mehmed UZUN, 26  
AWAZÎN XERÎBIYÊ / Bedirxan EPÖZDEMİR, 33  
DI MEM Û ZÎNA EHMEDÊ XANÎ DE ASTRONOMÎ / N.  
HÊCIBÎ, 35  
BEHRAM / Zagrosê HACO, 39  
E. MIZÛRÎ / Xefîl DUHOKÎ, 41  
RÜPELA DAWÎ DI AVESTA DE / Jan DOST  
KUJTINA ROYÊ / Ş. B. SOREKLÎ, 44  
DELAVÊ EWRAN / Mervanê KELEŞ, 48  
NAZELÎNÊ / Rizoyê XERZÎ, 48  
KURD Û ERMANÎ / Naci KUTLAY, 49  
TONI MORRISON / Mustafa AYDOĞAN, 57  
SÊ HELBEST JI / Alî BÎÇER, 60  
MEKSÎMÊ HEMO / H. HEBEŞ, 62  
YEKÎTYA NIVÎSKARÊN KURD ŞAXÊ DUHOKÊ /  
Mehfûz MAYÎ, 70  
TU İSHAQ Î... CEMİLEK Î / Yılmaz ERDOĞAN, 75  
ŞÊX EVDILQADIRÊ GÊLANÎ / Z. ZINAR, 84  
REXNE Û DANASÎNA PIRTÜKAN /  
Ahmet CANTEKÎN, 88  
Lokman POLAT, 92  
Dilower MÊQERÎ, 97  
Medenî FERHO, 101  
Ferhad PÎRBAL, 103  
AGORA / Amadekar: M. AYDOĞAN, 110  
LI MALA OSMAN SEBRÎ / F. CEWERÎ, 114



**Tabloyek Gulcan Zirek**

---

# SEDSALIYA CELADET ALÎ BEDIR-XAN



---

Firat CEWERÎ

"Kurd ji hev cuda dilopêñ baranê ne, cihê cihê têne daqurtandin. Ko gihane hev dibil lehî, lehîke boş. Tu kes, tu tişt li ber wan nikare bisekine. Felata welaî me di rabûna vê lehiyê de ye"

( Celadet Alî Bedir-Xan Hawar, hej 2, 1932 )

"Xorto! Holê bixebite: An bi xwe çêke, an arşariya ewan bike ko çêdikin, ava dikin... Di dinyayê de tu tişt nîne ku tekûz bit. Di her tişt de, nemaze di karên nû destpêkîrî de, pîrîcar, kêmancî hene. Heke te kêmancî dîtin, hema dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevi nav wan, arşariya daniyan bikî û wan kêmancîyan bieidilînî. Hilweşandina stûnekê hêsanî ye. Huner di rastkirina stûna xwêl de ye."

( Celadet Alî Bedir-Xan, Hawar, hej 17, )

**D**i 26'ê nîsana 1893'an de, yanî berî niha bi sed salî, di xweşrojeke biharê de, mîzgîniya ku lawîkek ji Emîn Alî Bedir-Xan re çêbûye digîhiyê. Emîn Alî Beg bi vê mîzgînî û nûçeya han kêfxweş û dilşa dibe, pêlên evîna dilê wî ya li hemberî jîna wî ya çérkez xurt û gur dibil û navê vî zarokê nûçêbûyî dike Celadet. Celadetê biçûk, zarok û neviyê Bedir-Xaniyan, ji dinyayê bêhay, ji sîrgun û zehmetiyên jiyanê bêxeber mezîn dibe; zarokekî esmer, xwînşêrîn, biaqîl û qedîrgir jê derdikeye. Rewşa vî zarokî malbatê

kêfxwêş dike, biaqilî û giraniya wî dilê bavê wî *Emîn Alî Beg* fireh dike, hêvî û baweriyeke xurt dide malbat û merivên wî. Bavê wî yê xwendê û dinyaditû, ji bo ku lawê wî yê çeleng li Stembolê di nava çerxa asimîlasiyonê de asimîle nebe, ji kultur û zimanê xwe, ji stran û çirokên xwe yên kurdî bi dûr nekeve û mîna kurdekkî xwenas bigîhê, ew ji welatê xwe, ji kevnebajarê kultur û medeniyetê, ji *Cizîra Botan*, dengbêj û stranbêjîn kurd tîne Stembolê û *Celadetê* biçûk û jîr bi stran û çirokên kurdî, bi hest û hîsêñ kurdî mezin dike. *Celadet* car caran naveroka stran û çirokên xwe ji hevalên xwe yên çerkez, ermen, yunan û tirk re dibêje, bi wî temenê xwe yê biçûk kultura xwe bi wan dide naskirin, bal û meyla wan dikisîne ser kultur û zimanê xwe.

*Celader* di xortaniya xwe de bewesa xwe berdide ser eskeriyê û dixwaze di dibistanekê eskerî de bibe xwedî rutbe. Ev xortê ku wê paşê bi hemû hêza xwe ve xwe biavêje meydana kultur û ziman û bibe humanistekî bêhempa, ji bo çi eskerî bala wî dikisîne û ji bo çi ew dixwaze têkeve dibistana herbiyê, dê û bavê wî bi xwe jî pê nizanin. Heta tê gotin ku ev birtyara wî bêî dilê dê û bavê wî bûye. Lê wî birtyara xwe dabû, wî ê bixwenda. Wî birtyara xwe bi cih anî, kete dibistana herbiyê, dibistana xwe bi serifîrazî qedand û bû zabitekî jîr û jêhaû. *Celadetê Zabit* di dema şerê cihanê ê yekemîn de, di ordiya *Osmanî* de dikeve cephe û ji sînorê Tikiyeya îro bi dûr dikeve, dihere Qefqasyayê û li Baku û Tebrizê dimîne. Lê ordiya wan zêde li ber rûsan xwe nagire û ew împeratoriya ku ji Qefqasya bigire heta welatên Balkan bi sedsalan hukumdarî kiribû, hêdî hêdî ji hev de dikeve, ordiyên wê cih bi cih dişikên û ew împaratoriya ku bi sedsalan jiyana xwe domandibû, êdî dimire. Hem împeratoriya Osmaniyan dimir, hem jî tu nemabû ku Tirkiya îro jî ji navê rabûya. Lê di bin serokatiya *Mustefa Kemal Paşa* de û bi alîkarî û piştgiriya kurdan, şerê bi gotina tîrkan "xelasiyê" tê dayin û welat ji bin destê bi gotina tîrkan "dagirkeran" derdikeye, piştî kongreyê Erzerom û Sîwasê bingehê Cumhûriyetâ îro tête avêtin û ew roj ev roj e îdeolojiya avakirê cumhûriyetê *Mustefa Kemal "Kemalîzm"* dibe mîna vîrusekê û dikeve laş û mîjîyen bawermendên vê îdeolojiyê. Digel ku ev heftê sal in di ser avakirina Cumhûriyetê re derbas bûye jî, hê jî ji vê nexweşîya han re tu derman nehatîye dîtin, şerê bijîjk û operatorên ku xwestine vê vîrusê bikujin, an çareyekê ji vê nexweşîyê re bibînin, hatine jêkirin û ev heftê sal in ku gelê kurd ji derdê vê nexweşîya han dinale.

Herçiqas *Celadet Beg* û malbata xwe di destpêkê de dilxwaz û piştgirê *Mustefa Kemal Paşa* bûn jî, ji ber ku baweriya *Celadet Beg* şikestibû û wî dizanibû ku ew ê miletê wî bibe hevwelatiyên sinifa dudan, wî û piraniya malbata wî destê xwe ji *Kemal Paşa* kişandin û xwestin ku ji bo kurdan, ji bo nasnav û welatê wan têkoşînê bidin. Cumhûriyetâ ciwan nikaribû ev debar bikira, bi rê û metodên nemirovane çûne ser vê malbata bermayên mîrekên *Cizîra Botan* û gelek ji wan eşandin, kuştin, ji welêt bi dûr xistin, sirgûnî welatên xerîbiyê kirin. Di nava yên sirgûnbûyî de *Celadet Bedir-Xan* û malbata xwe jî hebûn. Stemkarî û sirgûna kambax ev malbata esilzade û



zexim ji hev de dixist, berê wan bi welatê xerîbiyê vedikir. Bavê *Celadet Emin Ali Beg* û birayê wî yê mezin *Sureya Beg* xwe diavêjin welatê xwediyê medeniyetê kevnar Misrê, *Celadet* û kekê xwe *Kamûran Beg* jî berê xwe didine Almanyayê. Ev mirovên bi disiplin û xwedî berpirsiyar li Almanyayê nabin hêşîrên jiyana sîrgûnê û têk naçin, lê bi jîri dest bi xwendina unîversîteyê dîkin, di dersên xwe de gelekî bi serketî dibin, zû xwe dixine çavêm mamosteyên xwe û ji bo kurdan dibine mînakêñ çak û qenc. *Celadet Beg* ji derveyî dersên xwe yên dibistanê jî gelek berhemên cihê cihê dixwîne, li ser tevger, nêrîn û felsefeyên cihê cihê radiweste. Mîna gelek ronakbûrêñ wê demê ew ji gelekî ji *Nietzsche* hez dike, cih bi cih di bin tesîra felsefeya wî de dimîne û pirtûka wî ya bi navê "Zerdeşt Wilo Kerem Kir" ji ber serê xwe hilnayne û bi xwe jî dibîne ku ev filosofê Alman yê mezin bê çîqasî di bin tesîra felsefeya *Zerdeşt* pêxember de dimîne. Piştî wê bi salêñ dirêj ew ê beşekî bicûk ji pirtûka *Nietzsche* di *Hawara* xwe de biweşîne û bi wî awayî *Nietzsche* bi bîr bîne.

Lê belê her hişê wî li ser welatê wî ye, her liv û tevgerek ku li welatê wî çêdibe dilê wî şâ dike, hêviya wî xurt û qewîn dike. Gava di sala 1925' an de di bin serokatiya *Şêx*

*Seîdê* kal de li Kurdistanê serfîhildan çêdibe, hêviyên *Celadet Beg* xurt dibin, ji bo biserketina şoressê tiştê ji destê wî tê ew dike. Lê pir tê re naçe, Ordiya tîrkan bi ser serfîhildanê de digire, serok û birêvebirêñ serfîhildanê digirin, bi rê û metodêñ nemirovane li nava kuçe û kolanêñ gund û bajarêñ Kurdistanê wan gulebaran dike. Gund û bajaran jî wêran dike û heta gorî ku carinan kal û pîrêñ kurdan niha behs dike, heçê navê wan bi tipa "Ş" dest pê dike, têne kuştin. Gava ordiya tîrkan ji Kurdistanê vedikişê, li dû xwe gundêñ wêran, xaniyêñ xerabe û di nava şewat û dixanê de zarokêñ sêwî û stûxwar dihêle.

Serfîhildana *Şêx Seîd* şikest, ew birayêñ ku bi tîrkan re ji bo xelasîya Tîrkiyê şerê "xelasîyê" kiribûn, ji aliyê birayêñ xwe yên tîrk û musulman ve hatin gulebarankirin, gundêñ wan hatin wêrankirin, daristanêñ wan hatin şewitandin. Ev hemû ji bîra *Celadet Beg* naçin. Ew bi wan bîranînan radizê, bi wan radibe. Gav û saet ew di bîra wî de ne. Ew li riyekê digere. Li riya xelasî û serbixwebûnê. Li riya felatê... Ew bi wî serê xwe yê tijî fîkrîn têvel berê xwe dide Libnanê, diçê Bêrûdê. Li Bêrûdê kurd gihane hev. An jî rewşa kambax, stemkarî, jiyana sîrgûnê ew anîne ba hev. Wan di nava xwe de komeleyek bi navê "Xoybûn"ê ava kirine, ew dixwazin tola xwîna şehîdîn xwe hilînin, welatê xwe yê ku ji dest çûye bi paş de bistînin, ji wê jiyana zehmet ya welatê xerîbiyê rizgar bibin, li ser axa welatê xwe bi azadî û xweşî bijîn. *Celadet Beg* dibe yek ji endamên komelê yê girîng. Hîn wilô di bin serokatiya *İhsan Nûrî Paşa* de, li Agiriyê kurd radibin ser xwe û dixwazin biyaniyan ji welatê xwe biqewirînin. Ev serfîhildana ku bi aîlikariya *Komeleya Xoybûnê* li çiyayê Agiriyê diqewime ji *Xoybûnê* re dibe nişana azadî û xelasîya kurdan. Loma, hema ew tavilê li hev dicivin; axa, serokeşîr, zana û pêşengêñ cîvalê li hev dicivînin û dixwazin bi her awayî ji serfîhildana Agiriyê re bibin

alîkar û piştgir. Ew xeberê digihînin serokatiya serfildanê û bi wan dide zanîn ku ew ê ji milê Îranê de li tirkan bixin û bi wî awayî serfildanê fireh bikin û bikin berxwedane-ke Kurdistanî. Lê mixabîn tirk bi ordiyeke xurt, bi tanq, top û balaflaran digirin ser Agiriyê û çi benderuh dikeve ber wan ew dikujin. Serokê serfildanê *Îhsan Nûrî Paşa* xwe dide alî, diçe Îranê û pişti bi salan di nava tenêtî û bêdengiyê de, bi hesreta welêt çavên xwe digirin û digihê heqîya xwe.

Ev şikandina han jî dilê *Celadet Beg* bêhawe dişikîne, heta tê gotin ku pişti wê baweriya wî bi siyasetê sist dibe, ew xwe bi hemû hêza xwe diavêje meydana kultur, ziman û edebiyata kurdi. Ew dibîne ku pişti şikestina serfildan û liberxwedanê kurdan, kurd ji aliyê moral ve jî dişikêñ û ji tîrsa karbidesten Cumhûriyeta Tirkîyê ew ji ziman û kultura xwe bi dûr dikevin, dîbin biyaniyên xwe. Ew têdigihîje ku pişti nifşekî du nifşan dê gelek kurd asûmîle bibin, ji xwe û ji nasnava xwe bi dûr bikevin û dê bi wî awayî navê kurd û Kurdistanê ji ferheng û nexşeyên cîhanê bête maliştin. Ji bo ku ew pêşî li vê yeka han bigire, ew tavilê dest diavêje alfabeşa xwe, ya ku wî di salên 1919'an de nîvcî hiştibû û wê li ser hîmê alfabeşen lafinî durust û têkûz dike. Ji bo ku ew bikaribe alfabeşa xwe di nava kurdan de belav bike, zimanê kurdî yê nivîskî bi wan bide zanîn, ew bîryara derxistina kovarekê dide û navê kovara xwe dike *HAWAR*. Ew hejmara pêşî ya *Hawarê* di panzdehê gulana 1932' de derdixe. Di pêşgotina hejmara pêşî de, ew di derheqa armanca kovarê de wilo dibêje: " *Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re rîya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tişî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyînê a pêşîn e.*"

Ew wî zimanê ku li ber mirinê ye jîndar dike, dixe warê nivîsandinê û bi wê yekê şerta heyîna kurdan a pêşî diyar dike.

Ji bo ku kovara wî di çarçoveyeke teng de nemîne, nebe malê grûp, partî, an jî bi tenê yê ideolojiyekê, lê belê ew bibe malê hemû kurdan, dengê hemû kurdan, ew dîsan di pêşgotina hejmara pêşî ya *Hawarê* de weha dibêje: " *Hawar ji niha û pê ve bi her tişî ko kurdanî û kurdî pê bendewar e, dê mijûl bibe. Tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê. Hawarê siyaset ji civatênen welaî re hiştîye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê ziman, hiner û sinhetê de dê bixebitin.*"

Û ew li ser ya xwe dimîne. Ew mîna ronakbîrekî kurd, bi her tişî ku hemû kurdan eleqeder dike ve mijûl dibe, lê xwe tenê bi nîrînekê, an jî bi ideolojiyekê ve girê nade, heta dawiya umrê xwe, ew Kurdistanî dimîne. Lê ez bawer im, gava ew dibêje ku ew ê bi siyasetê ve mijûl nebe, ne ku ew ji rastiya Kurdistanê direve, hebe tune be, ew naxwaze xwe bi rîexistinekê ve girê bide. Ger wî bi hemû awayî destê xwe ji siyasetê bikişanda, wî ê hewcedariya ku ew nameyeke dirêj ji *Mustefa Kemal Atattûrk* re bişîne, nedîta. Erê, ew di sala 1933'an de, yanî pişti weşandina kovara xwe bi salekê û pişti av-akirina Cumhûriyeta Tirkîyê bi deh salan di bin navê " *Ji Reisî Cumhûrê Tirkîyê Xazi*

*Mustefa Kemal Paşa re Nameyeke Vekirî*" nemeyeke dirêj dişine. Ew wê nameya xwe bi munasebeta bîranîna dehsaliya Cümhûriyetê û efûya giştû, ku Cumhûriyetê soz dabû, dişine. *Celadet Beg* di wê nameya xwe ya dirêj de, ku paşê mîna pirtûkekê çap dibe, bi ilmî rexneyan li *Mustefa Kemal Atatürk* digire û wan ji bo sozdayina wan derewîn derdixîne. Herweha ew di nameya xwe de li ser kurdan, li ser nasyonalîzma tîrkan radiweste û bi zanistîyeke lenguistîk mînakان ji zimanê kurdi dide. Ew di wir de dide xuya kirin, ku kurd ne tîrk in û xwedî kultureke cihê, zimanekî cihê û mîletekî cihê ye.

Em vegezin ser *Hawarê*. Dema ku *Celadet Beg* dest bi weşandina *Hawarê* û belavkirina alfabeşa xwe dike, hejmara kurdên xwendê kêm e, ci bigire tune ye. Lê, çend xorê din ên serxestî, ku ew ji ji ber gelek sedeman mecbûr mabûn, ku welatê xwe terk bikin û koçî binxetê bikin, digihê *Celadet Beg* û bi alîkarî û teşwîqêن *Celadet* ew dibin xwediyêن navêن mîna *Qedîcan*, *Nûredîn Zaza*, *Osman Sebrî*, *Cegerxwîn*...

Gava min di hevpeyvîneke bi *Osman Sebrî* re, pirsa ku wî "kengî dest bi nivîsandinê kiriye" kiribû, wî gotibû ku wî bi xêra *Celadet Beg* dest bi nivîsandina kurdi kiribû û ku ne ji *Celadet Beg* bûya, wî nizanîbû ku zimanê kurdi zimanê nivîsandinê ye an na. Herweha *Nûredînê Zaza* ji deyndarê *Celadet Bedir-Xan* e. Tê gotin ku her tim *Celadet Beg Nûredînê* xort dipesinand û ji bo teşwîqkirina nivîsandinê ew beramberî *Anton Çexov* dikir.

*Çexov* bi xwe jî di dema xwe de xort dipesinandin, ew teşwîqî nivîsandinê dikirin û gelek caran bi wan didazanîn ku ew ê bi nivîsandina berdewam bibin nivîskarêñ mezîn û navdar. Mirov wê nefşbiçûkahî û ruhiyeta teşwîqê di *Celadet Bedir-Xan* de jî xwes dibîne. Ji bilî navêن mîna *Qedîcan*, *Osman Sebrî*, *Nûredîn Zaza* û *Cegerxwîn*; ger zarakî, şivanekî an jî xwendevanekî jê re nameyek bisanda, wî tavilê ew name di *Hawarê* de diweşand, pesnê wan dida û ew jî mîna nivîskarêñ *Hawarê* dinavandin.

Em dibînin, ji roja ku *Celadet* bîryara xwe daye ku ew ê bi ziman û kultura kurdi dakeve, ew pê dadikeve, bi xebat û fedekariyêن xwe yên şexsî ji me re bingehê zimanê me yê ku biyaniyê nivîsandinê bû, dihêle.

Wek me li jor jî qal kiribû, gava ku *Celadet Beg* dest bi weşandina kovara xwe dike, hejmara kurdên xwendê kêm e. Lê ew yeka han wî bêhêvî nake. Kêmbûna xwendevanan wî dilşikestî nake û destê wî li karê wî sist nake. Wî xwe bi xwe digot: "Ger xwendevanêñ kurdi tunebin sedemêñ wê hene." Sedemêñ wê xuyabûn. Kurdistan Serbixwe nebûbû, erdêñ Kurdistanê yên rizgarkirî tunebûn, zimanê kurdi nebûbû zimanê nivîsandin û perwerdiyê. Rastiya welêt û rastiya mîletê wî ji wî ve xuya bû. Loma wî pir bi sebir, lê bi enerjiyekê bêhawê dixwest ku zimanê kurdi têxe warê nivîsandinê û bi wê yekê kurdan bike xwedî nasnav û şexsiyet.

Di sala 1987'an de gava ez li mala xanima wî *Rewsen Xanimê* bûbûm mîvan û min pirsa ku *Celadet Beg* çawan *Hawar* derdixist, jê kiribû, wê ev bersiva han dabû min: "Sev û roj li rehmetî tune bûn. Gav û saet kaxezin di dest de bûn, dixwend, rast dikir,

*diçirand, disan ji nû ve dinivîsand. Hawara wî mîna zarokeke wî bû. Her ku hejmareke nû ya kovarê derdiket, ew mîna zarokekî dîlşâ dibû. Lê hemû bar di sîuyê wî de bû. Ew geleki pê re diwestiya. Di mehîn destpêkê de min nikarîbû alîkariya wî bikira. Lê paşê gava ez hûnî rêzkirin û ambelajê bûm, min karê wî hebekî hêsanter kir."*

Ez baş bi tîraja *Hawarê* nizanim, lê tiştê ku *Rewşen Xanimê* ji min re behs kir, wê tîraja wê ne ewçend bilind be, wê li dor çend sed libî be. Piraniya wê li nava kurdên binxetê, yanî kurdên Sûriyê dihate belav kirin, çend lib digihîştin Tirkiyeyê, çend li digihîştin Iraqê û ez ne şas bim çend lib jî digihîştin Îranê. Lê ew çend libên ku digihîştin wan welatan jî li hemû bezkirên zimanê kurdî belav dibûn. Ji ber vê yekê ye ku em di kovarê de li gelek navên kurdên başûr rast tê. Yanî kovar di nava kurdên her welaşî de bûbû pireya hevdunasînê. Di kovarê de mirov ji bili kurmancî li zaravayê soranî jî, lê bi alfabeşa latûnî rast tê. Wilo xuya dibe ku di wê demê de bi fermî destûra zimanê kurdî li wan welatan hatibûya dayin û hejmara kovar û rojnameyên kurdî zêdetir bûya, em ê iro ji problema alfabeşî erebî û latûnî xelas bûbûna û wê mîna ku di *Hawarê* de jî belav bûbû, hem kurmanciya jêr, hem jî kurmanciya jor bi alfabeşa latûnî bihata nîvisandin û wê ferqiyeta herdu zaravayên kurdî yê mezîn hêdî hêdî hindiktür bibûya. Wek tê zanîn, *Hawar* li welatekî ku alfabeşa erebî dihate bikaranîn, bi alfabeşa latûnî derdiket. Em wê tesîra *Hawarê* û xwedîyê wê *Mîr Celadet Ali Bedir-Xan* iro ji dibînin. Iro di nava kurdên me yê Sûriyê de yê ku kurdî bi alfabeşa erebî dinivîsinin, çi bigire tune ye. Digel ku xwendina wan bi erebî ye, digel ku ew di dibistanan de hînî alfabe û nîvisandina erebî dibin jî, disan ew xwe hînî alfabeşa zimanê xwe ya latûnî dikin û iro bi sedan nîviskar, bi çendan kovar û pirtûkên kurdî ji aliyê kurdên me yê Sûriyê ve têne derxistin. Ev yeka han bivê nevê ji tradisyonâ *Celadet Bedir-Xan* û bi xêra kovara wî *Hawarê* dibe. Û tiştê ku *Celadet Bedir-Xan* jê diîrsiya, bi serê kurdên Tirkiyeyê ve hatiye. Pişî şîkandina serfîhîdan û liberxwedanên kurdan, tîrk bi metodîn ji mirovantiyê dûr çûne ser kurdan, ew eşandine, girtine, bi dar ve kirine, zimanê wan li wan qedexe kirine û dema ku *Celadet Beg* kovara xwe li Şamê derdixist, ji bo her gotineke kurdî li Tirkiyeyê cezayê peran dihate dayin, ji cezayê peran wêdetir, pirê caran cezayêni bi salan heps dihate dayin. Pişî nîvsekî, kurd di ber çerxa polîtîkaya asîmîlasyonê ya tîrkan de heliyan, ji zimanê xwe bi dûr ketin. Ger car caran di hin cihan de çîrtîskin pêketibin jî, dewlet bi xurtî çûye ser wan, bi girtin, lêdan û îşkencê dengê wan birîne. Em dibînin ku ew tesîra han ji ruhiyeta me "kurdên Tirkiyeyê" derneketiye, şoreşger û têkoşerên kurd, ku di ber Kurdistanâ pîroz de serê xwe didin, ji bo bidestxistina zimanê kurdî bi salan di zîndanan de radîzîn, lê ew bi xwe hewl nadîn ku bi zimanê xwe binivîsinin, bi zimanê xwe bixwînin, bi zimanê xwe bifikirin. Ez carinan ji xwe re difikirim, ku em kurd tenê mehekê tîrkî protesto bikin (di vir de xwestîna min ne ew e ku divê em li dijî tîrkî bin, ez bawer im tîrkîn dîlxwazîn kurdan jî wê li dijî bîryareke wilo demekevin) kovar û rojnameyên xwe bi kurdî derxin, kovar û rojnameyên bi tîrkî nekîrin, li dikana û çayxanîn xwe bi kurdî bîpeyîvin, li mehkemayan bi kurdî ifadeyên xwe bidin, yanî bi kurtayî di her warê jiyanê de bi kurdî bîpeyîvin û

bi kurdfî binivîsînin. Erê, tenê mehekê. Ez bawer im bicihanîna biryareke wilo jî wê ne ewçend zehmet be. Hingî em ê bibînîn ku wê çawan cih li dewletê teng bibe, dinyaya ku pirsa me bi terorizmê ve girê dide, wê çawan li bin guhêñ hev bikeve. Gava ez van çend rêzan dînivîsînim, ez *Mahatma Gandî* bi bir tînim *Gandî* ji xelkê Hindistanê daxwaz kir, ku ew kincêñ îngilîzan li xwe nekin, tiştên wan nekirin. Û xelkê wilo kir. Bi wê biryara hindîyan gelek fabrikayêñ îngilîzan çûne iflasê, darbeyeke mezin ya ekonomik li îngilîzan ket û biryareke wilo bû sedema dawîhatina împaratoriya Brîtanyayê ya li Hindistanê.

Lê îngilîzan zimanê hindîyan qedexe nekiribûn. Ger îngilîzan ziman û nasnava hindîyan qedexe bikirana, mirov texmîn dike, ku dê *Gandî* li hemberî bûyereke wilo, xelkê hindî vexwenda protestokirina zimanê îngilîzî.

Bi a min biryareke wilo ji bo me çekeke mezin e. Bi biryareke wilo hem em ê bikarîbin hebûna xwe bidine îspatkirin, hem em ê bikarîbin hebûna zimanê xwe bidine îsbatkirin, hem em ê mehkeme û daîreyêñ resmî yên tirkan mecbûri wergêran bikin, hem em ê tûraja kovar û rojnameyêñ tirkan li Kurdistanê û li Tirkiyê bixînin, hem jî em ê dawiya politîkayeke ku heftê sal in li ser înkariya miletê me hatiye avakirin, bînin.

Gava mirov li xebatêñ *Celadet Bedir-Xan* vedigere, mirov texmîn dike, ku ew niha li jîyanê bûya wî ê pêşniyareke wilo bianiya. Ji ber ku wî ziman, yek ji şertêñ heyinê yê pêşî didît. Ma qey ziman ne yek ji şertêñ heyinî yê pêşî ye ? Ma geleki bê ziman, netewekeye bê ziman hatiye dîtin ? Ger ziman yek ji şertêñ miletbûn û netewebûnê be, çîma em wesiyetnameya *zanayê* xwe Mîr Celadet Beg bi cih naynin û li zimanê xwe hûr nabin? Çîma em bi zanebûn an bi nezanî xwesteka dijminan bi cih tînin û ji fikra ku ew dibêjin zimanê kurdî tune ye, miletik bi navê meltê kurd tune ye, re dibine alîkar?

Gelek ji me li Ewrûpayê bi *Celadet Bedir-Xan* û xebatêñ wî hesiyan. Bi alîkariya ronakbir û weşanxaneyêñ kurdan pişti şest salî xebatêñ wî ji nû ve di nava kurdan de belav dibûn. Pêşî Mîrza *Hemreş Reşo* mîzgînî gibande me û *Hawara* ku li ber windabûn û jîbîrbûnê bû, ji hejmara 24'an ta hejmara 57'an mîna pirtûkeke qalind weşand û belav kir. Pişti wê weşanxaneya *Jîna Nû* kovara Mîr Celadet Bedir-Xan ya bi navê *Ronahî*, hejmara 1-28 bi hev re weşand. Herfî dawiyê ji Mîrza *Mihemed Bekir* ji hejmara 1'ê Hawarê heta hejmara 9'an bi çapeke bedew li Swêdê çap kir. Di vê navê de ji hejmara 10'an hetanî 23'an neçapkîrî maye. Em hêvidar in ku ew ê jî di nêzîk de bête çap kirin, ew kahniya ku kultur û edebiyata kurdî jê diherikî, ji nû ve der bibe.

Bi xêra van heval û weşanxaneyêñ kurdan, xebatêñ *Celadet Bedir-Xan* pişti bi pêncî şest salî ji nû ve ji me ve xuya dibûn. Gava em niha li zimanê wî, li nêrîn û felsefaya wî dînihîrin, em dibînin ku ew kurdeki intelektuel, pirhêl û dûrbîn bû. Mirov di nîvîsîn wî de li zanebûneke kûr, nefşbiçûkiyek ku ji zanebûna kûr diza û kurdâyetyeke pak û bedew rast tê. Herweha ew karekter û şexsiyeta pak û bedew di nîvîskarêñ din yên *Hawar* û *Ronahîyê* de digerin, ew jî mîna *Celadet Beg* dibine xwedîyê nnavêñ nemir û avakerêñ fikir û ramanêñ kurdperwer û liberalêñ çak.

Ew xebat û keftelefta *Celadet Beg*, ya ku iro ji geleki xwediyê nifûseke bi dehan mîyon mirov re bûye mîna kitêbên pîroz û ji bo ruhiyeta kurdhayetiyeke xurt bûye mîna aleke pîroz, bi hezar zehmetû, serêşî û bêimkanî hatiye pê. Wek me li jorê qal kiribû, ku ji xela xwendevan û nivîskaran pê ve, problema ekonomik yek ji problemên herî mezin bûn. Herçiqas li bin der û doran tête zanîn, ku Fransizan alîkariya *Celadet Beg* û kovarêni wî dikirin ji, li gorî malûmaten ku xanima wî *Rewzen Xanim* dane min,

Fransizan alîkariya *Celadet Beg* ya ekonomik nekirine, lê bi destûra Fransizan kovarêni wî derketine. Di derxistina van kovar û pirtûkên xwe de *Celadet Beg* ji bilî tab û keda xwe, ew di warê ekonomik de ji geleki eşiyaye, pirê caran ew hewcedar bûye. Ji bo ku ew bikaribe kovara xwe berdewam bike, li gorî ku mirov ji hin nivîsên wî yên di *Hawarê* de têdigihê, wî carinan kaxez zêde bi dest dixistin û ew li Bêrûdê, li bazara reş difirotin. Lê xuyaye vê yeka han zêde alîkariya wî nekiriye, loma ew carinan mecbûr maye ku navbirê bide kovarê û wê rawestîne. Ji ber vê hindê *Celadet Beg* rojek ji rojan mecbûr maye, êdî ji bo ku ew bikaribe jin û zarokên xwe xwedî bike û çend quruşen ku bi ser bikeve ji pê kovarê çap bike, li deriyê dostekî xwe ï xwedîerd dixe û jê tika dike ku erdê wî yê pembo bi nîvî biçîne. Dostê wî wê pêşniyara wî bi kêfxweşî qebûl dike û erdê xwe didiyê. *Celadet Begê* ku belkî di jiyana xwe de li kareki wilo nefikirbû, tavilê xwe kar dike, ji bo ku dostê xwe fedîkar dernexe û ji bo ku ew jin û zarokên xwe dilşa bike, herweha ji bo ku ew bikaribe karê xwe yê çapemeniyê bidomîne, dixwaze bi metodên nûjen erdê dostê xwe bi kar bîne û bereki baş jê wergire. Ji bo ku ew bikaribe bereki baş jê wergire, av lazim e. Ji bo avê kolandina bîrekê lazim e. *Celadet Beg* tavilê bîrekê dide kolandin û ji nava wî erdê bi bereket aveke zelal derdixe.

Lê pir tê re naçc, *Celadet Beg* di bîra xwe, ya ku wî navê "Bîra Qederê" lê kiribû, wer dibe û bi hemû xeyal û xewnerojkên xwe, di bîrê de dixeniqe û tevlî karwanê şehîdan dibe.

## **Celadet Bedir-Xan Bi Navêن cihê cihê**

Wek tê zanîn *Celadet Bedir-Xan* gelek navêن cihê cihê bi kar anîne. Wî ji bilî navê xwe yê rastîn, *Xwediye Hawarê*, *Bavê Cemşûd*, *Herekol Ezîzan*, *Bişarê Segman*, *Seydayê Gerok* û çend navêن din. Wî di bin van navan de gelek nivîsên cihêreng nivîsinê. Li ser gramerê, li ser eşîrên kurdan, li ser devokên zimanê kurdi, li ser klasikên kurdan, nivîsên civakî, yên tarixî, helbest, çîrok, werger û hwd... Gava mirov bala xwe dide nivîsan, di kijan warî de dibe bila bibe, mirov hostetiyeke tê de dibîne û ji şoperiyên nivîskarekî ecemî gelekî dûr e. Wek mînak, gramer û bingehê zimanê kurdi ku wî berî bi heftê salî avêtiye, em kurdêñ iro bê ji negîhistinê. Ya din, gava wî bingehê gramera kurdi avêtiye, ji bilî zaravayêñ kurdi yên mezin û sereke, ew li devokên herêmî ji fikirî ye, daye ber gelek zimanêñ Hind û Ewrûpayî û li gorî wê yekê bingehê zimanê me avêtiye. Herweha nivîs û lêkolînêñ civakî ji tu dibêji qey ew iro ji aliyê nivîskaren me yên herî xurt ve hatine nivîsandin. Heçî werger in, wî ji nivîskaren mîna *H. C. Anderson*, *Guy De Maupassant* ku li dînyayê navdar û nemir

diye kurdî. Di warê helbestnîvîsandinê de jî ew dikarîbû bibûya yek ji şâîrên dema xwe yê herî navdar. Gava min helbesta wî ya bi navê "Bilûra Min" ku di bin navê *Seydayê Gerok* de nivîsandibû, xwendibû, min gelekî jê hez kiribû û ez hê jî jê hez dikim.

Ez gotina xwe bi vê helbesta Mîr Celadet Bedir-Xan dawî tînim û wî di sedsaliya bûyina wî de bi hurmetgirî bi bîr tînim.

Herweha bi munasebeta bîranîna sedsaliya wî me pirsa **Di dîroka rewşenbîrî** û hişyarbûna gelê kurd de rola Celadet **Alî Bedir-Xan** û kovarêni wî (*Hawar û Ronahî*) çi ne? ji çend ronakbîrê kurd kîrin. Em bersivêwan jî diweşînin.



*Celadet Alî Bedir-Xan*

# Bilûra Min

Bilûra min a şîrîn  
tu di sariya sibehê  
û hingûra êvarê de  
hevalê bêbevalan,  
destbirayê şivan û dilketiyan î.

Dengê te  
hêstirêñ dilêñ xemgîran,  
silava ji hev-vegetiyan,  
girîn û zarîna dilketiyan  
tîne bîra min.

Bilûra min tu î,  
xemrevîna terkeserên dînyayê!

Dengê bilûra min,  
çiya û zozanêñ bilind,  
kaniyêñ bi gul û rihan dorgirtû,  
guhê şikeft û serê zinaran  
guhdarêñ te ne!  
Ü sura bayê xerbî  
te di nav pelêñ darê de digerîne.

Bilûra min, were em ê  
bi wî çiyayê bilind re  
bi hewa kevin,  
û bibin cîranê bayêñ xurt  
û hevalêñ kimtêñ wan  
yêñ bi mij û dûman,  
û tê de dengê xwe berdin,  
û zarîna dengê me  
bikeve nav kortal û gelîyan  
û bêcâniya erdêñ jêrîn  
bihejîne;  
û pêlêñ ava heftreng  
êñ xemzebaz

alîna me bigehîne  
deşta Sirûç û Diyarbekrê;  
û kalîna berxan  
tev şehîna hespan  
li me vegeŕînin.

Bilûra min, binêre û bibihîse!  
Roj çû ava,  
stêra êvarê bû ges,  
kolosêñ çiyan ên gewr  
û hewraniyêñ wan ên sor û zêrîn  
bûne çûn;  
û pêlêñ ava şevê ên reş  
ketine deşt û newalan  
heta rûyê gir û kepazan.  
Di qeraca de  
kevir piyê şevgera dixapînîn  
û bêdengîya şevê de  
pêjna lingêñ mîrxasan têñ.

Bilûra min,  
dengê xwe berde!  
Dinya, mîna zarokekî berşîr,  
ket dergûşa xwe;  
Dengê xwe berde, bilûra min,  
û jê re bîlorîne,  
xema wêç birevîne!  
Bilûra min tu î  
xemrevîna terkeserên dînyayê;  
û li rohelañ  
dema ko dînya hişyar dibe  
ji xew radibe  
ji me re  
strana azahî û serbestiya  
Kurdistanê  
binehwirîne,  
û dengê wê stranê, bila,  
mîna tîrêjîn rojê ên pak û zêrîn  
bikeve nav dil û gubêñ me.  
Bilûra min,  
Tu î xemrevîna dilketiyanê weleñ.

Seydayê Gerok, Hawar 32 (1941), 14

# Mîr Celadet Alî Bedir-Xan

Rojen BARNAS

**D**i dîroka neteweyan de hin kes hene ku berê herikîna dîrokê diguhîrin, herikînê bi lez dixînin, an jî wê herikîna bêserûber û kembikêrhatî tînin pîr û pergalekê didinê da bêtir bi kêrî daxwazê bê. Ev dîrok dibe ku bi tenê a leşkerî, a siyâsî an jî ya çandeyî be.

Di dîroka çandeyî ya kurdî (kurmancî) de *Mîr Celadet* yek ji van kesan e, ku berê herikîn û meşa nivîsara kurmancî guhartiye, bergehê wê fereh kiriye, xwendin û nivîsandina wê di nav piraniyê de belav kiriye û berî her tişî zimanê nivîski li ser hûmîn tekûz daye rûniştinê.

Ev nûvejîna (renaissance) çandeya kurmancî ye, meydan û navgîna vê nûvejînê jî kovara *HAWAR* e.

Di vê pêvajoya nûvejîna çandeyî de *Hawar*, hem bi maneya edebî û hem jî bi maneya perwerdeyî xwendegeh (école) e: Bi maneya perwerdeyî xwendegeh e: Lewra ji şair û nivîskar *Osman Sabri* (1) û nivîskar *Dr. Nûredîn Zaza* (2) bigirin gelek kesen wê demê di dezgehê xwendegeha *Hawar*ê de hûmî nivîsandinê bûn û dest bi nivîsandinê kirin. Bi maneya edebî xwendegeh (école) e: Lewra bi alfabeşa xwe ya kurdî-laşînî, bi sistema rast-nivîsînê, bi terminolojiyê, bi gramerê, bi zengînî û curbecuriya naveroka xwe *Hawar* ji kovar û rojnameyên berî xwe vediqete, di riyeke ber bi gel ve, ber bi piraniyê ve lê bi senteza neteweyîtiyê-neteweyîfike nûjen- belav dibe.

Hawar meydana çandeyî ya pêşerojên kurd e, ku li wê derê berhemên antîk û nûjen, rojhelaşî û rojavayî, kurdî û biyanî, dînperwer û laik bêî ku hevûdu biêşînin bi hev re dijîn.

Zanayê mezin *Mîr Celadet Beg* vê meydanê bi zanîn vekir da ku xwendevanên *Hawar*ê digel "Tefsîra Qur'anî" nûçeya "Kitêba Totê Reb", li rex "Hedîsîn Cenabê Pêxember" "Nivêjîn Ezidiyan" jî bi dilfirehî bixwînin. Ji alîkî ve wergerandinên *Xeyam* û li alîkî ve yên *Victor Hugo*. Ji alîkî ve şî'rîn klasik ên kurdî yên tefsîr û şerhxwaz ji aliyê dinê ve dûrik, dîlok, bêlûte û stranîn gelêri.

Û di van berhemên folklorîk de mezinahiya zanatiya *Mîr* ev e, ku gotin çawa

ji devê dengbêj, çirokbêj an gotinbêj derke-  
tiye bêgubertin û destîêdan bi navê bêjerê  
wê, bi bilêvkirin û devoka wan a herêmî  
her wisa çap kiriye.

Zimanê kurdî herçend li gora axaftina  
rojane dewlemend bû jî disa bersîva hewce-  
dariya nav û termên teknîk û zanistî nedida,  
ku ev valahî jî ji aliye *Mîr Celadet Bedir-Xan* ve li gora şert û hewcedariyên rojê hate  
dagirtin; Gelek termên gramerê, yên teknîkî  
û zanistî afirandinên wî ne, ku ji kurmancî  
re bi diyarî mane.

Bi alfabeşa kurdî-latînî, bi *Gramera Kur-*  
*mancî* di dîroka çandeya kurdî de *Mîr Celadet Bedir-Xan* kesê pêşîk e û herdû afiran-  
dinên wî bi tekûziyeke wisa hatine çêkirin  
ku di warê xwe de bingeh in. Hawar û  
Ronahî di rojnamegeriya kurdî de du  
nimûneyên wisa ne, ku di navberê de ev  
çend zeman bihuriye, bi dewlemendiya na-  
verokê, bi serûberiyê û bi sergiraniya xwe,

hê jî gelek kovar û rojnameyên me yên  
roja îroyîn negîhiştine sewiya wan. Ji  
bili vê, ev herdû hê jî kana (xezîne) bêje  
û termên kurmancî û embara berdest a  
berhemên klasik, gelêri û yên wê demê  
ne, ku gava em di tengiyê de dimînin an  
hewcedariya me çêdibe serif li wan dixin.

Ew rewşenbirekî wisa bû ku mamos-  
tayıya rewşenbîrî ya gelek rewşenbîrîn  
kurd kir. Di gelek waran de ew hê jî ma-  
mostayıya me dike. Ez wisa bawer im ku  
di sedsaleyên pêşeroje de jî ewê mamos-  
tayıya gelek zana û rewşenbîrîn gelê kurd  
bike.

1) Zaza, Dr. N., Osman Sabri nivîsevan û  
helbestvan, Apo(berhevoka şî 'îrê Osman  
Sabri ji aliye Hemreş Reşo ve, sal, cih û  
weşanxane nehatine nivîsandin)

2) Zaza, Dr. Nûredin: , Pêşgotin  
"HAWAR" û çanda kurdî, berhevoka Hawarê  
a hejmar 24-57 ji aliye Hemreş Reşo ve,  
sal, cih û weşanxane nehatine nivîsandin.

## Navnîşana NÜDEMê ya nû:

Termov. 52  
175 77 Järfälla  
SWEDEN

Tel û Fax: 08-583 564 68

## Şahsiwarê Qada Zanînê Celadet Bedir-Xan



Haviz QAZÎ

**S**ahsiwarê qada zanînê, xemxwarê peyva resen, xetîrehilgirê bizav û xebatên di şevêñ reş û tarî de, fedekarê xaka welêt, dilşewityî zimanê û torê dêrîn û hunerê rengîn, cihgirê kursiya şerefê li sîngê koşka niştimanperwerên Kurdistanê *Mîr Celadet Ali Bedir-Xan*, dihêt danan mîna pêşeng û serkêşê bizava rewşenbûri li sereta sedê bîstan de. Wê bizavê ji bo gelek xortêñ kurdan bizava riya rast rohnî kiriye, ku ew hest bi girîngî û tam û lezeta jiyana serbest bikin û xemê ji çanda netewa xwe bixwin.

Di destpêka çerxa bîstan de nivîskar, ronakbîr û torevanêñ kurd hindik bûn, têra dermankirina birînêñ civakî nedikirin. Di wê dema teng de, welatparêzê

nemir *Mîr Celadet*, wek xortekî milet-perwer bi rewşeye pir bi bawerî û xwîngermî hat pêş bi pîvana (ew gelê ku nikaribe bi zimanê xwe binivîse û bixwîne, bêqîmet e û bêkesayefî ye) û wî di gulana 1932'an de li Şamê kovara *Hawarê* derxist, rûpelên wê bi nivîsên zêrîn xemilandin, xem, keser, kovan, derd, êş, arîse û kêşen gelê kurd bi awayekî bihagiran tê de xuya kirine, xizmeteke hêja gihandiye ziman, tor û folklora kurdî. Herweha dema ku wî alfâba kurdî bi tîpêñ latînî weşandiye, wî di rînivîsa kurdî de şoreşeye mezin kiriye. Wî behsêñ dîrokî, edebî, zimanvanî, folklorî û gelek babetên din belav kirine.

Şarezayî û pisporiya *Mîrî*, di zimanê biyanî de, wek zimanê almanî, rûsi, fransizî, yunanî, tirkî, erebî, farisi û paşê ji îngîlizî, xezîneyeke dewlmend e ji zanyariyan bo *Mîrî* berdest kirine û bûye fêrisê meydana nivîsînê siyasi û civakî di wê demê de.

Wî heta meha tebaxa sala 1943'an kovara *Hawar* domandkiye, paşê kovara *Ronâkî* cihê wê girtiye. Van kovaran di pêşveçûna bir û baweriya neteweyî de û bi giştî hişyarbûna gelê kurd de roleke bêhempa leyistine; nexasim di warê ziman, dîrok û rewşenbûriya giştî de... Alfabeya latînî ku *Celadet Beg* bingehê wê avêtiye, iro ji kurdêñ Sûriyê bigire, heta kurdêñ Iraqê, Iranê, Tirkîyê û Ermenîstanê bûye bingeh.

Siwarçakê nemir, çawan meha nîsana 1893'an li Stembolê hatiye dînyayê, herweha roja 15'ê tûrmeha sala 1951'ê ketiye bîra gundê Hîcane, nêzîkî Şamê û rubê pak ji giyanê wî derçûye û li goristana Xalid Neqsebendî de li Şamê hatiye veşartin.

Hejmareke çak ji kitêb û belavokan li dû xwe hiştiye, kitêbxana kurdî pê dewlemend kiriye.

# Rola Celadet Bedirxan

---

M. MALKİSANLI

"En ku du roj (e) dest bi ziman kirine xwe feylesûf dihesibînin. Karê nezana holê ye. Ziman wek asoyê behrê ye, nêzîk xuyanî dike lê tu çîqas diherî tim ew e..."

Osman Sebî

**H**erçiqas ji pirsa te re bersiveke dirêjtir divê jî li ser daxwaza te ya nivîskî ez dê hewl bidim ku gotinêن xwe bi rûpelekê bi sînor bikim.

Ji ber ku *Celadet Bedirxan* di warêن cihê-cibê de xebitiye û berhemên wî li ser babetên cihê ne, rola wî jî di hişyarbûna gelê Kurd de pirrali ye. Têzanîn ku wî demeke dirêj xebata siyasi kiriye, di nav tevgera rizgarîxwaz a milletê Kurd de ciyê xwe girtiye; gelek nivîs û kitêb nivîsandine, nivîskar e;

çend kovar derxistîne, rojnamevan e; elîfba Kurdi ya li ser hîmêن elîfba Latînî daniye; li ser gramer û ferhenga Kurmancî xebitîye, zimannas e; gelek tişt ji zimanêن din wergerandine Kurmancî, wergêr e. Ev xususiyetên wî - heke em xebatêن wî yên din nehesibînin jî - nîşan didin ku ew di nav kultura siyasi û nivîskî ya Kurdi de xwedî ciyekî girîng e. Bi van xebatêن xwe wî tesîr li tevgera Kurdi kiriye û şopek li pey xwe hiştiye ku nayê înkarkirin.

Bêguman ew ne Xweda ye. Kêmasî û şâşiyêن wî jî hene. Em bêjin iro di hin pirsên siyasi de ez bi xwe wek wî nafikîrim lê tevî viya jî rola wî ya musbet eşkere ye. Ez dixwazim li ser pirsekê bisekinim: Gava gotin tê ser roşinbîr, nivîskar, şair û bi taybetî lîderên polîtîk ên Kurd, hin Kurd tenê pesnê wan didin, bi çavê rexnegirî lê nanêrin. Pesnêن wisa, tim telqîna melayan û zikra mirîdan tîmin bîra min. Na, divê em bêpozbilindî qedrê wan - ên ku layiq inbizanîn lê divê em bi "telqîn" û "zikra mirîdîn politîk" nesekinin; eger hebin-ku kesek bêkêmasî û şâşî tune- divê ku em kêmasî û şâşiyêن wan jî bibînin, bibêjin û binivîsin. Yan na em dê çawa pêşkevin? Lê gotin û nivîsîna kêmasî û şâşiyêن kesen wisa, divê nebe sebebê înkarkirina kar û xebata wan a hêja. Bêguman bona ku em derheqê kesen wisa de bigihîjin qenaeteke rast, divê em dem û şertên jiyana wan a şexsî û civakî jî ji bîr nekin.

Gelek caran behsa rola *Celadet Bedirxan* a di warê elîfba Kurdi û gramera Kurmancî de tê kirin. Bi a min tevî vana di hin pirsên din de jî rola wî girîng e.

Ez dixwazim bala xwendevanan bikşinim ser hinek ji vana:

- Xebata wî ya di warê Kurmanciya niviskî de, bi taybetî di warê pexşana (nesra) Kurmancî de

- Di warê kultura niviskî ya Kurdi de
- Di warê ferhenga Kurdi de
- Di warê folklorâ Kurdi de
- Di warê tarîx û belgeyên Kurdi de

Kurmanciya niviskî bi taybetî pexşana Kurmancî bi wî çend gavêng girîng avêtin.

Kultura devkî ya Kurdi xurt e lê kultura niviskî qels e. *Celadet Bedirxan* yek ji pêşengêñ kultura me ya niviskî ye.

Ferhenga wî baş naye naskirin. Min bi xwe li ba hevalekî beşek ji musweddeya vê ferhengê dîtibû; ferbengek gelek hêja ye. Ez hêvî dikim ku di demek kin de ev ferheng bête çapkiran.

Wî di warê tarîxa Kurdi û weşandina hin belgeyan de jî ji me re mîrasek hiştiye lê bi a min wî dîkarîbû di vî warî de gelek tişîn baştırikira. Ez vê yekê wek kêmasiyeke wî dibinim. Ji ber ku

ew bi xwe di nav de bû, di warê tevgera welatperwera Kurdî ya organîzekirî de (wek nimûne *Kurdistan Teali Cemiyeti*, *Kürt Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti*, *Xoybûn*) dîkarîbû gelek tiştan binivîse û biweşîne. Heyf e ku di vî warî de zêde tişt neweşandiye.

Tevî her tişî, bi xizmeta xwe ew hêjayî pesnê ye. Berhemên wî yên ku iro li welatêñ cihê-cihê ji nû ve têñ çapkiran him hêjayiya xebata wî him jî rola wî ya musbet nişan didin.

Herçî kovarêñ wî ne, ev beşek girîng in ji xebata wî. Xuya ye ku bi taybetî di zaravê Kurmancî de tesîra van kovaran gelek musbet e. Çi heyf ku heta iro ji alî ziman ve ji wan baştırikira me tunin. Ev rastî alîkî de xurşîya wî, alîkî de jî qelsiya nivîskarêñ me yên iro nişan dide. Bêguman derxistina *Hawar û Ronahiyêñ* nû yan jî derxistina kovar û rojnameyêñ ji wan baştırikira ne tiştekî hêsan e lê ne bêimkan e jî.

Bi hêviya ku di warê zimêñ de *Celadetî* me zêdetir bibin.

# Piyonerekî Zimanê Kurdî Celadet Bedir-Xan



ROHAT

**D**i her civatekê de mirov rabûne demekê pêşengiya karekî wisan kirine ku heta wê demê tu kesekî mayin nêzîkî wî karî nebûye. Ji van kesên bijarte, kêmhejmar û zana re, di zimanê lafinî de piyoner tê gotin. Herçiqas peyva pêşeng cihê wê gotinê tijî neke jî, ew tê wê maneyê. Dîsa di her civatekê de mirovek radibe, derdikeve holê, cara pêşîn gavekê davêje, riyekê vedike, fireh dike û dem tê piraniya civatê di wê riyê de dimeşin. Di

civata kurdî de çawa em dibînin ji van piyoneran yek jî *Celadet Bedir-Xan* e. Îsal pê re sed sal di ser bûyina wî re derbas dibe. *Celadet Bedir-Xan* piyonerê ci ye? Cara pêşî vî mirovî bingehêñ zimanê kurdî lêkolandiye, vejandiye, jîndar kiriye, bi tîpêñ lafinî hîmê vî zimanî daniye, di vî warî de rîyeke nuh vekiriye. Ev çalakî, hewldan û keftelefta bi serê xwe bûyereke dîrokî ye. Vê bûyera mezin di pâşketina çandî, hunerî û edebî de roleke bêhempa listiye. Ev hewldayina çandî tenê di nav sînorêñ teng yên akademîk de jî nemaye, di sala 1932'an de bi derketian kovara *Hawar* ve bûye qewimandineke populer, di nav gel de belav bûye. Ji ber vê yekê jî, mirov nikare *Hawarê* tenê wek kovarekê, an jî tenê wek weşanekê bîhesibîne. Divê mirov vê weşanê wek organ, proje û tevgereke xwenasîn, hişyarbûn û vejinê bîhesibîne. Ev cara pêşîn bû wekî mirovek bi awayekî sistematîk girîngiya zimanê kurdî ji nuh ve kifş dikir. Wî jêderxist ku bê ziman civatek nikare xwe bigihîne tu cihekî. Daxwaz, hêvî û xewnerojêñ civatekê tenê bi alikariya zimêñ ve têñ pêşkêş kirin, wî ev rastiya zû fam kir. Ew baş têgîhîştibû wekî "Ziman kîlîta dilan e". Wî kîlîta di destê xwe de baş bi kar anî.

# Ronakbîrekî Bêhempa Celadet Bedir-Xan



---

Mehmed UZUN

---

**H**erweki tê zanîn, tevgera ronakbîrî ya kurdî, ji ber rewşa welêt, ne ewçend xurt e û tu cafir jî xurt nebûye. Di hemû tarîxa kurdî de, bi tenê hin heyam bi vê tevgera pir pêwist hatine nasîn û bi tenê hin kes û şexsiyet bi van karan rabûne. *Celadet Ali Bedir-Xan* yek ji van nav û şexsiyetan e. Ew yek ji stêrkên kêm ên esmanên tarî û neçar ên welatê Kurdistanê ye.

*Celadet Ali Bedir-Xan* kurdeki ne kurdistanî ye. Ew li welatên xerîb hatiye

dinê, jiçayê, xebitiye û wefat kiriye. Eger meriv hemû jiyanâ wî ya li welêt bide ser hev, ew ji çend salan ne bêtir e. Heye ku ji ber vê yeka balkêş be, wî derd û kulên kurdan ji herkesî bêtir dizanibû. Wî ji tecrubêv bav û kalên xwe ji dizanibû ku sebebên mezintirfin ên zehmetî, astengî, paştetemayin û bindesiya kurdan, ne dijmin, lê nezanî, cehalet, girtibûn û berberiyênd hundurîn ên kurdan in. Ew ji tecrubêv xwe yên salêñ 1920 û 30-an fêr bû ku kurd, ji ber nezaniya kor, cehaleta kûr û besûdiya bêpayan, nikarin bi hev re bixebitin, nikarin yekitiyan bînin pê û nikarin bigîbin armancêñ xwe.

Ez bawer im, ji ber van sebeban, wî xwe da ser riya îlim û îrfanê, xwendin û nivisînê, afîrin û avakirinê. Wî da pey şopa şexsiyetêñ mezin ên tevgera ronakbîrî ya kurdî û bû hevrê û hevalbendê *Melayê Cizîrî*, *Ehmedê Xanî*, *Nalî*, *Haci Qadirê Koyî* û h.w.d... Hezar rehmet li wî, dê û bavê wî, kal û bapîrêñ wî ku wî bi sebr, metanet û xîreteke bêhempa perda reş a cehaletê çîrand, kovarêñ *HAWAR*, *RONAHÎ* weşandin, kitabêñ "Kitabxana HAWAR'ê" çap kirin û qayidêñ esasî yên gramera kurdî anîn pê. Eger iro kurd hê jî dikarin bi zaravayê kurmancî bixwînin û binivisînin, di vê yekê de para *Celadet Ali Bedir-Xan* pir û pir e. Di hejmareke *HAWAR'ê* de, bi navê "Zimanekî û merivekî" nivîsareke wî heye ku ew tê de behsa vejîna zimanê hebreyî û rêberê vê xebata hêja dike. Kurdêñ iro jî divê niha, mîna *Celadet Ali Bedir-Xan*, lê îcar li ser wî, nivîsarêñ weha binivîsin û behsa vejîna kurdîya bakur û rêberê vê xebata giranbiha *Cela-*

*Celadet Ali Bedir-Xan* bikin.

Ew dema ku *Celadet Ali Bedir-Xan* kovar û kitabêñ xwe weşandin, demeke pir xirab bû; tevgerên kurdî şikestin xedar xwaribûn, kurd ji hev ketibûn, welatê wan hem perçê bûbû hem jî bûbû kavil, piraniya ronakbirêñ wan hatibûn kuştin, yên mayî jî, peregende, bi derine reviyabûn û hemû li dijî hev bûn, îmkan, alfigir, xwende û terbiya xwendina kurdî nîn bû. Di nav rewşike weha zîz û kambax de, wî dest bi xebata xwe kir. Û gava wî dest bi xebatê kir, bi tenê çend kes li dora wî bûn; birayê wî *Kamiran Ali Bedir-Xan*, dotmama wî *Rewşen Bedir-Xan*, Dr. *Nafiz* û birayê wî *Nurettin Zaza*, *Osman Sebri*, *Cigerxwin*, *Hesenê Hisyar* û heye ku çend kesên din... Hingê, gava wî ev xebat kirin, bêyî der û dora wî ya pir nêzîk, kesî hêjahî û qîmeta xebatêñ wî fahm nekirin. Lê xebat û eserêñ hêja û pêwist mîna *lûlû* û *yaqlid* in. Wext wan dikemiline, dîneqîşne û derdixe meydanê... Û gava ew derdi Kevin meydanê, herwekî eserêñ *Celadet Ali Bedir-Xan*, ew bi şewq û tîrêjên xwe hawîdor ronî dikin.

Hezar rehmet li wî ku wî qonaxeke weha girîng a ronakbiriyê anî pê û bi eserêñ xwe ronahî reşand ser welatê neçar, nezan, bêkes û belengaz ê Kurdistanê.

## Ez Xwîna Xwe Nadim Te

### Fethula HUSEYNÎ

Keçê,  
dilê min û biçûk  
ne pênuş e  
ta ku rewş û pesnê xwe  
jê dimêji...  
Nesrinan li xwe dicivînî  
Kulê xwe  
pê dikuji...  
Keçê,  
Reş xunavê xwîna min  
buha qelen e...  
Ji mêt ve xelat û  
diyar e...  
Ji şîndara te re avdan e  
de xwe oflaz neke  
Eger tu gul i  
Dil bilbil i  
evîn yek e...  
Lê... eger tu çiya yi  
her bilindê qoq û ban im  
Û... eger tu Meryem i  
her ez tîrêjê Yezdan im  
da min ne-so-jî  
ne-mê-jî.

# ŞEMITÎNA STÊRKAN

**Rojen BARNAS**

Ku şemitiña stêrkek  
Nimaya mirina yekî mezin be;  
Herşev ji esmanê me  
Stêrk dişemitin bê hejmar.

Ne bêsedem ne beraday e,  
Ku hêvîdar in ji siberojan:  
Me welitek wer zayok heye  
Ranaweste li ber rihstûn tu car

Neşemitin stêrk! bêsedem,  
Nexurucin bê şop û bê ronahî  
Xuricîna we, divê azahî  
Tov ke li dû xwe, bi kerem.

## XEWNA DIYA ŞEHÎDEKİ

Du par ji şevê çûbû, ev şev  
Benderih di xewnên kûr de.  
Masî nedilivîn di golê  
Şirîfna çiravan westandî  
Û gul û giya  
Kerr û lal.

Dayikek hilpetikî ji xewnê  
Deng lê çikandî,  
Qîrîn di gewriyê de fetisandî ma.  
Eşheda xwe anî bi çav û birû.  
Li ser "pêxemberê axirê dewrê"  
Fatîhayek, sê "Qulhû Wellah"  
Kire gazî:  
Da rêwingiyê wê vê carê jî  
Bi xweşî  
bi ser de  
bê.

Kiz-zîn ji kezebê çû,  
Lûvand di ber xwe de:  
- "Rêwingiyê min li rê ye, vê şevê  
Nizanim gelo  
Dê bigihîje menzîl û meqsedê?"

Du par ji şevê çûbû, ew şev  
Dayikek hilpetikî ji xewnê  
Dayikek xewnek dîtibû  
Çi xewn bû ew, belê?...

## XEWNA JINA ŞEHÎDEKİ

Jinikek,  
Wek hejyana çiyayekî  
Hejiya di nivînê,  
Ji ber wê xewna dîtî.  
Rabû ser xwe, ku li çokên xwe xe  
Fedî kir ji xezûr û xesiyê.  
Jinikek, ku diya çend ber zarûkan  
Got, di ber xwe de:  
- "Hey la li min dêranê! ma jinebî mam?  
"Bûm diya sêwîyan, wey Xwedê neke.  
- Hey la li min sêwiyê!"  
Û li xwe fekirî  
Kerr lûvand û kelegirî  
Got:  
- "Hey gesahiya di çavên min de  
Ma nema hun bibirisin ji niha pê va?  
Ma hunê ji kê re biçirisin,  
Bişirînên min ên di dev û lêva?  
Bibikên min ên ku dîtine  
Tenya bihara bîst, bîst û yekê  
Û biskên min ên şînboz  
Ku di nav serê min de ji niha va  
Ji Nûhê di nav Cizîrê gelek pîrtir  
Gelekî derdkêşîr û westandî:  
Tîrsa min ew e,  
Ku dabin vemartin çîra hewe."

Weha got û kir, jinek ji jinêñ  
Ku rê dipan.  
Li riya çûnehatê bû  
Rêwingiyê wan.

## DILEKİ

Dilekî d'mazmazka pêş-Asyayê de  
Dilekî çarkerî, bi xwînê der e.  
Pîrhevok tevna xwe lê rapêçaye  
Dest kirye tînikê jê venagere.

Ew dil e, dilekî mîna dilan e  
Li rexkî Elişêr, li rexkî Rêber  
Alîkî Beko ye, strî di gulê  
Alîkî Memo ye; dilsoj, bêxeber.

Milkekî d'navoka pêş-Asyayê de  
Mîna xewnenê şevan pendî-nependî  
Li riya azadî bêdeng û bêhis  
Elişêr têñ kuştin, lê b'serbilindî.

## DÎSA

Stêrkek şemîtî dîsa  
Stêrkek şemîtî heywax  
Mîrin çavêñ te birijin  
Mala te bimîne kambax.

Rojen BARNAS

# SÊ RENGÊN KESKESORÊ

---

Mehmed UZUN

**S**ë hunermendêñ kurd ên ciwan, du xort û keçek; **Tekîn Firat, Mehmet Kolçak û Gulcan Zirek**. Rojeke havînê ya Stembolê ye. Xeberên wê rojê dîsan nexweş in. Dîsan gelek kuştî hene, dîsan diplomat û siyasetvanekî tirk ê nijadperest henek û qîrfêñ xwe bi zimanê kurdî kiriye, dîsan li ser hebûn û nebûna kurdan tiştên ne ciddî hatine nivisîn. Dinya germ e, li ser rûyêñ merivên ku derin û têñ esebiyeteke vekirî dixuye. Li ser Îstîklal Caddesiyyê, li qahwexana *Kaktusê* ku çend hevalên min ên tirk nû vekirine, ez li hêviya wan, hunermendêñ me yên ciwan im. Min Mehmet û Gulcan berê jî dîtine, ez ê Tekîn niha, cara yekemîn, bibîmîn.

Ew têñ, kenek li ser rûyê wan, germ, dilsoz, ji esebiyeta hawirdor dûr. Wî danê êvarê em ê bi hev re bin, bipeyîvin, sohbet bikin, li ser hal û hewalê kambax ê hunermendêñ kurd li hev guhdarî bikin. Ya rastîrîn, ew ê bipeyîvin, ez ê li wan guhdarî bikim. Ez bi dîtina wan kêfxweş dibim, germahî û gemariya wê rojê ji bîr dikim. Wan albumek bi sûretên tabloyêñ xwe, ji bo min, amade kirine û bi xwe re çend nimûne jî anîne. Teví van, wan tabloyeke Tekîn ku li ser hewreşimê çêbûye, bi hev re anîne û yadigarî min dîkin. Navê tablo "Helebçe" ye. Bi tenê ev nav hem li ser tabloyê hem jî li ser hunermendiya resaman gelek tişû dibêje.

Em bi hev re li sûretên tabloyan û li nimûnan dînihêrin. Pêşî çend sûret ji pêşangeheke wan hene. Par wan pêşangeheke biserkeû, bi navê "Direneler" li Stembolê, li *Wegfa Maf û Azadiyên Kurd*, li dar xistine. Li ser pêşangehê gelek hatiye nivisîn. Lê cîhê mixabînê ye ku "wê zêde bala kurdan nekişandiye." Pişti wan wêneyan, sûretên tabloyêñ Gulcanê hene. Paşê jî yên Mehmet û Tekîn.

Ez bi meraq gelek tişû, li pey hev, ji wan dipirsim. Çima? Çawan? Gelo? Ma? Ew li Stembolê, di navenda tevgera çandî, hunerî û edebî ya Tirkîyê de, mîna hunermendêñ kurd dixebeitin, dilebeitin. Bê şik e ku zehmetî û dijwariyêñ li ber wan gelek in. Bê şik e ku rê û îmkanêñ li ber wan pir kêm in. Bê şik e ku kurd zêde piştgirtiyê li wan nakin. Lê teví van hemû tiştan ew bi navê hunermendiya kurdî derdikevin holê û dixwazin hûnereke kurdî biafîrînîn. Çawan, bi ci awa û şewyan? Hunera kurdî, tabloyêñ kurdî,



*Hunermendêن Kurd Mehmet Kolçak, Tekin Firat û Gulcan Zîrek*

motivên kurdi çawan diafîrin û têr pê? Wext li ber me pir e, em ê hêdi hêdi li ser van meseleyên xwe bipeyivin. Lê berî he tişî ez dixwazim bizanibim ka ew çawan ketine ser vê riyê...

Gulcan, ya herî ciwan e. Ew ji Erzîncanê, Çayırliyê ye. Hê di zaroktiya wê de, mala wan koçî Stembolê dike. Ew li Stembolê mezin dibe û dest bi xwendinê dike. Ew li Unîwersîta Marmarayê, beşê hunerê dixwîne. Wê besdarî li hin pêşangehan kiriye û sala 1988-an xelateke hunerî, bi tabloyeke xwe ji Serpocamê wergirtiye. Digel resamîyê, Gulcan bi musûkê jî mijûl e, ew, tevî *Koma Serora Natê*, li ser müsika kurdi jî dixebite.

Mehmet ji Xarpêtê, Qereqoçanê ye. Hema ci bigire, mîna Gulcanê, ew jî li Stembolê mezin dibe û li wir dixwîne. Ew jî li Unîwersîta Marmarayê, beşê hunerê dixwîne û niha jî li wir mastira xwe çêdike. Wî jî besdarî li gelek pêşangehan kiriye.


Herçî Tekin e ji Mûşê, Wartoyê ye. Wî li Unîwersîta Mîmar Sînan, beşê hunerê xwendîye. Digel çend pêşangehêni li Turkiyê, wî besdarî li hin pêşangehêni li Alemanya û Yewnanistanê jî kiriye.

Hersê jî ji nifşen nû yên kurd ên xwenda ne. Hersiyan jî ilmê huner û hunermendiyê xwendine û bala wan hem li ser humera kurd û tirkan hem jî ya navneteweyî ye. Hersê jî bi kurdi (kurmancî û zazayî) dikarin bipeyivin, lê nikarin xwe baş pê ifade bikin. Mîna piraniya ciwan û xortêñ kurdan ên Turkiyê, ew jî pirtirîn bi tirkî dipeyivin û bi

tirkî xwe ûfâde dikin. Nemaze gava ew li ser huner, edebiyat, siyaset û felsefê dipeyi-vin. Ew bi kurdi dijîn, hîs dikin, dixebeitin, diafirînin, lê belê bi tirkî difikirin û pîrî caran jî dipeyivin. Ma ev yeka hanê ku meriv li her derê Turkiyê, di nav kurdan de, dibîne, ji bo hunermend û ronakbirekî kurd ne navkokî û berberiyeke xedar e?

"Bêguman" bersê bi hev re dibêjin, "bêguman ku welê ye. Lê realita me jî weha ye. Nûrê zimanê tirkî li ser me pir û pir mezin û giran e. Em ketine ber diranê çerxeke xedar a asîmilasyonê..."

Li nik hersîyan jî ez bîsiyeteke xurt a kurdi û daxwazeke xurt a afîfîna hunera kurdî dibînim. Lê di eynî wextê de, ez kêmânî û valahiya wan a zanîna tarîxi, edebî û çandî



*Gulcan Zirek li ber tabloya xwe "Bilindbûn"*

ya kurdi jî dibînim. Huner, her celeb huner her têşeyên hunerî li ser kok û rehêن tarîxi, edebî û çandî hêşin têن û diafirin. Û ziman bingeh e, ruh e. Bêyî ziman ne şîurekî têkûz ne jî zanîneke kûr dikare were pê. Em li ser van yekan dipeyivin. Ew jî baş bi vê yekê dizanin, haya wan jî kêmânî û qelsiyên wan heye. Loma jî ew gelek tişti bi hev re dikin da ku xwe bi kûrahi û dewlemendiya ziman, tarîx, çand û edebiyata kurdi bigibînin. Ew li ser yekitî û yekbûna xwe dipeyivin, gelek ehimiyetê didinê. Wan bi hev re, bi navê Yekitiya Resamên Komelê, yekitiyek anîne pê. Ew hem xweser in hem jî yekitî ne, hem berhemên xwe yên şexsî diafirînin hem jî li ser projeyên hevkar dixebeitin. Ev yekitî di warê huwîyet û şexsiyeta kurdi de jî alfîkariya wan dike. Ew kêmâniyên hevûdu dibînin û hevûdu temam dikin. Tiştekî din ku ew bi



Tekîn Firat "Dêrsim"

hevkariyê dikin, xwendin û salixdan, nirxandin û lêhûrbûna kitabên kurdi yan jî yên li ser kurdan e. Ew pir dixwînin, bi hev re pir li ser eserên ku xwendine dipeyivin û pêwendîya huner û hunermendiya xwe û eseran datnin. Wan bi hev re studyoyeke resamîyê vekirine û piraniya caran li wir dixebeitin, fîkrîn xwe jî hev re dibêjin, berhemêن xwe yên destpêkinî yan jî nîvçê nişanî hev didin û pêşniyarêن hevîdu werdigirin.

Ew weha li ser biryar, armanc û xebatêن xwe dipeyivin. Di navbera sohbêtê de, ew behsa biryareke xwe ya din jî dikin û di ser re derbas dibin. Biryar bala min dikişne;

biryar dane ku herin Kurdistanê û demekê li wir, di nav xelkê de bijîn. "Ji bo hînbûna adet û ûsil, ziman, edebiyat (nemaze ya devkî), rabûn û rûniştina gelê kurd, çûyina me pêwist e", ew dibêjin. "Heye ku bi vî awayî em bikaribin birfînên şexsiyet û huwiyyeta me ya perçekirî û perçiqî, hinekî, derman bikin." Tekîn karê xwe bi rê xistiye û ji niha ve çûye, li gundekî Sêrtê bi cîh bûye. Ew li wir hem mîna mamosta dixebite hem jî ruh, can, deng, pejn, reng, tâhm û bînnêن cuda yên xelkê xwe hîn dibe û bi wan re, di nav wan de dijî

Yekitiya wan KOMELÊ dest bi weşandina kovareke hunerî jî kiriye. Par hejmareke kovarê derketiye. Gava pêwist be, ew kovara xwe diweşînin. Navê kovarê jî "KOMEL Sanat Dergisi" ye. Belê, ew bi tirkî ye. Armanca wan bi kovarê, nişandana huner û hunermendiya kurdi, gels û problemên li ber wan e. Ew dizanin ku kurd mîna gel û netewe ji huner û hunermendiya modern dûr in. Mefhûmêن resam-resamî, nivîskar-nivîskarî, ronak-ronakbîrî û hwd. ne ji mefhûmêن esasî yên civata kurdî ne. Û tevî van rastiyêن tahl, ew li welatekî mîna Turkiyê dijîn ku li wir çerxa her tişî her wext, her saet, her saniye li dijî kurd û kurdîtiyê dizivire. Di welatekî weha de hunermend bûyin û di ser de hunermendê kurd bûyin pir dijwar e. Loma jî ew pir girîng dibînin ku ev mefhûmêن bingehîn ên avakirin û afîrînê derkevin holê, bêñ munaqaşekirin, bi awayekî medenî li serê bêñ peyivîn. Di hejmara yekemîn de, bi navê "Kürt Resim Sanatı Var mıdır?" bendek heye. Di wê bendê de, ew li ser pirs û pîrsiyarêن ku serê gelek kurdî mijûl dikin, ji xwe radiwestin û hewl didin ku bersîvan jî bibînin. "Meriv nikare behsa hunereke vekirî ya



Tabloya T. Firat "Gema"



Tabloya Mehmet Kolçak "Berxwedan I"

kurdî bike", ew dibêjin, "lê gelê kurd di jiyana xwe ya civakî, di motîvên xwe yên xalîçe û mehfûran, di dawet û dîlanên xwe de huner û hunermendiya xwe nîşan daye, hunera me ya resim û wêneyê jî ev e û li gora vê ye"

Wan bi kurdî jî belavokek weşandine û tê de behsa huner û hunermendiya xwe dikin. Di derekê de, ew weha dibêjin; "Em alî ne. Em ronakbirênetewa bindest ku nasnama wan hatiye înkarkirin, navêwan hatine guhertin û hebûnên wan ên kultûri hatine talankirin xwe wekî aliyekî dibînin... Em di wê baweriye de ne ku huner di guherîna civakî de xwedî rolekî girîng e..."

Bêyi ku riknên estetîk ji çav werin derxistin. em ê li prensibên hunerî xwedî derkevin... Em ê li efsane, dîrok, adet, kevneşop û hebûnên kultûri yên gelê xwe xwedî derkevin, wan biparêzin da ku di kultura navnetewî de ciyê xwe bigirin.." Meriv dikare bibêje ku ev belavok, deklerasyona hebûn û xebata wan e.

Bi dû qayideyên weha esasî, lê giştî yên huner û hunermendiyê, em dîsan vedigerin ser xebat û tabloyen wan. Pêşangeha wan a "Direnmeler" xebateke wan a hevkar e. "Me xwest ku em liberwedana gelê kurd bi rengên keskesorê nîşan bidin." Keskesor, çima keskesor û rengên wê?


Herkes dizane ku kurd ji rengên germ û balkêş hez dikin. Cil û bergên keçen kurd ên eşiran, neqsên çadir û konên zozanan, motîvên mehfûr û xalîçen kurdan her bi van rengan hatine rêtîn û hûnandin. Sor, zer, gewher, kesk, şîn... ev rengên keskesorê, rengên jiyana kurdî ne jî. William Eagleton di kitaba xwe ya pir hêja "An Introduction to Kurdish Rugs and other weavings" de, behsa van rengan û giringiya wan a sembolik dike. Ew dibêje ku mehfûr û xalîçeyên kurdî sûret û wêneyê civata kurdî ne, rengên wan ên germ û hînekî tarî nîşana jiyana wan e. Jiyana koçerî û eşriyê, edet û ûsilîn gunditîyê, berberî û dijminahiyê navbera eşiran, şerîn li dijî dewletan, liberxwedana sedsalan... ev hemû mîna reng û neqîş, mîna hûnîn û motîv di mehfûr û xalîçeyên



*Tabloya M. Kolçak "Berxwedan II"*

kurdî de dixuyin. Ez ji wan re behsa kitaba William Eagleton û gotinêñ wî dikim. Haya wan ji kitabê nîn e, lê tiştê balkêş, ez ferq dikim ku wan jî serê xwe gelekî bi van babtan êşandiye û di hunera xwe de van babet û fikran diceribûnîn. Bi taybetû jî di tabloyêñ Tekîn ên dema dawîn de, ev fîkr û tema baş dixuyin. Tekîn giranî daye ser reng û motîvên mehfûr û xalîçeyêñ kurdî. Di van demêñ dawîn de, wî bi navê "Dêrsim" du tablo çêkirine. Di van de hem mehfûrêñ kurdî bi xwe û hem jî reng û motîvên wan baş diyar in. Herweha di tabloyêñ wî yên "Newroz, Jin, Gema" de jî. Ew, tevî hevalêñ xwe, li pey reng û motîvên neteweyî ye, da ku bikaribe huner û resima kurdî bîne pê.

Gava em li ser ahenga reng û motîvên neteweyî dipeyivin, bivê-nevê, sohbeta me tê



### *Tekîn Firat "Newroz"*

ser Kubîzmê û kubîstan, nemaze ser Picasso û Braque, rêberên tevgera kubîzmê. Herwekî ku nas e, kubîzm navneteweyî ye, lê ew li ser motîvên neteweyî hatiye pê. Di avakirina tevgera hunerî ya kubizmê de, tesîra motîvên Rojhelata Navîn gelek e. Bi gotina W. Eagleton, gava meriv behsa hunera rojhelatê bike, divê meriv cîh û rola esasî ya huner û motîvên kurdi ji bûr neke. Loma meriv bi rehesî dikare bibêje ku di reh û rêçen kubîzmê de tesîra motîvên klasîk ên kurdi heye. Di tabloyêن Tekîn de jî tesîra kubîzm û rêberên wê dixuyin. Ma huner û hunermendî, her celeb asîrîn ne tesîr û pêwendî ye? Ma hunermend û avaker, nivîskar û lêger ne endamên malbateke fireh in?..

"Picasso û Braque, ji bo min û hunera min, rêberên girfing in", Tekîn dibêje. Gulcan jî dibêje Poul Cleé û Mehmet jî navê hersiyan dubare dike. Jixwe di tabloyêن Gulcan û Mehmet de jî tesîra van hosteyan dixuye. Gava em li tabloya Gulcanê "bilindbûn" û ya Mehmet "berxwedan" dînihêrin, gotin dîsan tê ser pêwendîya "neteweyî-navneteweyî, xweserî-hevkarı."

Lê belê tişte ku min pir kîfxweş dike, ev e; ew hersê bi hev re dixebeitin, lê uslib, şêwe û riyî wan ji hevîdu cihê ne. Ew tesîrê li hev dikin, lê her yekî riyeke taybetî û xweser daye ber xwe. Di huner, asîrîn û avakirîne de cihêti û xweserîti ji bo wan girfing e. Ew dizinan ku keskesor ji rengên yekgirtî hatiye pê, lê her rengekî jî bi serê xwe xwediyyê cîhekî taybetî ye. Ew bi hev re, bi rengên keskesorê, hewl didin ku hunera kurdi li Turkiyê geş be, lê di eynî wextê de ew hewl didin ku bibin sê rengên cihê yên keskesorê.

\*\*\*\*

Roja kambax a Stembolê êdî hêdî hêdî diqulipe ser êvarê. Esebiyet ji me bi dûr ketiye, germahî û gemariya Stembolê winda bûye. Ez li rê me. Ez wan yek bi yek hembêz dikim, serfirazî û serketina wan dixwazim. Û gava em ji hev xatir dixwazin û vediqetin, ew bi ken dibêjin, "keskesor..." Ez jî gotina wan temam dikim; "û rengên wê yên taybetî..."

# AWAZÊN XERÎBIYÊ



Bedirxan EPÖZDEMİR

Di berbangeke sibê de  
Li min xistin bira.  
Bê pênas  
Bê pirs  
Û  
Pirsyar.  
Bê kes  
Bê xwedî  
Û  
Diyar.

Heyran man;  
Li inyada  
Û  
Bêdengiya dîrok û mirovatiyê  
Li hemberî min.  
Û  
Li min xistin bê perwa  
Dîrok sekinî  
Xeber neda  
Bêdengiyê bijart mirovatî,  
Carek din da diyarkirin dîrok  
Got; ez tekrar im  
Weha dizîvire çerxa min  
Heqî bûye neheqî  
Neheqî bûye heqî  
Li cem min.

Her wek;  
Li Mehabad û Koçgirî  
Li Silêmnî û Dêrsim  
Û li Geliyê Zîlan  
Îro jî bûye eynî meqam  
Li tembûra xwe dixim  
Li Helepçe û çiyayê Berzan.

Ez hatime lêxistin  
Bê daxwaz  
Û  
Xwestin,  
Bi xapandin  
Û  
Leyistin.  
  
Min neynine bîra xwe  
Bi gotinê klasîk  
Bila nerêjin stêrkên çavêن  
Bê ronahîk.

Ku ji we tê;  
Bêdengiyê mehkeme bikin,  
Ewêñ ku navêñ min bibîñin  
Û  
Nas bikin,  
Bêbextiya dîrokê  
Û  
Rûreşıya mirovatiyê  
Jê pirsyar bikin.

Jê pirsar bikin,  
Ku careke din  
Pesnê xwe nede dîrok  
Bi gotin û çîrok  
Belkî fedî bike mirovatî  
Bi rewşa xwe ya du alî  
Û bikêrnehâtî.

Ez hatim lêxistin  
Bê pênas, bê pirs  
Ne fedî mabû  
Ne jî tirs.  
Bêdengiya dîrokê,  
Bêşermiya mirovatiyê  
Wana xistibû mérxaş  
Û Durûtiya  
Nift û hesin  
Baş bizanin;  
Malê me  
Bûye bela li serê me.

Baş nas bikin wan  
Baş nas bikin  
Ewêñ ku;  
Min bê pênas û bê pirs  
Dane ber gulan.  
Bila kîna we

Hêviyên we tûj bike,  
Bila evînî bi kilamên serketinê  
Mezin bibe,  
Tiştên ku hatine hindakirin  
Çareke din tov bikin.

Mezin bikin şitlan  
Bila şax bidin  
Tiştên we nekiriye bikin,  
Yêñ necerbandin  
Biceribînin.  
Belkî zor e  
Lê bê şik bimeşin,  
Bila tov şîn bibin  
Ku nekûrifin şitil  
Û Stûxwar nebin kulîlk.

Ji bo ku em bikaribin  
Pêşî bigirin li têkçûnê,  
Binketinan bizîvirînîne  
Serketinan  
Û biçirînnin tariyan.

Ku zeng nedîn hêviyên me,  
Û em bikaribin;  
Wana biparêzin ji bin bandora  
Napalman û gulan.  
Ji bo ku azadî şermezar nebe  
Û bi serbilindî em bikaribin  
Lê silav bikin;  
Himbêz bikin yekîtiyê  
Bi dil û can,  
Bimeşin...!

# DI MEM Û ZÎNA EHMEDÊ XANÎ DE ASTRONOMÎ

N. HÊCIBÎ

**M**in dil hebû ez sê şaxên destana *Memê Alan* ên di pirtûka *Zargotina Kurdan* de bi *Mem û Zîna Ehmedê Xanî* ve rûberî hev bikim, bela *Xanî* ji *Memê Alan* çi hilda ye, çi guherî ye, çi hiştiye.

Di bira "Gazin û lavayî ji Xwedê ra" de ez rastî tiştekî ecêb hatim; di destpêka rûpela 27'an de ev tê xwendinê:

*Ew neh sedefêfî pir mirarî  
Durrêd-i sefid, gesaf û tarî (1)*

*M. Emîn Bozarslan*, di rûpela bi tirkî de notek xistiye binî û wisa nivîsandiye: "Sedeflerden maksat, herhalde, güneşin çevresinde dönen dokuz gezegenin yörüngeleridir; İncilerden maksat da, gezegenler."

*Ehmedê Xanî*, di sala 1651'ê de hatiye dinê û di 1707'an de çûye dilovaniya xwe. Hîn ku *Xanî* li jiyanê bû, şes rojger (*Merkur, Venus, Erd, Mars, Jupiter û Saturn*) di-hatin naskirin. Yê mayîn *Uranus, Neptun û Pluto* nedibatin naskirin, ew pir dereng

di van tarixan de kifş bûn; Uranus di sala 1781'an de, *Neptun* di sala 1846'an de û *Pluto* ji di sala 1930,î de hate dîtin. Van hersê rojgerên paşin (*Neptun*, *Uranus*, *Pluto*) bi çavêن rût mirov nikare bibîne, teleskop şert e.

Bêguman di berbunga jiyana mirovan de, ezmên tim bala însanan kişandiye, gelek efsane, çirok, teorî li ser asirandina alêemê (kozmoz) hatibûn gotinê. Ji van teoriyan a herî balkêş a ku hîn gelek însan di bin tesîrê de ne teoriya *Batlamyas* (*Claudios Ptolemaus*) e. *Batlamyas* di sedsala 2, de (Pişti Isa) katîbê pirtûkxana Îskenderiyê bû. Camêr makîneke mezin çêkiribû. Li gorî vê makînê merkeza alemê erd bû. *Hîv*, *Roj*, *Merkur*, *Venus*, *Mars*, *Jupiter*, *Saturn* di dor erdê re wek dâireyan dizîvirin. Keşîş *Nikolaus Copernicus* (1473-1543) li dijî vê teoriyê hate der, roj kire merkez û got: "Erd û hemû rojgeran (planetan) di dora rojê re dizîvirin, çerx dibin. Dêra katolik pirtûka *Copernicus* qedexe kir. *Martin Luther* ji bo vî keşîşê camêr got; "Astrologeki zibîdiye". Pişt re keşîsekî din *Johanes Kepler* hat (1571-1630). *Kepler*, teoriya *Copernicus* bi sê zagonênistema Rojê (Sonnesystem) çawa wek saetekê dixebite îspat kir. Niha pirs ev e; *Ehmedê Xanî* bi maneya rojgeran nivîsi an di maneyeke din?

Ger di vir de ez bi xwe bêjim *M. Emin Bozarslan* sedî sed nabêje di maneya planetan de, dibêje "herhalde", bi şik e. Wê bi hêsanî her xwendevanê *Mem* û *Zinê* têbigihije ku *Xanî* li ezmên temaşe kiriye, kîjan siêr, kîjan birc di çi wextê de li kîjan hêla ezmên xuya dibe, rojger di kîjan demê de pişta xwe didin kîjan bircê baş nas dike. Binêrin, "Pîrozkirina Newroz û Sersalê"

*Xellaqê cîhan ji feyzê fitret  
Heyata felek bi wechê quđret*

*Bê qalib û bê mihit û miqyas  
Bê alet û bê misir û miqras*

*Ew çend miezzem û midewwer  
Ew rengê misenê' û mikerrer*

*Înanê bi me'raza wicûde  
Kêşane bi menzera şihûdê*

*Hikmet ew e ev hemî li karin  
Hindek di peya û hin siwar in*

*Hindek di betî' û hin serîn  
Hindek di müñ û hin menûn*

*Hin midbir in ew, hinek midebber  
Hin miqbil in ew, hinek miqedder.*

*Zagona Kepler yek ew e ku wexta ku rojger nêzîkî rojê dibin, bi lez dizîvirin, wexta ku bi dûr dikevin, giran dizîvirin. Merkur pir bi lez Pluto a herf dûr pir giran dizîvire. Em niha ji cardin bixwînin:*

*Hindek di betî û hin serîn  
Hindek di miîn û hin menîn*

*Ji Merkur û Venus bêtir hemû rojgeran mîna Erdê hîvên xwe hene. Yanî hîv di bin bandûra, bin emrê wan planetan de digerin. Binêrin di benda binî de ci gotiye;*

*Hin midbir in ew, hinek midebber  
Hin miqbil in ew, hinek miqedder.*

*Di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de tasvîr û şirovekirin ezmên di pir cihan de derbas dibe. Ez naxwazim serê we zêde bişînim, lê belê gotina min a paşîn ev nîne, tiştên ku ji vana hemûyan pirtir bala min kişandiye ev e. Pêşta em bixwînin, ji bira "Dîlana Stiyê û Tacdîn"*

*Weqtê wekû nûerûsê Xurşîd  
Neh qubbe, mîsalê camê Cemşîd*

*Fîlcimle kirin bi rax micella  
Goya ku kirin bi zêr mitella...*

Mana vê, roj (Xurşîd) şewqa xwe dide neh qubbe û wan ronahî dike, diçirûsına. Herkes iro dizane ku bê şewqa rojê rojger bi serê xwe nikarin bicirûsin an bibiriqin. Şewqa wan bi xwe tune ye. Viya tiştekî girîng e. Dîsa di cihekî din de ji bira "Dayê Gustîlêd Memê û Tacdîn dibîne" Di rûpela 140'î de ev fikra ha pir eßkere dixuye.

*Qaim dibilitin erez bi cewher  
Bê şemsê qemer dabit minewwer?*

Gelo ma ev yeka ne ecêb e! An jî min hemû xelet fêhm kir. Eger tenê di bira ku *M.Emîn Bozarslan* noteq di bin de daniye bûya min ewqas meraq nedikir. Lê belê di du cihan de neh (9) derbas dibe û tasvîr sedî sed a sîstema rojê ya iro ye.

Xanî li kîjan medresan xwendîye? Gelo xebera wî ji Kepler hebû? Neh planet ji ku hîn bû, yan jî ji ku derxist, çawa pê hesiya? An jî ma gelo wî di maneyeke din de nivîsi ye? . Heta ku yek dernekeve û min ji vê şikê an jî ji vê fikrê xelas neke, ez bi xwe bawer nakim ku wî di maneyeke din de nivîsi be.

Piştî van yekana min hejmara *NÜDEM'*ê a 2'an vekir, nivîsara *Zeynelabidîn Zinar*

a ku li ser *Mele Ehmedê Cizîrî* nîvîsibû xwend. Di helbestên *Cizîrî* yên ku di bin navê "Felsefa Melê" de. Di vir de min fêhm kir ku Xanî pir di bin tesîra *Mele Ehmedê Cizîrî* de maye. Mirov dikare bibêje çavkaniya *Ehmedê Xanî Mele Ehmedê Cizîrî* ye. Ilmê astronomî ji kaniya *Cizîrî* vexwariye. Yênu ku dixwazin dikarin rûberî hev bikin. Ez dixwazim di vir de çend nimûnan binivîsim, hela çawa alîm û hozanê kurd wek xelekêni zincirekê bi hev girêdayî xuya dibin. Dîsa xuya dibe ku *Cizîra Botan* di demeke dîrokê de Îskenderya Kurdistanê bû.

*Ew kamilê bê'eyb û neqs  
Çerxê bi her yek nem' û seks  
Wê yek bi yek anîne reqs  
Tê seb'eyê seyyareda*

*Her neh bi vê cehd û lezê  
Çerxîn li dora merkezê  
Behra du alem lê kezê  
Tê ev hebab sergeste da*

*Ew xêweta kewkebmîsal  
Geh bedr e têtin, geh hîlal  
Sê deh, duwazde mah û sal  
Çerxin di seyra tîs'eda.*

*Her neh felek lê kaxik in  
Dûr diraz wek axik in  
Tê dar in, ew ji saxik in  
Vê terhê însan meywe de*

*Dolan û çerxê neh felek  
Pêş destê kursî bû helek  
Sergeste hatin ew gelek  
D'wê nuqteya mewhûme da.*

Sed heyf, *Ehmedê Xanî* wekî çiyayê Agirî serê xwe bilind kiriye. Em hîn mîna şivanekî ku li dorê pezê xwe diçêrfine û hay jê nîne li ser vî çiyayî ci heye!

Xwezi çend camêr bi vî çiyayî ve hilkişin û binihêrin hela li jor ci heye.

# BEHRAM

---

Amadekirin: Zagrosê HACO

**B**ehram (Mars, Merix) yek ji her neh planêtên *Sistema Rojê* ye. *Behram* bi nêzîkbûna xwe ji *Rojê* pişti *Tîr* (Mêrkur, Ettarid), *Gelawêj* (Venus, Zehra) û *Zemînê* (Erdê) planêta çara tê. Ew ji 227,9 milyon kilometran ji *Rojê* dûr e. Sala *Behram*: dema ku carek di çerxa xwe re li hawîrdorî *Rojê* digere; dike salek û 322 rojên me û roja *Behram*: dema ku carekê li hawîrdorî aksê xwe digere; dike 24 saet û 36 deqîqe. *Behram* geleki ji zemînê piçûktir e, direjbûna nîvkadbira (ekuadura) wê 21362 KM e, ya Zemînê 40074 KM e. Du heyv jî li dora *Behram* digerin, navê yekê *Phobos*

(bixwîne fobos) e û ya din *Deimos* e.

*Behram* planêteke ji berê de ji mirovên ser ruyê Zeminê re nas e, ew jî ji ber rengê wê yê sor î geşî di ezmên de diyar e. Dibe ku ji vî rengê sor jî *Behram* li cem Yunanîyêñ kevn sîmbolê Xwedayê şer û cengê bû. Di sedsalên dawî de pişti *Galilei Galileo* sala (1564-1642) û çêkirina teleskopan gelek zane bi planêta *Behram* mijûl bûne. Wan guman dikir, ku bajarvaniyeke pir bilind lê heye, nemaze pişti ku çîrokên zanistîfantazî li ser hatine nivîsandin, êdî planêta *Behram* bûbû li ser her zimanî. Pir filmên sînemayıfantastîk li ser mirovên kesk ji planêta sor hatine çêkirin, yên ku dihatin ser-dana Zeminê, carna bi aşîf û carna jî bi şer ji bona kolekirina Zemîniyan.

Li gor zanînên dawî *Behram* hişke hola û bê av e. Bi axeke rengê zer yan bi sore ve rûgirtiye, ya ji asîdên besinî biheketiye. Dema li ser ruyê Behram ba rabe, axê bi xwe re radike û babilisokên tozî çêdike, yên bi teleskopê wek ewrên zer têñ dîtin. Sala 1956 li ser planêta ewrekî zer î pir mezin hate dîtin, hêdî hêdî aliyê polê başûr tev girt û piştre neh rojan ji ber çavan winda bû. Berî niha bûyerek halo tu caran nehatiye dîtin. Babilisokên tozî bêhtirê caran di destpêka havînê de peyda dîbin. Ji bêl van ewrên zer ve carna ewrên spî jî têne dîtin. Ew jî yan ji ewrên bilind in, yên ji krîstalên qesayê biheketîne û yan jî mija nizm e, nêzîkî ruyê planêtê di ser berfê re ne.

Helbet ne hemû ruyêñ Behram çola hişkehola ye. Li pir cihan nemaze nêzîkî nîvê başûr em dikarin cihêñ tarî bibînin, yên ku navê derya, cezîre, çeman û yên din li wan hatiye kirin. Li gor baweriya hin zaneyan ew cih hêwan e û geya û şînî lê heye. Di zivistanê de ew cihêñ tarî gewr dîbin, bêreng dîbin û pir ji wan di wê saldemê de nayêñ dîtin. Lê ku bihar tê, berfa serê herdu kumên polî dihele, ji ava wan çem diherikin û ji nişka ve ew deqêñ tarî dîsa bel dîbin û xuya dikin wek ku şîn dîbin. Di destpêka havînê de pir xweşik diyar dîbin. Piştre dîsa gewr dîbin, ta ku zivistan tê, careke din winda dîbin.

Keştiya gerdûnî, yên li ser danîne gelek informasyonên nû û hêja ji Zeminê re şiyandine. Lê pirsa mezin gelo tu formên jînê li ser *Behram* hene ? Hê ne bi erê û ne bi na bersiva xwe nedîtiye. Tişte xuya ew e ku tu formên jiyanê yê bilind li ser vê planêtê nînin. Dibe ku formeke jiyana prîmîtv di destpêkê de hebe, wek baktêriya û şînyîyêñ yekşanik. Lê eger bi tenê baktêriya jî hebin dîsa wê li pir pirsên filosofi û olî dîtineke din were nerîn. Gelo di gerdûnê de em bi tenê ne ? Gelo di nav milyonên planêt, stêr û galaksiyan de tu kehniyêñ jiyanê yê din nînin ? Tihna mirov naşikê ta ku bersivekê nasneke.

# Helbestvanê Hevçerx Yê Kurd

## Ebdurehman Mizûrî

### Xelîl DUHOKÎ

*E. Mizûrî di sala 1946'an de li gundê Êtotê, nêzûkî bajarê Duhokê, li Kurdistana Iraqê ji dayik bâye. Di sala 1969'an de, li zankoya Bexdayê beşê cografyayê bi dawî aniye. Wî helbesta xwe ya pêşîn di sala 1967'an de, di rojnameya Birayetî de belav kiriye.*

*Mizûrî li devera Behdînan yek ji helbestvanên nivşê yekê ye û di qada edebiyatê de cihê wî yê taybetî heye. Helbestên wî di layê form û naverokê de biserketî ne. Wî heta niha du dîwan çap kirine.*

1 - *Ji Evîna Çirayên Kevin, 1980.*

2 - *Li Xelkê Tehlê, Li Min Şîrînê, 1987.*

*Mizûrî bi dehan vekolin û gotarên edebî di rojname û kovarên kurdî de belav kirine, di festivalan de helbest xwendine.*

*Me li Kurdistanê Ebdulrehman Mizûrî dît û ji bo xwendevanên Nûdemê ev hev-peyvin li gel kir.*

**Xelîl Duhokî:** *Te kengî û ji bo çi dest bi nivîsandinê kiriye?*

**Ebdulrehman Mizûrî:** Min di sala 1967'an de helbestên xwe belav kirine. Bindessû û tepeseriya mîlettê kurd, jarî û zîvariya mirovîn kurd, bazirganiya beg û axan, bi rîncber û hejarên kurd, dikir û dikin, xwariya teraziyê, hişkiya ewrên rastiyê, hef hefa gur gura ji bo pirkirina gûrfan û kursîka... Gelek hokerên din, ez ber bi agirê helbestê ve paldam û bi çekê wê heta ez mame, dê li dijî van tuxman rawestim.

**X. Duhokî:** *Barê edebiyata kurdî iro çawa ye? Helbest, çîrok û rexne...*

**E. Mizûrî:** Li Kurdistana başûr iro qada helbestê germ e. Hozanên me pêkolê dikin ku bi çekeke nû bêne meydanê. Çekê musîkê, çekê çîvanokê, çekê zimanê çizaviziyê, çekê mînakgirtinê... Çawa be pêkol ji cihda zîvirînê baştı e... Çîrokê jî kevlê xwe rahiştiye, hêdi hêdi xwe dixemilîne. Bi hizra min rexne gelekî kîz e, an jî hema hema tune ye. Rexnevan hêceta digirin. Em nîzanin çi binivîsinin? Lî ne weye keko! Me girtî ji bo berhemên iro rast dibêjin. Me got, me girtî. Baş e, wan bo kilomtekê mîna Xanî, çi kirine! Ji derya mezina Cizînî, çi deraniye! Ji rûbarê hingivê Naşî çi vexwarine! Bersiveke eşkere tune ye!

**X. Duhokî:** *Nêrîna te li ser edebiyatvanên li derveyî welat çi ye? Wezîfa wan çi ye û ew çi bikin baş e?*



*E. Mizûrî*

**E. Mizûrî:** Ferkarê nivîskarên kurd yên li derveyî welat ew e ku doza miletê xwe bi xelkê biyanî bidin naskirin, çand û rewşenbîriya miletê xwe wergerîne zimanê biyanî, berovajî jî rast e, ya xelkê jî wergerînin zimanê kurdi û belav bikin. Bira ferkari li ser wan gelek e. Li derve serbestî ye, dikarin destnivîsên edîban çap bikin. Destnivîsên kevin li muzexaneyan biparêzin. Tiştên ku rojhilatvanan li ser dîroka kurdan nivîsandine kom bikin, wergerînin. Ma ne fedî û fihêtî ye, heta niha, destnivîsên kurdi yên li Berlin û Leningradê, wan sax nekirine.

**X. Duhokî:** *Tu niha bi ci mijûl i û projeyêne te ci ne?*

**E. Mizûrî:** Bibûre, ez nikarim projeyêne xwe bibêjim. Keko, şert kirin e, ne gotin e. Mezinan gotiye: "Sed gotin, gorî kiriyarekê bin".

**X. Duhokî:** *Di vî kawdanê xerab de rola edebiyata kurdi ci ye?*

**E. Mizûrî:** İro, piştî serîhildana Kurdistana başûr, dê rola edebiyata kurdi ci be! Şerrenîxa partiyêne kurdi ye. Sîxur, guhbel û lêbokan, li xwe xiir dîkin! Tirkên axa û began pir dîkin! Vizzzîna super û tirimpêlen berpirsan e! Piraniya xelkê jî, ne nan e û ne ar e! Kes *Ehmedê Xanî* bi şûseyeke Wiskî nakire! *Cegerxwîn* nakin şofêrê superên xwe jî!...

*Kes nakete meyterê xwe (Camî)  
Ranagirtin kesek (Nizamî)*  
*Xanî*

# RÜPELA DAWÎ DI AVESTA DE

Jan DOST

Ev e karwanên hejara  
Yên li ser rêkêن dirêj  
(Weke nalînên evîndaran...) diçin  
Eşqa Kurdistan û çend gul  
Ji bîhara şewitî  
Dane ser mil... û li dil  
Niştiman bûye nîgarek daleqandî  
Xwîna sor perwaz e jê re

Hooo Ahûra!  
Bo çi her salê biharêne me di xwînê da  
dibin?  
Qeyikên hêviyê bo çi  
Berî bigihin peravê dişikin?  
Gulêñ Newrozê berî ku bîbişkîvin  
Tev ji kokê radibin?

Hoo Ahûra!  
Tu li me bêdeng dinêrî  
Çawa agir bi welatê me ketî  
Kuştiyêñ me li riyan avêtine  
Kes tune wana veşêre... Kes tune

Ho Ahûra  
Ehrîman iro ketiye van gund û bajaran  
Bi hezaran  
Dane ber lingêñ xwe Nesrin û Binefş  
Nêrgiz û Şîlan û Sosin  
Tev bi arê dojeha Napalmê sotin

Ho Ahûra  
Eşqa Kurdistan şewat e  
Xurt e wek Zab û Fîrat e  
Dareke kevnar e reh berdane axa vî dili  
Eşqa Kurdistanê ar e  
Arekî dijwar û har e  
Xwîn ji tînê dikele  
Mîna hêlanek ji xwîn e  
Dil li asoyêñ ji agir digerîne  
Eşqa Kurdistanê rengê çemelki  
Rê li dil kolane pêl pêl herikî  
Kengî çem wenda dikin...  
Rêçikên lê herikîne?  
  
Wê çiya tev bêne xwar  
Dar ji kokê hil bibin  
Çem zuha... bê av bibin  
Eşqa Kurdistan tenê  
Wek berfa serê zozan û çiyan  
Weke arê Babegugur  
Wê bimîne  
Eşqa Kurdistan tenê  
Wê çivikêñ barkirî  
Tev li hêlinêñ piçûk û şewitîne  
vegerîne.

Bêrût, 91

# KUJTINA ROYÊ



## Şahînê Bekirê SOREKLÎ

Zivistana bi şevêن drêj, sar û tarî êdî koç dikir. Ev saldema bi befir û bahoz û baranê dagirtî hêdî-hêdî şûna xwe ji bibara xweş û şen re vala dikir. Biharê li gel xwe hêvî dihanî. Roya ku ev bû bûn bêtir ji çar mehan bi dûn ketibû û tenê hindek caran xwe şermok û bêhêz di nav ewran re xewan dikir, bi koçkirina zivistanê re dest pê kiribû şewq û germahiya xwe ji nû ve pêşkêse ev beşê cihanê bike.

Li bajarê Şînyarê Cejna Biharê li dû rojekê dest pê dikir. Bi çûk û mezinên xwe ve, bi jin û peyayên xwe ve, bi belengaz û dewlemendên xwe ve, bi zana û

nezanên xwe ve xelkê bajêr xwe ji bo vê cejnê ku sê rojan ê bidomanda amade dikirin. Şeniyê ev bajarê çiyayî dest pê kiribûn dilên xwe ji tarîbûna zivistanê vala bikin û bi ronahiya Roya Pîroz tiji bikin. Dayikên ku tê negîhiştibûn di katê de hertişê ji bo cejnê grîng amade bikin bi lez fistanên bedew ji keçen ciwan re çêdikirin. Li pêş heykelê Roya Xudayîn keçen ketibûn çarde saliya xwe ê sibe rêz bi rêz têketina dîlanên rêzgirtina ji Roya pîroz re. Qurbanên hatinî bêslîkirin ê bihatana serjêkirin, xwarin û vexwarin ê bihatana belavkirin, kesên biçûk û ciwan ê destên mezinan

ramûsandana, mezinan enî û çavêن wan; û serekên ola ronahîperestan ê li xelkê şüret bikirana û bigotana, "ey gelê Şînyarê, ji hev û din re rind bin. Bila yên biçûk rêtê ji yên mezin re bigirin û yên nezan spasiya zanayêن xwe bikin. Bila yên mezin ji yên biçûk hej bikin. Derewan li xwe û li hevûdin mekin. Wek Roya Paqîş amancpak bin û wek xuristê di şevreşiyê de li benda hilatina Wê bin..."

Aramozê hejdeh salîn, şivanê gundê Pêlemergê, wî jî xwe ji bo pîrozkirina Cejna Biharê amade dikir. Ji rojêñ herçar saldeman ev sê rojêñ cejnê bûn ku hestê bextiyariyê di kûraniya dilê wî de diafrandin. Di nîvê şevê de ew û heft mîrêñ din ji gund derketin û berêñ xwe dan Şînyarê, li gel sê nêriyêñ bijarte ku gun-diyan wek diyarî ji pîrê olê re dişandin.

Asîman çıksayı bû, stêr dibirûşin û di navbera wan de hîva guloberîn, wek şabinşahêkî di nav mîran de, xwe ji bo xewanê pêşkêş dikir. Aramoz bi dilşadiyeke gewre ber bi pêş diçû. Ji xem û kederan azad xwe weqa sivik û bi hêz didit; te digot, ew ê bifiriya, wek teyrekî baz. Di dilê wî de hesteke taybetî hatibû holê, hesteke bi hejkirina xuristê û evîna ji bo Roya Xudayîn dagirtî.

Rêwiyan nêzikî li bajêr kirin. Bi gihîştina çemê Avîsa re, ku çemekî biçûk bû û bi dora bezar gav ji bajêr dûr bû, şefaqê xwe li aso xewan kir. Rengekî soravînî çeleng xwe li beşê rohilat xist navbera erd û asîmêñ. Roya Xudayîn li rê bû, da xuristê bi ronahiya xwe ya pîroz bixemilîne, geş bike dilan, da di gulîstanan de bişikifîne kulfîkîn li hev civilî û germahîya xwe diyariye deryan û çeman, mit û daran, lawir û merovan bike.

Aramoz xwe ragirt, ji hevalêñ xwe ve-

getiya û bi çend gavan ber bi çepê çû. Wî kincêñ xwe ji xwe danîn û xwe avêt nav ava çêm. Bîstekê ava sar giyanê wî tezand, lê wirde-wirde germahîya giyanê wî û sarbûna ava çemê Avîsa bi hevûdin re gihîştin aşitiyê. Aramoz, berî biçe der, xwe sê caran noqe bin avê kir û xwe bi tevahî paqîş kir. Li dû ku kincêñ xwe ji nû ve li xwe kirin, ew çû ew haliyê çêm û çend qırş û darik li hev civandin. Wî piçek pûş ji bêriyeke xwe derxist, xist bin qırşan û dest avêt bêriyeke din, du kevirêñ çeqmaqîn jê derxistin û agir vêxist.

Bi vêketina êgir re Aramoz jê re secede kir û gotê, "ne ji te re, lê ji ronahî û germahîya te re secedeyê dikim. Tu Xuda nîn î, lê di te de nêşanêñ Xwedê hene. Tu germahîyê didî, gemarê dikûji, bîşan dikewînî, sermaya zivistanê dişikêñînî, tarîbûna şevê di beşekî de dicirînî. Min rîz heye ji hêza te ya bêyî stûrbûn re." Di ev kat de Ro hilat. Xuristê bi tevahîya xwe ji Roya Xudayîn re secede kir û bişirî. Aramoz berê xwe da Roya Pîroz, destêñ xwe ber bi wê rakirin û gotê: "Tu ji bo cihanê hebûn î, bêyî Te nîn e jiyan, tune hebûn. Tu yi fermadarê saldeman, Tu yi Şahinşahê asîman. Ey Roya Xudayîn, pîroz î Tu, germahîya Te tiji evîn e. Tu li dûr bî serma ye, Tu li nêzik bi dilşdi ye. Hej dikim ji Te, ne ji tîrsa dil, lê ji bo xatirê rastiyê. Tu pirr mezin î, lê xwe biçûk xuya dikî, Tu her didî, qe narwazî. Hêz û alawiya te bêyî sînor e, lê qe nakî gummegum. Li pêş te pirr biçûk im, lê bi saya te xwe mezin dibînim..."

Ji bajêr çar leşgerên siwar ber bi Aramoz hatin. Bi gihîştina wan re yekî zexmî, drêjî rîhdrej xwe ji ser hespê avêt xarê û dest pê kir bêyî pirs û bersîv bi çoyê xwe li Şivanê ciwan xe. Li dû ku xwîn di guh û bêvilêñ wî re hat der

leşger destên wî bi benekî grêdan, xwe avêt ser hespa xwe û ew li xar kir. Bi gîhiştina heykelê bajêr re Aramoz herna-hema li mirinê bû. Leşgerekî din satilek ava sar bi ser wî de berda, ew li pê xwe kişand û gîhand Roparasta, pîrê pîrên olê. Roparasta rabû ser lingan û bi rabûna wî re ew qirecira di nav xelkê de vemirî û bêdengiyeke bi tirs û sam xwe li holê feriz kir. Roparasta destê rastê ber bi Aramoz drêj kir û bi dengekî olîn û bi hêz axift: "Ev xortê ronedî Roya Pîroz ihanet kir. Li şûna ku were wek me hemiyan li pêş heykelê Royê dest bi cejna bîharê bike, wî bi pozbilindi, bi tenê xwe û li gor dîtina xwe ya kêm li ber çêm evîna xwe ya bêrêz ji Roya Xudayîn re pêşkêş kir. Bi ev kirina xwe wî em, heykelê bajarê Şînyarê, hûn û ber me hemiyan Roya me ihanet kir. Bi navê Roya Pîroz, bi navê gel û bi navê heykelê Şînyarê, em ev kesê rîznegir ta-wanbar dîkin û cezayê mirineke di ev kat û şûn de didinê"

Gotina Roparasta yek bû, nedibû du-duyan. Mirûdan dan çepikan, kesen li dora wan, hinan bi bawerî, hinan ji tîrsan, destêن xwe li hev xistin. Hinêن din bi dizî ji ber ev neheqiya bi navê Roya Xudayîn dihate kirin girîyan. Drêj nekir, leşgeran êzing li meydana heykelê Royê dan ser hev. Di navîna wan de diregekî qalin bi cih kirin û Aramoz bi wî ve grêdan. Cihgirê Roparasta ferman da ku bêtir êzing werin hanîn. Dûvre Cihgir dest bi merasimên şewitandina Aramoz kir û li dû xwendina çend rîzêñ bi navê Royê pîrsine ji Aramoz pîrsin, ku xortê şivan bi kurû bersivîn wan dan.

- Tu kî yî?
- Navê min Aramoz e. Şivanê gundê Pêlemergê me.
- Tu li van deran li çi digeriye.
- Hatim pîrozkirina Cejna Bîharê.

- Te çîma di ev roja pîroz de bi serê xwe ji Royê re secede

kir û ne li paş Roparastayê Serdar, li pêş heykelê?

- Rêzgirtin ji royê re, ne tenê li pêş heykelan, lê li her

dêrê dikare were girtin. Ro sînoran nedinase, wisa jî rîzgirtina ji bo wê.

- Ma şivanek ci zane ku bikaribe bi serê xwe di rojekê wisa pîroz de rîzeke layiq ji bo Roya Pîroz pêşkêş bike?

- Şîvanine hene, ku ji pîrên olan bêtir royê dibînin.

- Tirsa te ji mirinê heye.

- Ji mirineke di nav jiyanê de heye, lê ne ji mirineke di

nav agirekî pîroz de.

- Tu di jiyanâ xwe de li ci poşman î?

- Ne li tiştekî. Tenê li ber evîndara xwe dikevim. Heye

ku ken li ser lêvîn wê bimire, yan bixwaze bigirî, lê newêribe. Girî jî jiyan e.

- Daxwaza te ya dawîn ci ye?

- Bila hejkirina Roya Xudayîn serbest be.

Agir vêket û li dorhêlên wî mirûd û leşgerên Roparasta ketin dîlanê. Kesine bêyî dil çepik ji dîlana wan re lêxistin. Hinên din bi dizî berên xwe dan malêñ xwe. Deng ji Aramoz nehat. Di nav agirê êzingan de hêstir ji çavêñ wî dihatin xarê, ne ji ber dûyê êgir, ne ji tirsa ji mirinê, lê ji ber ku ew li gel hemî hejkirin û rîzgirtina ji Roya Zergewher re bi navê wê dihat şewitandin. Wî hey li xwe kir, da ji bo şastî û neheqiya Roparasta û mirûdêñ wî royê di çavêñ xwe de reş neke. Lê ne ew ramana wê kurtebîstê, ne jî dûyê êzingan yê reş, dikaribûn rengê Xudayîn yê Roya li jor di çavêñ wî de bidin guhertin. Berî ji xwe

biçe, berî can ji giyanê wî veqete, dengekî bi qîfîneke lawirekî xudayîn ji Aramoz hat der û li tevahiya Şînyarê hat bîhistin: RO RASTÎ YE. RASTÎ NE RO YE.

Li ser nêrdewanên heykelê bajarê Şînyarê kalekî kor daniştibû, merovekî rûşerîn. Rîhêن wî yêن spî, porê wî yê li ser milan, şêweya rûniştina wî û serê wî yê bilind çak diyar dikirin ku ew mîrek e, ne mîrikek, ku ew zanînhej e, ne pêzan. Çavêن wî yêن rîjiyanî ew ji dîtina ev bûyera destpêka Cejna Bihara îsal bêpar hîştibûn, lê ew gewromerovek bû, wî hertiştî disit, ji ber ku li nik wî pêkaniya dîtina bi dil û mîjî hebû û tiştê merov bikaribe bi dil û mîjî bibîne ci çav nikarin bibînin. Dema wî qîfîna ji navenda êgir haftî der bîhist, wî di ber xwe de wisa got: "Aramozê ciwan! Bi kujtina te rastû brîn bû û Ro careke din hat kujtin. Ro namire, lê di cîhana me de ew bi desten merovan roj bi roj tê kujtin. Bi kujtina te, wan ne tu, lê Ro kujtin. Belê, Aramozê şivan, Ro namire, ji ber ku bi mirina wê re cîhan diçê, lê dema jiyana merovekî bi neheqî ji wî tê girtin bi mirina wî re Roya Xudayîn careke din tê kujtin, ji ber ku ew bo her merovekî Royeke taybetî ye. Nezanî, neheqî, xasûkî û derewên merovine çakînexwaz me hemiyan gemarîn dikan. Gemara wan ne tenê merovên bêtawan û dilpaqîş, lê herweha Roya Pîroz bi xwe jî gemarîn dikan. Di destpêka Cejna Bihara îsal de bi navê Xuda Xuda hat kujtin, û ev ne cara yekem e, ne jî ya dawîn."

Zarokeke neh-deh salin nêzikî li kalê kor kir, lingêن wî yêن xas ramûsandin, bi destekî wî girt û ew ji peresgeha bajêr bi dûr xist. Her kesî li Şînyarê û dorhêlên wê çiroka rijandina çavêن kalê dizanibû, haya herkesî jê hebû, ku ev

merovê mezin, ji bo xatirê ku ew bi çavêن xwe tiştan wek nezanine jê dixwaztin bibîne nebîne çavêن xwe dabûn rijandin. Şînyariyan hemiyan baş pê dizanibûn ku li dû rijandina çavêن ev merovê mezin rastî di çavêن seransere wan de şâşomaşo bû, lê li xwe nedihanîn, ne jî diwêribûn navê wî wînîn ser zimên. Ji tirsa mirûdêن nezan û sama Roparsata ew newêribûn li kêleka wî jî danişin.

Li dû kujtina Aramoz saldem her cûn û hatin. Roparasta bi desten leşgerên oleke din hat kujtin. Mirûdêن wî ji hevûdin belav bûn û dû re dan dû terîqetên din û bi eynî serhişkiyê mirûdiya serol û sermezhebêن din kîrin. Pêxember, yek li dû yê din, ew jî hatin û cûn, hemî nêr, hemî samî. Xelkê bajarê Şînyarê roperestî li şûn hîştin. Serpêhatiya Aramoz ji bir hat rakirin, wekî bi hezaran serpêhatiyêñ mezin û rûspiyêñ Şînyarê, ku çiroka kalê kor jî yek ji wan e. Serpêhatiya Aramoz divabû were gotin. Li dû weqa sedsal jî divabû were gotin. Bi nivîsandina wê Roya bi mirina wî re haftî kujtin nikare careke din were vejandin, ji ber ku vegerandina Aramoz bi xwe, bi can û giyan, ne pêkan e, lê heye ku bi têgîhîştina xwebêja çirokêñ bi vê nolê mirûdêñ şeyxên Şînyarê, ku îroj gundekî nîvxirabe ye, hişyar bibin û Royê car li dû care nema bikujin. Hêñ baştir, em hêvî bikin, ku ci şeyxên Xudaperest Xwedê bi navê Xwedê nedin kujtin! Mixabin, ev tenê hêviyek e, lê çawa be jî, jiyân bêhêvî ne ci jiyan e.

(Sydney: 7/1993)

# Delavê Ewran

**Mervanê KELES**

Vedana kolanên AVÊ wê çi  
Nêrgizan vejîne...?  
WA... WA... Binêre;  
Mîrin di çavên te de  
Dibe jiyan...!!!  
Darbesta  
Gulan  
di nav destêne te de  
bê guman  
dibe çavkaniya stêrkan!!!  
Weşana mîwan  
di sînga te de  
dibe memikêne kerik û gezo  
  
De ka  
bera rûmeta te  
ji nû ve li axê  
baranekê birjîne  
û delavan  
mişt bîhna ewran bike!!!  
De ka...

**NAZELÎNÊ**

**Rizoyê XERZÎ**

Serê govendê berda  
Dengê min  
Bi destmala destê wê re  
Li ber ba çû  
Lewra  
Gotinên şêrîn  
Nema karin  
Govenda helbestekê bigirin.

# Kurd û Ermenî



Naci KUTLAY

Ez nefikirîm ku di derheqê têkiliyên Kurd û Ermeniyan de nivîsarekê binivîsim. Ev xebateke giran û fireh dixwaze. Ya rastî ne hêsan e ji. Ji hezar salî zêdetir e ku ev herdu gelan di rex hev de û di cîna ji di nav heydu de dijîn. Divê li rewşa wan a dîrokî û civakî bê lêkolînê. Ev him tiştekî giranbiha ye û him ji tiştekî ku herdu gel hewcedar in.

Di vî warî de hinek Ermenî û biyaniyan nivîs û pirtûk çapkirine, lêbelê di nav Kurdan de ev babet gelekî nehat şirovekirinê. Çend kesan qala demên dawiyê kirin, ew ji pir dûr û dirêj nîn in.

Ne hewcaye ku meriv bêje, ev lêkolîn û nivîsên Kurdan têrê nake.

Ez ji dixwazim di vê nivîsara xwe de qala du tiştan bikim: Hinek dibêjin ku "Kurd di qirkirina Ermeniyan de rolekî nebaş girtine" û súcdar in. Lê hinek ji dibêjin, "Kurdan gelek Ermenî ji qirkirînê xelas kirine û ew parastine".

Ne baş e ku nivîskar dîtina xwe di destpêkê de bêje, lêbelê ne baş be ji, ezê bibêjim: Kurdan Ermenî him kuştine, qirkirine û him ji li gelek ciya ew ji qirkirînê xelaskirine.

Di vê sedsaliya dawî, -qurna 19. û bi taybetî di nîvsedsaliya duemîn, ji ber tesîra Şoreşa Fransê a 1789 û bûyerên ku di salêن 1830-1848, li Ewrûpayê qewimîn, "hîsyarbûnên netewî" zêde bûn. Osmanî û İmparatoriyyen li Ewrûpa Rojhilat xebata "hereketên netewî" destpêkirin. Ev İmparatoriyan yekmilletîn nînbûn, ji zêde milletan pêk hatibûn.

Piştî Şerê Dinyayê yi Yekemîn, gelek ji van milletên bindest êdi bi xwe serê xwe bûn. Ermenî ji yek ji van milletan bûn ku partiyêن azadîxwaz saz kiribûn û hereketê wan i netewî xurt bû.

Di nîvsedsaliya pêşîn, Siltanêن Osmanî *Mehmûd û Evdilmecûd* xwestin ku "merkezibûna dewletê" xurt bikin û zordesû ya li ser begên Kurdistanê zêde kirin. Begên Kurdan wê demê hela hê bi nîv xwe serê xwe bûn. Li ser van bûyeran, di nav begên Kurdan û İmparatoriya Osmanî de bi salan şer dom kir. *Begêن Babanî* yê *Silêymanî*, *Mehmûd Paşa* yê *Rewandizî*, *Mîrê Botan* û *Cizîre Bedirxan Beg* û *Yezdanşêr Beg* ji wan yên ku bêtir têne naskirin in. Li gor dîroknasan, çend meh berî Şerê Bedirxan Begê û Osmanî, *Mîr Bedirxan* şes hezar *Nastûrî* û *Keldanî* kuştin. Lê ji wan raporêن dîrokî yên wê demê, em dîsa dibînin ku ji bilî *Nastûrî* û *Keldaniyan* Ermenî ji hatine kuştinê. Li pir ciyêن Kurdistanê, ew gelên Xiristiyân bac didan Begên Kurdan.(1)

Di qurna 19. û berî Şerê Dinyayê yê Yekemîn, rewşa Kurd û Ermeniyan, bi yalê aborî û cîvakî geleki ji hevdu cuda bûn. Bi sed salan li rex hev û di nav hevdu de jiyabûn, lê Ermenî dewlemend, hunermend, tehrê burcuwaziyê de û Kurd di halê eşîtiyê de bûn. Gelekên Kurdan koçer bûn, jimara yên ku di bajaran de bi cî bûbûn, kêm bûn û li gundan bi cîbûyîn û karê erdçandinê, qasî Ermeniyan pêşde nînbû. Kurda pez-dewar xwedî dikir. Begitî û axatî di nav wan de xurt bû. Dema ku Kurd ji zozanan vedigeriyan gundêñ xwe, zireet, bax û bostanêñ Ermeniyan talan dikirin.<sup>(2)</sup>

Li ber rewşa Ermeniyan a burcuwazî, hereketêñ rizgarixwaz di nav Ermeniyan de zû destpêkir. Kurd ji van xwestinêñ hemdemî dûr bûn, li ser nav û hissêñ İslâmî, bi Siltanê Osmanî ve hişkebişk girêdayî bûn. Kurd ji rêxistinêñ Ermenî yên rizgarixwaz ditirsiyan, ku eger Ermenî bi serkevin dê li ser Kurdan hukmê giran bi karbinin.

Di salêñ 1843-1846' an de, *Bedirxan Begê Nastûri* û *Keldanî* kuştin û wê çaxê hinek Ermenî jî hatin qirkirinê. Paşê, di sala 1867'an de, Siltan Evdilezîz sefereka gerê li Ewrûpayê kir; pişti vê gerê li Kürdîstan û Ermenîstanê bûyerên olî (dînî) qewimîn, dîndar û sofiyêñ Kurdan êris birin ser Ermeniyan. Sefirê Swêdî yê Stenbolê, 27 Tebax 1867'an de raporekê ji Konstantinopol'ê -Stenbolê- dişine Stockholm'ê -Swêd-. Dinivise ku, hinek dîndar û "derwêşan" dan pêşîya Kurdan, ji Diyarbekir'ê ber bi Sason û Bedlîs'ê bi rîketin, êris birin ser Ermeniyan û gelek Ermenî kuştin. Wisa ku, Ermeniyê Wan'ê jî ji vê qirkirinê para xwe girtin. Di wê demê de makîna nivîsê tunebû, lewra rapor bi dest hatiye nivîsandin, fotokopiya vê raporê pêşkêş dikim.

Cirantî û hevalbendiya Kurd û Ermeniyan bi sed salan başbû lê belê di qurna 19. de her diçû têkiliyêñ wan xeraw bûn. Di dema Siltan Evdilhemîd de (1876-1909) êdî rewş pir nebaş bû. Ev

nebaşbûn di pey *Evdilhemîd* ji, dewra *İttihat-Teraqqî* yan de her çû xerawtir bû. *Evdilhemîd* rîya Misilmantiya hişk û teng dabû pêş xwe. Misilmanê sunnî ji yên din pêtir digirt. Ev ditinêñ wî yên teng ne besbûn, "Tirkbûn" a xwe ji lê zêde dikir. *Yalçın Küçük* ji bo wî, "Tirkê İslamperez" -İslamci Türk- dibêje. Siltan Evdilhemîd rûgermî nişanî axa, beg û şêxên Kurda dida û dixwast ku dîndariya wan bi karbîne û Kurd dijîtiya Ermeniyan bikin. *Siltan Evdilhemîd*, sala 1891-1892, "Alayêñ Hemîdiyê" sazkar. Begêñ Kurdan bûn serokên van "Alay"an ku ji eşîretên wan saz bûbûn. Feodalên Kurdan êdî bi rêxistinî bûn û bi kişişî kirina *Siltan Evdilhemîd*, zorbetî û talanê Ermeniyan dikirin û ew diküstin. Bûbûn bela serê wan.

Li Konferansa Berlin'ê, 1878, qerar dabûn ku, Dewleta Osmanî gere hinek rewşbaşbûnê -îslahat- li Ermenîstan'ê bîne cî. Siltan Evdilhemîd ne digot na, lê belê dilê wî ne bi van qeraran re bû. Kurd pêşda dikir û ew dikirin behane ku van qeraran neyine cî. Xwedêgîravî ne bi daxwaza dewletê dibû, lê Kurdêñ nezan û koçer sebebê van bûyeran bûn.

Kurdêñ "Alayêñ Hemîdi" û eskerên Osmanî bi hev re, di salêñ 1894-1896'de, êrişen mezin birin ser Ermeniyan. Bi taybetî li Sason, Mûş û Bedlîs'ê bi hezaran Ermenî qir kirin. Alayêñ Hemîdi êdî li her derê Ermenî talan dikirin û zordestiya wan êdî rojanebû.<sup>(3)</sup>

Sala 1894'an, *Siltan Evdilhemîd* xwe bi telegrafê ferманa qirkirina Ermenî yên Sason û Bedlîs'ê da. Axa û begêñ Kurda alîfîkariya eskerê Osmanî kirin. Di dawiyê de wâli, qumandarê Osmanî û axa-begêñ Kurda mal-milkê Ermeniyan di nav xwe de par ve kirin.<sup>(4)</sup>

Bi vî tehrî qirkirina dewlemend û ticarêñ Ermeniya kar û barê ticareta van herêman, hêdî hêdî dikete destêñ Tirk û Kurdan.

Lê li herderê Kürdîstan'ê kar bi vî tehrî neçû. Hinek axa, beg û şêxên Kurdan

texmîn dikirin ku rojêن pêş wê çawa bibin. Xwe jî bi Ermeniyan re cîrântî ū dosû kiribûn. Ne dixwastin ku bêbextiyê bikin. Lewra, fermana *Sultan Evdilhemîd* û xwastinê Dewleta Osmanî nehanîn cî. Ermenî nekuştin. *Seyid Ubeydullah* 'ê Nehrî yek ji wan e. Axa û begên herêma xwe û hevalbendêن xwe kom kir û di vê civînê de waha got: "Ji bo qirkirina

komela bi dizî, du kes jî Kurd bûn. Dr. Abdullah Cevdet'ê Erepçîri û Dr. İshaq Sükûti yê Diyarbekrî.

Îtîhat-Teraqqî berê pêşîn azadîxwazbû û bo demokrasî û yekîtiyê kar dikir. Hemû milletên cure bi cure yê di bin navê "*Osmani*" de ziman û heqên xwe yê netewî biparêzin. Îtîhat-Teraqqî qerar dabû ku bi rêexistinê Ermeniyan re tev

*Légation  
de  
Turquie à Paris  
Constantinople le 23 Novembre 1894.  
N° 101.  
7040*

*Monsieur le Comte,*

*Par ma dépêche N° 9 du 24 Septembre j'essaie  
l'honneur d'entretenir Votre Excellence au sujet  
des massacres qui peu de temps avant avaient  
eu lieu en Arménie. — Au cours d'opérations ces  
faits honteux étaient causés et continués*

Xirîstiyana, Tirk hewcedarı me Kurdan e. Ji bo wê, niha qedrê me digirin. Dema ku Xirîstiyân xelas bûn, wê çaxê dor tê me. Ew ê me qir bikin." (5)

Kurdekî feodal, *Mehmûd Paşa* yê Qoçgiri jî tevî listikên *Sultan Evdilhemîd* nebû. Kurê Wî, paşê wê di sala 1920-1921'an de, dijî Tirkan dest bi "*Serîhildana Qoçgiri*" yê bike. Di 1895'an de xwastina Dewleta Osmanî qebûl nekir û êriş nebir ser Ermeniyan. (6)

Li dijî zordestiya *Sultan Evdilhemîd*, 1889'an de "*Komeleya Îtîhat-Teraqqî*" hat damezirandin. Ji pênc hîmdarên vê

kar bike. Herdu alî jî hewcedarı hev bûn. Lê piştî wan salên pêşîn, Îtîhat-Teraqqî yan her çün doza Tirkîtiyê pêş de birin. Bûn Tûranî. Lewra li hemberî heqê Ermeniyan tengasî derxistin, nexwastin bi dil hevalbendî bikin. Sala 1898, cara ewlin li derfî İmparatoriya Osmanî, rojnama Kurdi "Kurdistan" hate çapkiranê. Abdullah Cevdet, İshaq Sükûti û Bedir-xan Paşazade Evdirehman di vê rojnamê de û di rojnamên Îtîhadî yan de nivîsin ku Kurd gura *Sultan Evdilhemîd* nekin û Ermeniya nekujin. Van karên qirêj ne karên Kurdên biseref û binamûs in. Bav û kalên Kurdan qirkirin û talan kirina Er-

meniyan qebûl nekirine. Kurdên serbîlind, gerek li hemberî tişîn weha bisekinin.<sup>(7)</sup>

Salêن 1898-1899, rojnameya Ermenî "Trojâk" û Kurdi "Kurdistan"ê de çend nivîsên Dr. A. Cevdet bi navê "Dr. S." û "Kurdek" hatin çapkirin. Qirkirina Ermeniya hat rexnekirin.<sup>(8)</sup>

Di nîvsedsaliya qurna 19, an de dijîtiya feodalên Kurd li hemberî Ermeniya pir xurt bûbû. Di aliyekevî de *Sultan Evdîhemûd* û memûrên dewletê Kurd kişekiş dikirin. Di aliyekevî din jî, mameste, papaz û azadîxwazên netewî yên Ermeniya roleka nebaş dileystin. Kurdên feodal, yên ku zordestî dikirin, li her heremên Kurdistan'ê hebûn. Wan pişta xwe sipartibûn Siltanê Osmanî. Yek ji vanê navdar *Hecî Mûsa* yê *Motkî* bû. Zorbetiyen wî, ci hanîbû serê "Gulê", keça Ermenî, biraziya papazê Mûş'ê, di rojnamên Stenbolê û Ewrûpayê de cî girtin. Tiştekî berçev e ku, *Hecî Mûsa* paşê di sala 1919'an de bû endamê rîvebirên Kongreya Erzurom'ê. Ev kongre bi destê Mistefa Kemal hatibû damezirandin û Ew bi xwe jî serok bû.<sup>(9)</sup>

Li pir ciyêن Kurdistan'ê bi ser xwastina Siltanê Osmanî miftû, mele û sofiyan qirkirina Ermeniyâ zêde kirin. Miftiyê Palo'yê, mele û waizên Sêwaz, Ruha, Erzurim û Erepçir'ê rolekî bi taybetî listin.<sup>(10)</sup>

Di 1896'an de li Geneva'ê Kurdên ronakbîr belavok belav kirin û şandin Welatê Osmanî, tê de hatibû nivîsandinê ku Kurd gerek Ermeniya nekujin û wek bira bin.

Di karê Peymana Lozan'ê de, serokeskerê Ermenî yên herêma Wan'ê, pêşder K. Noradukyan, di 26 Berçile 1922'an de li pêş nûmerên konfiransê eşkere dikir ku Kurdên Yêzidî û Qizilbaş Ermenî parastîne û dijî qirkirina wan derketine, lê belê Kurdên ji Eştra Celaliyan ew kuştine.<sup>(11)</sup>

Dîsa di rojnamên "Kurdistan", "Kurd Teavvûn ve Terakki Gazetesi", "Hetzâvî Kurd", "Şark ve Kurdistan" û "Jin"ê de

gelek nivîsan cî girtin û dijîtiya Ermeniya hate rexnekirin.

*Serîf Pasayê Kurd*, pişti Hereketê 31 Adar 1909, ku diji *İttihâdî* yan pêk hatibû, reviya û çû Fransa'yê. Kovara "Mechrouiet" li wir derxist. Di vê kovarê de gelek rexneyên giran li *İttihâdî* yan dikir ku di 1909'an de li Edene'yê bi bezaran Ermenî bi destê eskeran hatine kuştinê.

Di vî warî de divê meriv navê *Evdîrezaq Begê Bedirxanî* jî bilîje, pişti 1910'a reviya çû Rûsyâ'yê, li wir komeleyên dostiya Ermenî û Kurda saz kir.

Waxta ku 23 Termix 1908'an de Meşrûtiyet hat îlankirin, gelek ji axa û begên Kurdan kêfxweş nebûn. Nîkaribûn êdî li ser Ermeniyâ zordestiyê bikin û wan talan bikin. Kurdên misilman û Ermeniyê xirîstiyân yên wekhev bibin, pişti Meşrûtiyet'ê begên Kurdan nedixwastin ku vê yekê qebûl bikin.

Ew axa û begên Kurdan ku tevî qirkirina Ermeniyâ bûbûn, têkiliyên wan baş bi Dewleta Osmanî û paşê jî bi Cîmhbûriyeta Tirkîye re hebûn. Nimûneya herî baş *Hecî Qaya* yê Meletye'yî ye, ku *M. Kemal* jê ra name dişand û aîkarî jê dixwast.<sup>(12)</sup>

Kurd ditîrsiyan ku eger Ermenî bibin dewleteka bi serê xwe, yê zorbetiyê li Kurdan bikin. Di vî warî de Kurda bi Heraketê Ermenî yê netewî bawerî nedikir. Van Ermenî yên rîexistînî li herêmên xwe daxwazên ne bi cî dikirin. Şâîrê Kurd ê navdar *Hecî Qadirê Koyî*, tehfîka Ermeniyâ di çend helbestên xwe de diyar dike.

*Xakî Cizîr û Botan, yanî wilâti Kurdan  
Sed heyf û sed mixabin deyken be Ermenîstan.*

*Hîç xîretek nemawa sed car gesem be Quran-Peydahê Ermenîstan, namêne yek le Kurdan.* (13)

Dewleta Osmanî dixwast ku Kurd Ermeniyâ bikujin, lê belê hinek ji Kurdan

ew nedikuştin, tenê dest didan ser mal û milkê wan. *Walî* û qumandarên Osmanî ji ber van kirina diqehirân. Rêbireki Osmanî li Mûş'ê awha dibêje:"... *Me ferman da Kurda ku Ermeniyan ji hole rakin, lê çi heyf ew Ermeniyan nakujin, zêdetir wan talan dîkin....*" (14)

Li Palo'yê, gundê Sekrat'ê, *İbrahim Beg* Ermenî nekuştin lê belê mal-milkê wan ji dest wan girt.

Osmaniya li Kurdistan'ê, bi sedan ew qatil û súcdarênu ku di hepisxanan de bûn, derxistin û şandin ser mal û gundêni Ermeniyan, wan jî him Ermenî dikuştin û him jî zêr, ziv û malênu wan ji wan distandin.

Lê pêwîste ku em bibêjin, Ermeniyan ji dixwast heyfa xwe ji Kurdan bistînîn, lewra di Şerê Dinyayê yê Yekemîn de bi ordiyen Rûsyâ'yê ve ketin gund û bajarênu Kurdan û bi hezaran Kurd kuştin û bûyerên nebaş kirin.

Hinek bûyer hene ku aniha meriv wan dixwîne anjî dibihîze, ji ber wan kirina fedî dike. Yek ji van bûyeran ewe ku, salênu 1915-1916'an de li Diyarbekir'ê axa û begênu Kurdan bo qirkirina Ermeniyan rêxistin çêkirbûn. Jê re "*Quwetên Mîlîsi*" digotin. Waliyê Diyarbekir'ê Dr. *Mihemed Reşîd* bû. Ew bi xwe yek ji wan bû ku, di sala 1889'an de *İttihat-Teraqqî* damezirandibûn.. Eslê wî, *Çerkezê Qafqasya*'yê bû, lê belê bi ideolojiya xwe "Tîrk"kekî xurt û tûj bû. Wek Tirkekî fanatik bû. *Walî Reşîd Beg* û ji Kurdêni Diyarbekir'ê rêxistineka

"mîlis" saz kir û bi destê wan bi hezaran Ermenî hatin kuştin. Pişû 1925'a Dewlet a Tîrkiyê ev axa û begênu Kurdan ji surgûnî Anadoliya Rojava kir û hinek ji reviyan çûn derî Tîrkiyê. *Cemîl Paşa* *Zade Mistefa Beg*, bavê *Mistefa Ekinci* -1950-1957 mebûse Diyarbekir'ê-*Yasînzade Şewqî Efendi*, *Mala Pirînçîzade*, *Cercîzade* û Tarancî'yan hinek ji van Kurdan in. (15)

Kurdê navdar ku xwe Tîrk qebûl dikir û bû ideologî Tîrkîti'yê, *Ziya Gökalp* ji ji

qirkirina Ermeniyan kêfxweş bû. (16)

Pişû Şerê Dinyayê Yî Yekemîn, mebûse Diyarbekir'ê *Pirînçîzade Feyzi* û *Zulfi Beg* û ji endamê Merkeza Partiya Îtîhat-Teraqqî *Ziya Gökalp* 'ê Diyarbekirî bi tevayî surgûnî "Malta"yê kirin. Kurdeki din, *Sîlêman Nazîf* 'ê Diyarbekirî, nivîskar û rojnamevan bû, ji bo qirkirina Ermeniyan cepik lêdixist, Ew ji şandibûn Malta'yê. Herçar hembajari li wir salekê zêdetir man. (17)

Ji bo ku ew tevî qirkirina Ermeniyan ya salênu 1915-1916 bûbûn, evçend mezinênu Kurdan hatin mehkemekirinê: Mebûse Mûş'ê *Hecî İlyas*, Serokê Îtîhat-Teraqqî ya herêma Mêrdîn'ê *Evdilqadir Paşa*, Mebûse Ezirgan'ê *Xalit Beg* 'ê *Saxîr Zade*, Mebûse Xarpêt'ê *Dr. Hecî Mihemed Efendi*, Mebûse Ruha'yê *Nedîm Beg* û *Şêx Saffet Efendi*, Mebûse Xarpêt'ê *Babos Mistefa Beg*, Mebûse Dersim'ê *Nûrî Beg*, *Mihemed Beg* 'ê kurê *Hasîm Beg* 'ê Mebûse Melati'yê. (18)

Pişû Şerê Dinyayê yê Yekemîn, sala 1919, *K. Mason* li London'ê di *Komela Coxrafayayê* de di derheqê Kurdan de dîtinê xwe dibêje û melûmatan dide: "...Gelek ji me xwedî dîtin û zanînêna şas in. Wisa zanîn ku sebebê qirkirina Ermeniyan Kurd in. Ne wisa ne, berî Şerê Dinyayê yê Yekemîn gelek gelên nemisilman li Kurdistan'ê bi Kurdan re tev dijîyan, kêfxweş û bextewar bûn. (19)

Diroknasê bi nav û deng, Kurdologê Yekîtiya Sovyet-Rûsyâ nû- *Lazaref* û *Mihemed Nûrî Dersimî* dibêjin ku: Kurdê Dersim'ê Ermenî ji kuştinê parastin. Subayek bi navê *Mistefa Vesa*, xelqê Dersim'ê bi eskerên xwe ve li dijî qirkirina Ermeniyan sekînî, ji pênc hezarî zêdetir Ermenî bi saya wî xelas bûn, xwe bi eskerên xwe ve tevî ordiya Rûsyâ'yê bû. Hemûyan, bêtir jî Kurdêni Yezidi Ermenî parastin û alîkariya wan kirin. (20)

Ez dibêjim ku Kurdan li hinek ciyan

Ermenî kuştin lê li hin ciyan jî ew ji qirkirinê parastin. Bo ku van gotinên xwe rind biparêzim, dixwazim piçekî ji qala protokolên mehkema "Soromon Tehleryan" bikim.

Serokê Partiya Îttihâd-Teraqqî, Serokwezîr û Wezîre Hundir *Talat Paşa* di qerdayîna qirkirina Ermeniyan de rolek herî mezin girtibû. Tehleryan ê Ermenî, 15 Adar 1921'ê de *Talat Paşa* di nava Berlin'ê de kuşt.

*Talat Paşa*, *Enver Paşa*, *Cemal Paşa* bi çend hevalên xwe yên İttihadî, pişti binketina Şerî Dinyayê yê Yekemîn ji Welatê Osmanî derketin û reviyan, bi riya Behra Reş çûn Almanya'yê. *Talat Paşa* li Berlin'ê bi naveki din, *Mihemed Saî* û caran *Saî Elî Beg*, jiya, lê xwe eşkere nedikir. Xortekî Ermenî, ji bajarê Ezirgan'ê, dê, bav, bira û xwîşkên wî û hemû malbata wî bi tevayî di sîrgûnê de hatibûn kuştin. Eskerê Osmaniya di rê de hemû gulebaran kiribûn, bi şûr û biviran ew kuştibûn. Tehleryan tenê ji malbata xwe xelas dibe, bi xwe jî birîndar bûye. Kurdên Dersim'ê lê dibin xwedî. Çendekî şûnda Tehleryan dişinin Iran'ê, ewder bêtehliketir e. Tehleryan li gelekî welatan digere û dawiyê de li Parîs'ê dimîne û ji wir jî tê Berlin'ê. Qerar dide ku ciyê *Talat Paşa* hîn bibe û wî bikuje. Ew di dawiyê de xwastina xwe tîne cî. Endamên mehkemê û jurî ji bo serpêhatiyen wî û sebebê ku qirkirina Ermeniyan bi destê *Talat Paşa* qewimiye, Tehleryan sîcdar nabînin. Ji hepsê derdi-keve, diçe Amerika'yê, li wir dijî û 1960'î de dumre.

Nîha em dîsa benê li dor protokolên mehkemê: Tehleryan, 2-3 Hezîran 1921'de, li Berlin'ê "Mehkema Eyaletê" de tê mehkemekirin. Protokol pir dirêjin. Gelek şahid hene. Kesênu ku li Ezirgan'ê di karê "Xaça Sor" de dixebeitûn, wê demê rojnamevan û mîsyoner bûn jî şahid in. Generalê Almanya'yê yê navdar Otto Lîman von Sanders jî di nav şahidan de bû. Di Ordiya Osmanî de cîkî wî yê bi

taybetî hebû û xwedî rutbeka herî mezin bû.

Ezê tenê ew beşen protokolê yên ku qala Kurdan dike, pêşkêş bikim.

Hakim destpêdike, dipirse. Tehleryan bersvîn pîrsan dide:

T. - "Ez, 2 Avrîl 1897'de li Parakîş ê hatim dinê. Bavê min karê ticaretê dikir. Ez du-sê salî bûm em hatine li Ezirgan'ê bi cî bûne. Du bira û sê xwîşkên min hebûn. Xwîşka min a mezin mîr kiribû û xênjî wê em hemû di malekê de dijîyan. Min li Ezirgan'ê heyş-neh sal li dibistanê xwend. Şagirteki serkeşî bûm. Em pir dewlemend bûm. Di salên şer karê me ne wek berê baş bû, lê di dema qirkirina Ermeniyan de rewşa me geleki xeraw bû. Birayê min ê navîn cûbû eskeriyê. Ew neşandibûn eniya şer, li cîkî başûra Ezirgan'ê bû. Ezirgan li Ermenîstan'ê û ser erdê Tîrkiya Asya'yê ye. Birayê min ê esker, dema qirkirinê li mal bû, bi izzin hatibû."

Hakim.- "Li Ezirgan'ê qetliama Ermeniyan ji nîşkê ve hate cî, an berî qirkirinê hînek işaretên wê hebûn?"

T.- "Me hertim dibîhist ku her roj meriv têne kuştinê, lewra me jî tiştên weha texmîn dikir."

H.- "Di derheqê qetliaman de ci dihate gotinê? Bi ci sebebî ev qirkirin dibû?"

T.- "Ji berê ve, ev qetliaman dibûn. Berî ku ez bême dinê, dema ku em bi malkoçerî hatin Ezirgan'ê... Mezinên me qala kuştina Ermeniyan dikirin."

H.- "Ev qetliaman berê jî bûne? Di kîjan salan de qewimîne ev qetliamên berêt?"

T.- "1894'an de li vir, Ezirgan'ê qetliam bûbûn."

H.- "Tu işaretên berî van qetliamên 1915'a, hebûn? Te tiştekî wîsa dît an na? Gelo çima ev qetliaman dibûn?"

T.- (Pirsê femnake) "Ez wê çaxê nehabîbûn dinê."

H.- "1915'an de Tu nehatibû dinê?"

T.- "Em hertim ji qetliaman ditirsiyan,

me sebebê qetiliaman nizanibû."

H.-"Hün ji dê û bavêن xwe jî hîm nedibûn sebebê van getiliaman?"

T.-"Dihate gotinê ku ev hukumata nû, wê li dijî me hinek bûyeran bîne ci."

H.-"Hukumeta Tirka hinek tengasiyên eskerî sebeb nîşan nedida? Di vî warî de tiştek nedihate gotinê?"

T.-"Ez wê çaxê piçûk bûm."

H.-"Dîsa jî hijde salî bûyi."

T.-"Dihate gotinê ku hinek sebebên dîni û siyasi hebûn."

.....  
"Di meha gulanê sala 1915, me bîhist ku dibistan yên bêne girtinê, mameste û ew kesen pêşder yê ji Ezirgan'ê bêne sirgûn kirin. Di serê meha beziranê 1915, xeber dan xelqê ku yê bajêr terk bikin. Xelq ber bi başûre bajêr ve wek kerwanekî mezin bi rê ket. Mala me bi kerekê û erebeka ga, dan ser rê. Rojtira dinê ku me Ezirgan terk kiribû, hemû malbat hatibû qirkirinê. Eskerê Tirka û cendirmê suwarî kerwanê Ermeniya dibirin. Ji Ezirgan'ê ku dûrkentin ew dabûn sekinandinê. Cendirman, tişên wan yên giranbiha û perên wan ji wan sitandibûn."

H.-"Çima?"

T.-"Meriv van bûyeran qet li tu ciyekî dinê nabîne. Li Asya'yê waha tînin serê meriya. Dêma ku talankirin dom dikir, ji pêşya koçê dest bi gulebaranê kirin. Cendirmekî destê xwişka min girt û ew bir. Ez êdî wê rojê nabîrim û naxwazim ji bê bîra min... Naxwazim qala wê roja reş bikim, mirin ji vê baştı e."

Dest havistibûn namûsa xwişka wî, wê şûn ve xwişka xwe nedîtitbû. Li ber çevêن wî bi bivirekî, serê birayê wî yê piçûk birîndar kiribûn. Bavê xwe winda kiriye û êdî nedîtiye. Paşê li serê wî jî dixin û ew bi xwe ve diçe. Pişti du rojan, tê ser xwe, dibîne ku hemû kes kuştine û diya wî jî deverû li cem wî miriye. K bişyar dibe, cinazê birayê wî yê mezin li ser wî bû. Tehleryan bi xwe ling û milê wî birîndar bûne. (Hakim

tîne bîra wî, birîna serê xwe jî dibêje) Eskerê Tirka dest bi qirkirinê kirine û xelqê Ezirganê jî tevi vî karî bûne."

H.-"Qet perê te tunebûn. Bi serê xwe te çikir?"

T.-"Ez çûm gundekî çiyê. Li wir jineka bi sal hebû. Ez sitar kirim. Birînê min ku pakbûn, ji min re gotin ku êdî nikarin min xwedî bikin. Hukumatê qedexe kiribû, kesen ku bi Ermeniyan re bûn, ew gule dikirin."

H.-"Xelqê te, Ermeniyan tu veşartın?"

T.-"Naxêr, Kurdan ez veşartim û parasim."

H.-"Û paşê tu çuyî ku?"

T.-"Kurd merivên gelekî baş bûn... Ji min re gotin ku, here İran'ê. Kincên min yên bi xwîn guhartîn û cilêñ Kurdi li min kirin. Min kincên xwe yên bere şewitand."

H.-"Perê te tunebûn, te bi ci idare kir? Te ci xwar û vexwar?"

T.-"Nanê gilgil."

H.-"Qencbûna birînê te çiqasî kîsand?"

T.-"Qedera bîst roj an mehek."

H.-"Di vê demê de tu li ku mayî, kê tu xwedî kir û xwarin da te?"

T.-"Hinek Kurdêñ din."

H.-"Wan tu çiqasî xwedî kirin? Qirkirin di Heziran 1915'an de bûbû?"

T.-"Qedera du mehan di nav Kurde Dersim'ê de mam. Wê demê du Ermeniyan din jî hatin. Min ji wan bîhist ku li Xarpêt'ê ji qetiliam bûye. Em hersêk ji gundan derbasî çiyan bûn. Hinek rojan me tenê bi xwarina gîhayê idare dikir. Yek ji van herdu hevalan, gîhayê jehrîn xwaribû, di rê de mir. Yê dinê pir bi aqil bû. Digot ku bi vê rê emê bigîhêjin İran'ê û Qafqasya'yê. Me dixwast ku wan gund û çiyan derbas bibin û herin İran'ê. Em bi rojê radiketin û şevan rê diçûn. Bi vî tehrî, çûyina me du mehan dom kir. Em gîhîştin bajarekî. Li wir me eskerê Rûsyâ'yê dît. Cilêñ Kurdi li me, serê me serqot û gîzmê me tunebûn... Em girtin û dan ber pirsan. Hevalê min bi Fransizî

û Ingîlîzî dizanibû. Qala qatliamê kir û serî-binî ji wan re got. Qala xelasbûna min a qetliamê kir. Em berdan...."

Protokol bi vî tehrî dom dike. Tehleryan 1916'a de dizvire tê Ezirgan'ê, perên bavê xwe ku veşartibû derdixe û diçe Ewrûpayê.

Dadstêن -savcî, mûddejûmûmî- paşê li ser têkiliyêñ qirkirinê dipirse.

D.-"Qala qetliama Ezirgan'ê hate kîrin. Gorî ew melümaten ku gihiştine min, kerwan bi mes diçe û pişti ku ji Ezirgan'ê dûr dikevin, di newalekê de Kurdên eşqiya pêşiyê li wan digrin û êrişê tînin ser wan. Di vê êrişê de eskerên Tirkan ji têne kustin. Bira ji bersûc -sanîk- bê pîrsinê, gelo Kurdên eşqiya êriş hanîn ser wan ew qirkirin an na?"

T.-"Ji me re gotin ku cendirman êriş kir.

Parêzker -avukat- tevî gotinê dibe:

P.-"Bi gorî dîtina min, di vê meselê de têkiliyêñ Kurdan wisa dikare bê şirovekirinê: Tirkan ku ev qetliam dihanîne cî, ew dijminêñ Ermeniyan yê kevn, Kurdên çiyayî dikirin cendirme û Ermenî teslimî wan dikirin. Qetliam bi vî tehrî diçû serî.

.....  
3 Hezîran 1921, roja ïnê, serokê juriyê Otto Reînîcke qirarê juriyê dixwîne û Tehleryan bêsûc tê qebûl kîrinê û azad dibe.(21)

Ez bi xwe paşê sala 1971-1974, li Diyarbekir'ê Mehkema Eskeriyê him bûm ku diya gelek hevalen min yên we-latparêz Ermenî bûn. Bala min kişand, wisa dihate xuyanê ku Kurdan keçen Ermeniyan, bi taybetî ji yên xweşik parasine, ew hanîne ser dinê İslâmê û bi wan re zewicîne. Dîsa jî balkêş bû ku, ew jînêñ ku eslê wan Ermenî bûn û min nas dîkir, bûbûn misilmanen tûj û dîndar.

#### Cevkanî:

1. Şemdin Nûrfi ,Bergeh Derg. Sayı.1
2. Yerasimos S. Az Gelişmişlik

Sürecinde Türkiye. C.1,S.383

Georgeon F. Türk Milliyetçiliğinin  
Kökenleri- Yusuf Akçura. S.31

3. Erer T. kürdüllük Meselesi S.20
4. Kutlay N. İttihat-Terakkî ve Kürtler S.33

5. Nûkîfîn. Kürtler S.334

Sasûni Garo. Kürt Ulusal Hare. ve  
Ermeni-Kürt İlişk. S.123

6. Kemal A.M. Çend Rûpel Ji Dîroka  
Gelê Kurd R.46.

7. Sasûni G. A.e. S.122,126

8. Sasûni G. A.e S.124

9. Kutlay N. Wan, Kovara Yekitiya  
Nivîskarêñ Kurd. Hej.4 R.3

10. Kemal M.A. Birinci Dünya savaşı  
Yıllarında Kurdistan ve Ermenî  
Soykırımı. S.63

11. Uras E. Tarihte Ermeniler Ermeni Me-  
selesi, S.281

12. Akşin S. İstanbul Hükumetleri ve  
Millî Mücadele. S.552.

13. Kemal M.A. A.e. S.65

14. Kemal M.A. A.e S.71

15. Beysanoğlu Şevket. Diyarbakır Tar.  
C.2

16. Zurcker E.J. Millî Mücadelede Jon  
Türkler. S.160

17. Şîşir B. Malta Stürgünleri S.46

18. Kutlay N. İtt-Ter. ve Kürtler S.320

19. Major Keneth Mason, Merkezi  
Kurdistan, "Cografya Derg.C. 54. Aralık  
1919. No.6 S .329 -Belge Dr. Kemal  
M.A. A.e.S.63-

20. Kemal M.. A.e. S.76

21. Zaptioğlu Dilek . Cumhuriyet Gaz.  
20-25 Nisan 1993

# TONI MORRISON

---


Mustafa AYDOGAN

**K**arwanê koleyan berê xwe ji Afrikayê da Amerikayê. Pêlên bêrîkirinê bilind bûn, bilind bûn... lê tu carî daneketin. Şopgerin bi saya hêsirä çavan şop gerandin. Çemê hêsirä ber bi Amerikayê diherikî. Kana evînê li dû ma, bêrîkirin û dilekî xemgîn xwe dan tengala karwên. Bayekî xerîb karwan himbêz kir, guvaşt û ji nişka ve berda. Karwên perçê perçê xwe li erdekî nenas danî.

Bapîrên *Morrison* ber bi jiyanekî nû hatin ajotin. Qanûna xwezayê li civatê tetbiq dibû; yên xurt yên qels dipelçiqandin. Di wê pêvajoyê de sedemên paşdemayina Afrikayê veşartî man. Di wê pêvajoyê de şopa kaniyên ku dara zengîtiyê ya Amerikayê avdidan, xuya dibin.

Gelên Afrikayê şiyar bûn, gelên Afrikayê li ber xwe dan. Li Amerikayê koletî resmen rabû û di kûrahiya dirokê de ji xwe re quncikek peyda kir. Lê di dinyaya hevçax de, awayên wê yên cûda destêن xwe yên qirêj ji beskura medeniyetê bernedan. Di çaxa me de ji hewildanêن ku ji bo koletiyê li ser mirovên reşik ferz bikin, wek kabûsekî serê xwe hil dide. Dîskrimînasyona ji ber rengê çermê mirov hûn ji mîna problemeke gelek mezin xuya dibe. Bandêriya mirovên çerm spî hûn ji nehatîye şikandin. Mirov reşik, "mirovê sinifa duyem..." Mirovatî û hêzên hevçax ji bo cirandina vê rûpela reş, di nav hewildanê bêhempa de ne.

*Morrison* nivîskar û ronakbîr, mîna wîcdan û dengê civatê, di berhemên xwe de, dîskrimînasyon, dijîtiyên civatê, karakterê pêvajoya mirovên reşik tê de derbas bûne, hezkirin, hêvi, hêrs û xezeba mirovan bi şiyana xwe ya edebî û estesîkê distirê, dixemilîne û ji nû ve pêşkêşî mirovatiyê dike. Gelek mixabin ku em mîna ji ta'ma xwendina bi Kurdi ya berhemên gelek nivîskarên din ên dinyayê, ji ta'ma xwendina pirtûkên *Morrison* ji bêpar in. Jiyana jînê reşik, ta'de, zulm û dîskrimînasyona ku ew rojane rû be rû dibin... Mijarên pirtûkên *Morrison* ev in. *Morrison* ne tenê dengê jînê reşik e, ew her weha li ser navê mirovatiyê yek ji wan rengên ku ala li hember nijadperestiyê derketinê, dixemilîne ye ji.



Xelatgira Nobelê ya 1993'an Toni Morrison

Malbateke reşikî feqîr ji ber dijwariya jiyanê ji eyaleta "Alabama"yê berê xwe dide eyaleta "Ohio"yê. Sal 1931, 18'ê Sibatê. Li eyaleta "Ohio"yê, li bajarê "Lorain"ê di nav dijwarî û aloziya jiyanê de zarokek tê dinyayê. Zarokek mîna buxçikeke hêviyê di himbêza malbaâ de; *Toni Morrison*. Navê *Toni Morrison* yê esil, *Chloe Anthony Wofford* e. Zaroktiya wê di nava krîzeke gelek mezin de derbas bû. Feqîrî û dîskrimînasyona ji ber rengê çerm, bûyerên ku ew rojane rû be rû dibûn. Lê malbata reşik vê hêviyê mezin dike, dide xwendin û ji bo pêşerojeke ewle hemû taqata xwe mobilize dike. Morrison pişî xwendina liseyê, li *Washington*ê dest bi *Universiteya Howardê* dike. Ji xwe di wê demê de bi tenê reşikan li wê unîversiteyê dixwendin. Di sala 1957'an de jî li wê unîversiteyê dest bi mamostetiya zimanê Ingilîzî dike. di wê demê de mimarê Jamaïkî *Harold Morrison* nas dike û pişî demekê pê re dizewice. Ji xwe paşnavê xwe yê nivîskariyê ji ji mîrê xwe stendiye.

*Morrison* ji destpêkê de bi zimên û edebiyatê ve mijûl dibû, lê di warê romannivîsê de cara yekem di sala 1970'yî de bi berhema ku navê wê "*Çavêن Herî Şîn*" ve derket pêsiya xwendevanan. Ev roman mijara xwe ji çîrokeke wê ya ku di sala 1960'î de hatîbû nivîsandin, werdigre. Çavên şîn û porêñ zer nişanên xweşîkbûnê dihatin hesibandin. Ji ber vê yekê, keçeye reşik ji bo xweşiktir bibe, xwe davêt xwedê û jê daxwaza

çavên şîn dikir.

Piştî "Çavên Herî" Şîn, bi romana "Sula" (1973) meydana edebiyatê, rengîntir dibe. Roman li ser bingeha qedera sê nifşen jinan -di navbera salên 1919 û 1965'an de-hatiye avakirin. Bi saya vê berhemê, xwendevanên Morrison bi qedera jînê reşik re, raste-rast rû be rû dibin û rastî şahidiya pêvajoyeke dîrokî tê.

Sal 1977, romanek bi navê "Strana Soiomon" deriyê çapxaneyê dide ali û berê xwe dide pirtükfiroşan. Ev romana Morrison bi xusûsiyeteke xwe, ji hemû romanên wê yên din cihê ye. Ji ber ku di hemû romanên wê de qehrâman jin in, lê di vê romanê de mér e. Roman li ser bingeha jiyana mîrekî reşik ku dixwaze pêvajoya xwe ya koletiyê ji bir bike û huwiyyeteke nû bi dest bixe, hatiye avakirin. Xeyalên reşikekî û hewildanên wî yên ji bo destpêkirina jiyaneke nû... Ev roman di demeke kurt de, bi saya wergêran bi gelek zimanân hat xwendin. Bi "Strana Solomon" di civatê de munaqeşeyeke pirrhêl dest pê kir.

Sal 1981 û "Bûka reş i qîr"; mijareke evînê. Evîna "Jadine" ya xweşik û jîr...

Sal 1987, romana bi xelat, "Beloved". Morrison di "Beloved" de drama jinika reşik ya ku ji keça xwe pirr hez dike û ji ber vê yekê jî ji bo ew mîna koleyekê nejî û azabê ji ber vê jiyanê nekişîne, wê dikuje, radixe ber çavan. Tesîrên vê bûyerê li ser jinika ku keça xwe dikuje, bi salan dom dike. "Beloved" di sala 1987'an de Xelata Pulitzer werdi-gre û rîya hilkişandina ber bi bandeva edebiyatê bêtir rohnî dibe.

Sal 1992 romana "Jazz". Drameke bê qehrâman, dramek ku bi tenê qurban tê de hene. Jîyanek ku ji tarîtiya sedsala 18'hem, ji erdên pembo yên başûrê welêt xwe dighîne Newyorka 1920'an, taxên reşikan...

Sal 1993, "Xelata Nobel ya Edebiyatê" û Morrison pijaka hêviyê...

Morrison jinek 62 salî, li "Universiteya Princeton" ê profesorê edebiyatê, dêya sê zarokan û kedeck bi xelata Nobel ve xemilandî...

Bapîrên wê ji Afrikayê hatin. Ew mîna Afro-Amerîkanekê mezin bû û nuha di dinyayê de Amerîkayê temsil dike.

Lêkolinerê edebiyatê û rexnegir "Clayton Riley" ê li "New York Times" ê dixebite, weha dibêje: "Em bi saya Xelata Nobel dikarin ji dinyayê re weha bibêjin, binihêrin! Li vira jineke reşik heye, jineke reşik ku Amerîka bi çavêن xwe ditiye."

Hêzên nîjadperest xelatwergirtina jineke reşik hezîn nakin, lê pirraniya otorîteyên edebiyatê li hember hêjaiya berhemên pijaka derd û kulên civaka reşik, ewrên reş yên xwe bera ser pêşeroja wan didin, hêvî û daxwazên wan, serê xwe tewandin û dan diyar-kirin ku Xelata Nobel di deriyê ku diviyabû lêbixista re derbasî hundur bûye.

Morrison piştî imtihaneke mezin ev xelat heq kir. Îsal raqîbên wê, nivîskarên gelek navdar bûn: Ji Amerîkayê Thomas pynchon û joyce Carol Dates, ji Brîtanayê V.S. Naipaul û Doris Lessing, ji İrlandayê Seamus Heaney, ji Belçikayê Hugo Claus, ji Kanadayê Margaret Atwood, ji Fransayê Marquerite Duras û Nathalie Sarraute û ji welatê Çekan ji Milan Kundera yên ku ji bo xelata îsal, heta dawiyê li ser wan dibatin munaqeş kirin, bûn.

Ji sala 1901'ê û vir de bi tenê 7 jinan Xelata Nobel wergirtine; Selma Lagerlöf, Grazia Deledda, Sigrid Unset, Pearl S. Buck, Gabriella Mistral, Helly Sachs û Nadine Gordimer. Jina 8'an ji Toni Morrison e.

Xelatwergirtina Morrison di warê hewildanên ji bo şikandina tehakkuma mîran ya di warê Xelata Nobel de, gaveke ber bi pêş de ye; ji bo nîjadperestan derbeke mezin e û ji bo ji nîjadperestinê rizgarkirina mirovatiyê ji imkaneke xurt û nuh e.

# HÊVÎ, NAZAN MEKE

EZ RADIZÊM

Ali BÎÇER

îşev heyy nîn e  
her saniyê zelzeleyeke nû  
çar aliyên min hilweşiyayî  
ez xwe li tariyê diqelibînim  
desten min agir  
zimanê min lêvên min  
sirgûnê bêpayan ê evînê  
ro di tariyê de veşartî  
jin di tariyê de di coşa hezkirinê de  
di tariyê de  
zarok têr dinê  
bi qîreqîr  
serfildan  
hêvî nazan meke  
were bi min re bikeve rê  
şer ji zû ve dest pê kiriye  
sewda pekiya hundir ji deriyê dilê me  
were bi min re bikeve rê  
hêvî  
êdî hew bisekine

1

ez serê xwe dixim bin baskên xwe  
mîna çivîkekê radizêm  
tirsîiyayî dil di dêv de

ez serê xwe dixim bin baskên xwe  
mîna teyrekî elo radizêm  
hişyar, dilxurt

bêyî ku ez serê xwe têxim bin baskên  
xwe  
mîna hespekî rewan radizêm  
seglavî, her li piyan  
mîna darekê  
serê xwe datînim ser şinahiyê radizêm  
di hembêza şevê de  
hem bi piranî, hem bi serê xwe

mîna çiyayekî ez xwe dirêjî xewê  
dikim  
çavên min dibin gopik  
ber bi esmanan hilkişiyayî û vekirî  
stîrkan radimûsim

2

di nav zinarê nedîyar de  
mahrekî reş im ez  
xwe li jahriya xwe dipêcim û radizêm  
hêviya birîndar bedena nîvçe  
welatê min ê perçekirî perçiqî

li dûr

danê êvarê

dengekî zîz ê jinekê

bi ûsil li ser êş û janên min dinehwire  
welê xwe radipêçim radizêm li ser  
bedena xwe

ez radizêm

di xewna min de xewna wê jinikê

du girên serî bi berf li nik hev têr

destê min

bêpayan spî, bêpayan nerm

û tûrêja yekemîn a rojeke nû

kena wê jinikê

dikevin ser bahâlfa min

ez radizêm xewa xweşirîn a xewan

gava ez ji stérkekê derbasî stérkekê

dibim

dikevim ber sewdayeke nû

di cîhê ku ez xwe

li azadiyê digirim

govenda dûpişkan dest pê dike

birînên nîze û şilfan

qîrîna jinan

lêkirina bajaran

xwe di xêzên min de vediqûnin

li pey

daxwazeke kûr û bêpayan dimîne

ez tevî çîrok û destanan dibim

2.ilon.91

Wergera ji tirkî: M. Uzun

## MIRINA XEWÊ

danê êvarekê bêyî te

hundirê min valabiya newalê

portra min wêneya tenêtiyê

ba û bahoza hecresikan dikeve

nav stranê min

di xaçeriyyê mîjiyê min de

xwençeyênen xewnan bêhejmar

wekhevî kîjan aliyê newalê

ez huwiyyeta xwe bidim qebûlkirin

de bibêjin

kî dê zarokiya min aş bike

Ali Biçer di sala 1960'ı de li gundekî Yozgatê hatiye dînyayê. Li gorî qanûna Cumhûriyeta Tirkîyeyê madeya 125' an cezayê muebedê lê hatiye birîn. Ew ji sala 1981'ê vir de di girtîgehêne Tirkîyeyê de radizê.

Heta niha du pirtûkên wî yêñ helbestan bi tirkî derketine. Pirtûka pêşî bi navê "Newroz Çîçekleri" 1990 û "Gül Söylem" 1993' an derketine.

Şâîrê me hê jî di girtîgehê de ye. Bi hêviya ku ew ê girtîgehê mîna dibista-nekê bi kar bîne û hêdî hêdî bi zimanê dayika xwe, bi kurdfî binivîsîne, em çend helbesten wî bi wergera kurdfî diweşînîn.

# ZIMANNAS Û FÎLOSOF MEKSÎMÊ HEMO

Husêن HEBEŞ



**H**eta niha tu zimannasan wa bi xurtî li ser idyoma di zimanê kurdî de lêkolîn nekirine, profesor *Meksîmê Hemo*, di vî warî de lêgerê yekemîn e.

Beri ez li ser berbema wî "BINGEHÊN İDYOMÊ DI ZIMANÊ KURDÎ DE" rawestim, divê ez çend rêzan li ser jînenigariya mamotoe binivîsinim.

*Meksîmê Hemo* di sala 1934 an de li gundê Çabanmazê, li Ermenîstanê hatiye dinyayê. Ew di sala 1954 an de, pişti xwendinên dibistanî, li zanîngeha Êrêvanê wek xwendevan tê qebûl kirin, li wir pênc salan dixwîne û di sala 1959 an de ew dibe derketiyê fakulteya gêrmanistaniyê. Her di wê salê de jî li enstîtuya Rojhelatnasiyê, li Leningradê wek espirant (xwendevanê doktora) tê pejirandin.

*Meksîmê Hemo* di bin serkariya mamotoa *Qanatê Kurdo* de bi serbilindî lêkolîna xwe li ser zimanê kurdî, di bin navnîşana "Diyalekta Badînanî ya kurdên iraqê" di sala 1965 an kuta dike, titila doktorê zanistiyên filologî werdigire û li enstîtuya Rojhelatnasiyê di pişka kurdî de li Êrêvanê wek hevkarekî zanistî yê biçûk, paşê jî weke yê mezin dixebite.

Ji bîli xebata lêgerînên zanistî *M. Hemo* di warê perwerdeyî de jî çalk e; wî li gel hevbîrina di sala 1958 an de dibistana kurdî li bajarê Êrêvanê vekir, ew bernama hînkirina zimanê kurdî di dibistanê cuda de dinivîsîne û bi xwe jî li zanîngeha Êrêvanê dibe mamotoyê zimanê kurdî. Di konferansên netewî û navnetewî yêni li ser ziman pêk dibatin, *M. Hemo* tê de pişkar dar dibû. Berhemine wî bi zimanê kurdî, rûsi, ermenî û îngilîzî belav bûne, herweha ew bi wan ziman an jî dizane. Ew bi farisî dixwîne, bi

dirêjahiya salan ve xwe bi zimanên *ûrartû* û *hîtî* ve mijûl dike. Ew niha li *Êrêvanê* diji. Ez ê li dawiya vê nivîsarê, berhemên lêkolîner yên sereke nîşan bidim.

Nêzîkî sih salî ye ku *Meksimê Hemo* xwe bi zimanê mader ve mijûl dike, ev bûye qedera wî; pirraniya xebatên wî li ser idyome ye. Di sala 1989 an de *zimannasê* me karekî mezin pêşkêşî *enstituya zimannasiyê*, li Moskovayê dike û li ser wê xebatê ew titîa doktoriyê a duhem di zanistîyên filologi de werdigire.

Tevî ku li ser karekî wilo payebilind bi kurdînivîsin ne ewçend hêsa ye jî, ku ji zara-vayan<sup>(1)</sup> mişt e, mixabin hîn zimanê netewî jar e di wê babetê de, lê ez ci bikim va du sal di ser soza min re bîhurtin û hevwelatiyekî min i jîrtir jî ez ji vê astengê rizgar nekirim, ez neçar bûm xwe tevê kim û ji milekî din "herçend zimanê me tête nivîsandin ewçend jî fireh û dewlemend dibe û pêş ve diçe" - çawa mamostê me Celadet Bedirxan dibêje -, ew zaravên zimanasiyê yên haya min jê hebûn min bi kar anîn, lê ew samana  
heyîndar bes nedî-kir, di nav xebatê de nûbêje peyda kirin jî armanc bû".

Di destpêka lêgerîna xwe de nivîsevan me haydar dike, ku ne kêm lêkolîn li ser idiomê bûne, lê li gor raya mamoste hîn negîhiştine peyîska (dereca) têkûziyê. Ew hewl dide ku çarena ji kîmasiyên ku di wê mecalê de hene, bibîne û li ser binçîna zimanê kurdî teoriya idiomê di zimannasiyê de dewlemend bike.

Cara yekê pîrs-girêka idiomê di kurdînasiyê de serê xwe radike, gava guhertinên gramatîkî di bêjeyan û di danîna ferhengan de dibûn; wê yekê hişt ku sînorêng ferhengî û gramatîkî di navbe-



ra bêjehevgitinên pihêt de bêne diyar kirin, ew rûdava xurtir dibe dema M. Hemo li ser ferhenga xwe a idiomî ( Kurdsko-Rûsskî frazeologîçeskî slovar) dixebite. Ferhengyan ji me re aşkere dike ku bi derketina wê xebatê kêşayê teorf yên idiomê hîn zelal nebûne, ew dibîne ku: Diyarkirina heyîna idyoma kurdi wek şaxeke serbixwe di ziman de û lêkolîn li ser bi awakî sistematiç bala kurdnasan bi ser xwe ve ranekişandibû. r. 3) loma ji ev lêgerîna bo çarelêkirina wê pirsgirêkê ye.

Çi bûn di van salêن xebata zanisû dûr û dirêj de pirsgirêkên idiomê ji zimannas M. Hemo re? Ew ci valahiya zanisû di idyoma netewî de dibîne û herweha li tengâ lêkolînên navnetewî ci kîmanî di teoriya idiomê de hene?

Filosof û zimannas xwe daye ber kêşyine mezin û bi armanca serencamandina van mijadêñ jêrin lêkoliye:

- Mijad û sînorêن pirsgirêkên idyoma netewî
- Metodêن lêgerînê li ser materyalêن idiomê
- Qanûnkirina peydabûna idiomê
- Erk û geşbûna wê
- Taybetvaniyêن navxweyî yên berpabûna idiomê li ser tengêن cuda
- Pêwendiyêن sistemî di idiomê de
- Pêwendiyêن idiomê bi lêksika û bi sinteks (hevoksazî) re û htd...

## GIRÎNGIYA LÊKOLINÊN (AKTUALİTÊT)

Çar�êkirina pirsgirêkên li jor bi navkirî bi wê yekê ve girêdayî ye ku hîmê wê baş bê diyar kirin û ew bi pêş de here û ew were tesbît kirin wek şaxeke serbixwe di teoriya zimanê kurdi de.

Rola vê lêgerînê di şirovekirina pirsgirêkên lêksikologî, morfologî û herweha bona danîna ferheng û pirtükên xwendinê û bingehdanîna teoriya wergerandinê de mezin e.

Lêger di destpêkê de li ser wê rayê bû ku ew rîbazan (metodêñ) zanistî di warê idiomê de yên di zimanê din de bi kar hatine ê bi kîrî lêkolîna idyoma kurdi jî bêñ, lê di prosesa têgihîştin û pişkaftina (analîza) materyalan de hat diyar kirin ku ne yek ji wan rîbazan bi kîrî idyoma kurdi tê, ( r. 4 ). Zimannas hewl dide ku bersiva vê pirsê: Ma yekîneya idiomî ci ye? Ci mana wê heye? Ew di lêgerînê de dibe maka filosofi û zanistîye .

Teorîvan aşkere dike ku hoyâ peydabûna pênasînê cuda li ser yekîneyen idiomî di zanistîye de vedigere ser wê yekê ku ew bi temamî nehatiye lêkolandin, loma ew ji wan rîbaz û teoriyênen heyîndar xwe bi dûr dixne û li ser riya xwe a "hemoyî" dere û bi mînayêñ konkrêt wê dibelgehîne.

## BINGEHÊN METODOLOGÎ Û TEORÎ

Di vê xebatê de M. Hemo rîbaza vebjartinê daniye bona pişkaftina bêjehevgitinên pihêt û "naznaçêniye" (diyarîkirina)(2) wan bi armanca ku ew rajeyê di sistem û sazbûna zimanî de dike bi sê taybetvaniyan numa dibin:

- a) Tevgelemerî, ew di peydabûna hêmû zimanînan de yek e
- b) Gelemerî, ev. ~~ni~~ peydabûna çend zimanînan de yek e
- c) Tekayî (individuel), ew tenê di ~~zimanekî~~ de peyda dibe.

Ev hersê taybetvaniyî bersivîn sê pirsyarêñ cuda di surişt û strûkûra sêmentû(3) ya

peydabûna bêjehev giltinê pihêt didin; ew pirsyarina bi vî awayî ne:

Ew ji ci peyda bûne (karektera materyalan) Ew ci vedirijîne yan ci maneyê dide (karektera realizmê) û çawa ew vediřejne/ xweseriya verêjê/ û li ser wê esasê ci ye karektera peydabûna wê.

Bi vî terzî zarava diyarkirinê bi du planan di xebatê de bi kar tê: Diyarkirin wek serencama hemû nîşanên taybeti yên yekîneya zimanî tevî armanca ku ew di sistemê de râjeyê dike û diyarkirin wek pişkaftin bi diyarfkirinê wek rîbaz.

Wê rîbazê zimannas di lêgerîna xwe de bi mercdarî rîbaza sosyal - lingwîstî dinavîne.

Ta bingehêñ zanisî bona pişkaftina yekîneyen idiomî bi hêz bike, ew rîbaza DIY-AXRONI<sup>(4)</sup> bi kar tîne, da ku yekîneyen idiomî ji aliyê dîrokî ve û li ser binyatêñ pişkaftina zaran (diyalektan) di qonaxêñ ciyawaz de bêñ lêkolandin.

## GIRÎNGIYA TEORÎ, ZANISTÎ Û PRATIKÎ YA VÊ LÊGERÎNÊ

Bingehêñ vê xebatê di pêşgotinebenda fêrhengvan de ya bona "Kurdsko - Rûsski frôzeologîçeskî slovar" nîvisandî hatine diyarkirin, ew bingehina di berhemên din de jî yên lêgervâ xweva dibin. Herweha ew rîber in, ji zimannasên kurd, ermen, faris, rûs û yên din re, ew wan bi kar tînin, (r.9).

### NAVEROKA LÊGERÎNÊ

Ji bili pêşûpaşgotinê ev lêgerîna profesor M. Hemo ji heft pişkan pêkhatiye. Ez ê hewl bidim bi kurtî û hêvî dikim karibim naveroka wê bi emanet nîşan bidim û di cihnan de bi serbesû wergerînim.

Bergeh û sînorêñ idiomâ zimanê kurdî dibe behra pişka yekê. Ew ji sê şaxan peyda dibe, di vir de maka serekîn, nasîna mijada idiomê û rîbaza lêkolîna wê tê nîşandan.

Bona bêjehev giltinê pihêt û cudatîpêñ wan di zimên de bêne danîn, divê ew ji yekîneyen morfologî û sînteksi bêne bi dûr xistin. Li gor serencama pişkaftina bêjehev giltinê pihêt û hevgirtina yekîneyen wan yên cudatîp ji aliyêñ morfologî û sînteksi de bi saya rîbaza diyarkirinê çend taybetvaniyên wan hatine tesbîlkirin, ku ew xweserên sazbûna zimên nîşan didin (r. 15) û bi morfologî û sîntekse ve têñ girêdan (ew taybetvani li jor hatin xuya kirin).

Bêjehev giltinê pihêt li gor xesyetên heybera materyalan parveyî ser du birran dibin:

a) Ew bêjehev giltinê pihêt ku bi heybera materyalan wan hevgirêdana lêksêman saz dîkin wek: "Çû ba pêşıya,"

b) Ew bêjehev giltinê pihêt ku bi heybera materyalêñ wan bêjeyêñ real peyda dibin wek: "Berê êvarê."

Li gor taybetvaniya sêmentêmên peydabûyi, bêjehev giltinê pihêt parveyî ser van tofan dibin:

a) Bêjehev giltinê pihêt yên konsêptekê (mefhomekê) didin wek: "Kirin tomikê" : kirin pergaleke xerab.

b) Bêjehev giltinê pihêt yên maneya serencam didin, wek: "Cînarê xêr ji birakê bêxêr çêtir e"

c) Bêjehev giltinê pihêt yên bi xwe sêmantêmên sînteksi ne, wek: "Rojekê ji roja."

Pişti vê ravakirinê mamoste du taybetvaniyên gelempar yên bêjehev giltinê pihêt

şanî dike: Pihêti û peyabûna ji hev cuda a hundirî.

Ew xesjeta wan ya gelempir bi vî rengî diyar dike: Bêjehevgirtinêñ pihêt yekîneyên zimên in û bi organizasyona xwe di hevokan de pihêti ne. Peydabûna ji hev cuda a hundirî li ser tengä yekbûna mana du an sê bêjeyan (yên hinan) bêjehevgirtinêñ pihêt in, an bêjeyêñ real in, (yên din) bendewar in bi xisyeta sêmantêmî ve û bi vî rengî numa dibin:

- 1) Dijwariya têgihîştinê yên hin bêjehevgirtinêñ pihêt
- 2) Serencam
- 3) Yekbûyina çend maneyan.

Bi vî rengî M. *Hemo* bêjehevgirtinêñ pihêt dinasîne û li ber ronabiya teoriya diyarkirinê ya wî cara yekê di zimanê kurdi de bi kar anî ye. Zimannas bêjehevgirtinêñ pihêt di zimanê kurdi de parveyî ser çar birran dike:

- a) Bêjehevgirtinêñ pihêt yên ku diyarkirina wan idiomî ne, ew wek keresteyan zanînê tên fêhm kirin, wek "Ava bi kayê" û hwd...
- b) Bêjehevgirtinêñ yên bi heyîna xwe cotanî ne, ku ew rajeya hişmendî û hînbûna rastiyen qanûnêni jiyana civakî dikan, we: "Şêr şêr e, çi jîn e çi mîr e", "Mala zêra xirab dibe, mala mîra xirab nabe" û hwd...
- c) Derbirinêñ pihêt yên bi pêşûpaşgotinan di berhemvaniya gelêri a devkî de tên, wek "Carek ji caran, rehme li dê û bavê hazir û guhdara", "Ew gîhîştine mirazê xwe, hûn jî bigihêñ mirazê xwe" û hwd...
- ç) Hevgirtinêñ sînteksi, wek "Te'irî kete erdê", "Ro hate nîvro".

Meksimê Hemo di vê pişkê de berdewam dibe û bi hûrî li ser sazûberpabûna yekîneyên idiomî dikole.

Pişka duyemûn bi "Struktûr û tipologiya sêmentî ya yekîneyên idiomî" dest pê dike.

Rêbaza pişkaftina yekîneyên idiomî bi saya diyarkirina hêst û li gor diyarkirina wan ku modêla peydabûn û formên wê yên cuda bêñ aşkere kirin, herweha ew klasifikasiyonê ( li ser idiomê hatine cara yekê mamoste di vê lêgerinê de materyalên zimanê kurdi bi kar anîye û bi gotineke din di vê klasifikasiyonê de struktûr û sêmentiya modelên yekîneyên idiomî bi zelalî ji hevdu hatine sînordar kirin. (bin. r, 25).

Lêgervan du modelên ji hev cuda aşkere dike, ku ew yekîneyên idiomî yên bi struktûra xwe bêjehevgirtin in û yekîneyên idiomî yên bi struktûra xwe hevok in.

## İDYOMA COTANÎ

Ew bi van taybetvaniyan diyar dibin:

a) Ew bêjeyêñ sazbûyi çawa sêmentêm tên şanî kirin, mîna sêmantêmîñ idiomî yên xizmayetiyyê, wek "Dêbav"...

b) Mercen yekbûyina perçen bêjeyêñ çêbûyi tek in ji aliyê sêmantî û sînteksi de, lê ji aliyê morfologi de cuda ne. Divê bê gotin ku gîhaneka "o" di bêjeyêñ sînteksi de wan bi hev ve dibestin.

c) Mînayne hevpêwendiyêñ sêmentî yên hêmanêñ bêjeyêñ cotanî ev in: "Virûderew", "Ba-bagerr", "Şev-ro" û hwd...

ç) Tretiba cihdanîna hêmanêñ hevgirtî berî her tişî bi qeydên awazî (annotation) û bi hêzî (internation) ve girêdayî ye, li vir hêz rola xwe dilîze.

1 - İdyomên dubareyi, ew bi van derbirinâñ diyar dibin, wek "Sirê-sirê" (yanî li dû hevdu), "Nav-mav" û hwd... Herweha bêjeyêñ li hevanîm jî dikevin bin vê xanê, wek :" Nan-man", "Kevir-mevir", "Xan-man" û hwd... Mamoste bayex û cihen van core idyoman di zimên de şirove dike û wa pêşan dide: Di nav struktur û tipen sêmentî

yên yekîneyên idiomî de, ev coreyên jêrîn ji yên din belavtir in:

2- Yekîneyên idiomî yên vegetandeki.

Ew bi saya tewandina navdêran peyda dibil, wek "Konê pîrê", ( bi mana mala bûlendirê: pirokê; pindepîr; celceloke, tevinpîrik tê) "Rebêne dêra" û hwd...

3 - Îdyomên qedexeyî, nezaketî euphemism(s) û bênezaketî.

Ew îdyomên bi rengê cihnâvên ( pronom) girêkî (pêgel, geyner) teví rengdêran ( pirr kêm bê navdêr) yan bi dema borî nêzîk ve girêdayî, parveyî ser sê birran dibil:

a) Nezaketî, gava mirov naxwaze yekser navê tiştekî yan kirdeyekê bêje, mirov hewl dide bi nezaket, bi nermû nîşan bide: "Ya te'il" wa tê fehm kirin ku Vodka tê xwes-tin, "Ya deng" (yanê dabانچe ye) û hwd...

b) Îdyomên qedexekirî, mîna "Yê sor" (nexweşıya sorika)...

c) Peydabûna îdyomên bênezakeşî vediger ser wê pêwîstiyê ku mirov naxwaze rastiy-ekê aşkere bêje, mirov neçar dibe di dorê re hilpeke û li şûna mirov bêje: "Tu dîn ï", mirov ê bi îdyomekê wa bibêje" Yê cin"...

4) Îdyomên hevberkirî, pişti ku mamoste egera (boya) peydabûna wan nîşan dide, paşê nimûneyina raber dike, ku yekîneyên idiomî yên hevberkirî weha ne: "Mîna masiyê av li ser bê blîrrînê", "Mîna şûrê dudev" û hwd...

5) Îdyomên daçekî û hokerî, ew bêjehev-girtinê pihêt yên di vê xebatê de wa nivandi-ne bi van derbirrînan têr diyarkirin. "Bi dilê sax", "Bi serê poz" û hwd...

6 - Îdyomên bi materyalêñ bi strukturêñ xwe neerêni ne.

Ew ne tenê di bêjehev-girtinê pihêt de têr dîtin, lê belê ew di strukturêñ hevokêñ îdyomî de jî hene: "Ne didrû, ne dibişkêve", "Ne İsa lê dibe xweyî, ne Mûsa" û hwd...

7 - Îdyomên temamkirî ( predicative) yên bi strukturêñ xwe bêjehev-girtinî ne.

Ew core îdyomên parveyî ser temamkerêñ navdêri, lêkerî dibil, îdyomên birra yekê: "Bi serê xwe ye", "Ser emrane" yanê pîr e, û hwd...

Birra din bi du corêñ ciyawaz numa dibil:

1 - Îdyomên temamkerî yên obyekti:

a) Îdyomên bi strukturêñ xwe jihevenekirî, wek "Zeng girtin", "Xwe wenda kirin"...

b) Îdyomên bi strukturêñ xwe jihevekirî, wek "Dû maça filankesê ketin", "Ber pozê filankesê sekînîn"...

2 - Îdyomên lêkerî û navdêri

Ew ji van lêkeran peyda dibil: Avîtin, anîn, dan, kirin, êxistin, rakirin, birin, gihan-din, bûn, cûn, hatin, rabûn, gibîştin: "Avêtin avê", "Ketin gorre" û hwd...

7 - Îdyomên ku bi strukturêñ xwe baneşanî ne.

Îdyomên vê tûpê pircoreyî ne, ew parveyî ser pirrişkan dibil, ew derbirrînen sondxwer in, xweziyê, nifiran û yên din nîşan didin: "Vir mala Xwedê ye", "Qîra qirrikê be" (bimir) û hwd...

8 - Îdyomên bi strukturêñ xwe hevoki ne

Ew wek "Kirasê filankesê kin e", (Wa kêmaqil e), "Çavêñ filankesê qol in" (pirr çekûs e); "Xwedê tev şuxulê filankesê be"...

DI PIŞKA SÊHEM de M. Hemo li ser gramera yekîneyên idiomî dikoline. Pişti pişkaftinan ew dighîne vê serencemê ku ew heşt tûp in:

1) Navdêri, wek "Maka nodik nod ce'inuyî", yanî jina xwedî zaroyêñ pirr.

2) Rengdêri, wek "Perda ber çavê filankesê tune".

3) Hokerî, wek "Şev û ro".

4) Temamkerî, wek "Rabûn ser xwe".

- 5) Modêli, wek "Bextê te'iel re"
- 6) Baneşanî, wek "Xatirê Xwedê!"
- 7) Daçekî (pêrbesti), wek "Bi alikariya filanesê"
- 8) Gihanekç, wek "Ser vê yekê ku".

PIŞKA ÇARÊ pêşkêşî gubertinên dîrokî ye (dichro) yên yekîneyên idiomî ye. Cara yekê M. *Hemo* li ser materyalên kurdi tipologiya strukturên sêmantêmî ya yekîneyên idiomî dipişkuvîne û ew van tofan (grûp) tê de dibîne.

1) İdyomên nûduristbûyî, wek "Osa hêrs ket, ro hate nîveka esmên", "Nexwêş çavê xwe venake". derbirrînên weha têne bi kar anûn li cihêن ku ew cara yekê lê peydabûnê, ew tenê bi maneyekê bi kar tê.

2) İdyomên xwegirtî, (xweisbatkirî), ew yekînena serbest in, ew jî ji idiomên zimên re pîr girîng in, wek "Xwe dan mala metê", "Ber xwe dan"...

3) Tofa sisiyê ew yekîneyên idiomî yên li ber mirinê ne, ew ihtiyatên nepenî ne (passiv) di idyoma zimên de, wek "Heram-odesî" "Teyrê Dewletê"... Ew her di berhemvaniya gelêri a devkî de hene.

Cudaşewê û cudamaneyên polysemy<sup>(7)</sup> yekîneyên idiomî di sistêma idyoma zimên de pirbelav in, ew dibine behra

PIŞKA PÊNCA; di vê lêgerînê de.

Marnoste nimûneyên cudaşeweyan pêşan dide ku ew bi vî rengî ne: "Devê xwe nadê", eger vê idiomê bi bi hember vê " Nade devê xwe" din, tê dîtin ku cudayî heye. Herweha di van hersê nimûneyên jêr de jî weha ye: "Ketin înkê", "Ketin rikê". Hûn hele bala xwe bi van mînayan din: "Ji zar-ziman ketin", "Zar ketin", "Ji zar-ziman çûn".

Lêgervan deh tîpan ji wan cudaşeweyan di xebata xwe de nîşan dide. Li ser idiomên cudamane xwendevan rastî vê idyoma bedew tê: "Mîna bûkeke rû bi xêlî" ku ew weha tê şirovekirin:

1) ew pîr ciwan e, 2) Pirr hêmin e, bê deng e, 3) Pirr xwedîqedir e. Mînayne din di vir de hene û bi hûrî li ser tê xeberdan.

PIŞKA ŞEŞÊ terxanî van mijadên jêrî ye: İdyoma zimên bi awakî gelempar, zarên wî û karekteristika stilistiya yekîneyên idiomî. Çawa hatiye işbat kirin ku yekîneyên idiomî parveyî ser du tofan dibin (bin: r.41) her di vir de jî li ser mijadetofên yekîneyên idiomî, ciyok (hevmane), dijrabefî (antonym) û hevtîpnivîs (homonym) tê lêkolandin.

DI PIŞKA HEFT ê û a dawiyê de xwendevan lêhûrbûna li ser bêjesaziyê (derivation) dibîne ku ew jêdereke girîng e bona dewlmendkirina zimên. Bêjesaziya idiomî hatiye nasîn ku ew belavkereke taybetî ye ji sinteksa bêjesaziyê re.

Di vê pişkê de jî hoyâ durustbûna idyoman hatiye xuya kirin û herweha taybetvanîyen bêjeyên nûsazbûyî.

Lêgervan M. *Hemo* di serencamê de encamên serekîn ji lêkolîna bi salan liberxwendayî li ser idyoma zimanê kurdi û rewşa wî di hevdema me de nîşan dide.

Min hewl da ku ez bi kurfi vî karê mezin di dîroka zîmannasiya kurdi de bi xwendevanan bidime nasîn. Ez hêvî dikim ku ew bi zimanê me bikeve nav destêni pispor û xwendevanan ta gelê me jê sûd werbigire. Bê guman niha pîr sînor hatine cirrandin û pîr jî hatine ava kirin, lê ew yeka ji bo geşkirina edebiyata kurdi û lêkolînên zanistî hêmaneke erêni ye; mîrov kare bi serbesî bilîve û weşanên kurdi û yên bi zimanên din li ser kurdan bi hêsanî bi dest bixîne; min pîr dixwest ku nimûnen lêkolîna profesor Maksîmê *Hemo* ji hemû edebiyata kurdi ba, ne pirraniya wê ji berhemvaniya kurdêni li Ermenistanê û yên din ba.

Lêkolîna M. Hemo layiqî her pesnekî ye, karekî wilo ji her dilsozekî re cibê serfi-raziyê ye, Profesorekî biyanî li ser vê lêgerînê weha gotibû: "Eger mîjiyên wek yê Meksîmê Hemo di nava kurdan de hebin, mirov ji pişkaftina gelê kurd natirse".

## LÎSTA BEHEMÊN MEKSÎMÊ HEMO

Encama 28 salan ya xebata zanistî ya M. Hemo bêtirî 60 lêgerînan e. Ji van bêtirî pêncî belav bûne. Heft ji wan mîna pirtûkan belav bûne. Ez ê li vir navêñ pirtûkan binivîsinim:

- 1 - Kurdsko-Rûskî frazeologîçeskî slovar. Erevan, 1979.
- 2 - Yêzik baxdinanskîx kurдов iranskovov Kurdistanâ. V "Stranî i narodî blîjnêvo i srêdnêvo vostoka, VII Kurdovedenyê Erevan, 1975.
- 3 - Oçerk imenoy frazeologî kurdskova yêzika, EGY, Erevan, 1971.
- 4 - Kurdski yêzik i literatûra dlya çasixsa II-VIII klass srêdnêy şkoli, Erevan, 1990.
- 5 - Osnovâ frazeologî kurdskovo yêzika. Erevan, 1989.
- 6 - Kurdskaia diyaléktologiya.
- 7 - Kurdskaia paremiologiâ.

## ŞANEK:

1 - Zarav bi mana "terminus" a laşnî hatiye bi kar anîn, ez li ser zaravdanîna Korf Zanyarî Kurd û li ber ronahiya kovara Perwerde û Zanist çûme, ku wan herdu dezgeyan di salêñ 70'ê de zaravêñ zanistiyêñ cuda belav kirine.

- 2 - Naznaçeniyê, peyveke rûsî ye.
- 3 - Sêmantisî (Sêmantîkos-yunanî ye, nîşandayî). Bireke lingwîstiyê ye, ya bi girîngiyêñ nîşanêñ zimêñ ve mijûlî dibe.
- 4 - Diyaxromî (yunanî ye, dia: di nav re, chronos:dem) Ew guhertinêñ di zimêñ de bûne li gor qonaxêñ dîrokî.
- 5 - Lêksêm (yunanî ye lexis, rûsiya wê lêksêma:bêje, derbirîn) Ew yekîneya ferhengî ye ya serencama hemû hevlinapewendiyêñ rûxsarı (form) bêjeyan diyar dike.
- 6 - Euphemism (yunanî ye) min hevmanâ nezaket jê re danî.
- 7 - Polysemy (yunanî ye, poly: ptr, sema: nîşan) Pirrmane, cudamane.

# GOTÛBÊJEK BI YEKÎTIYA NIVÎSKARÊN KURD ŞAXÊ DUHOKÊ RE

Mehfûz MAYÎ



Ji bo haydarkirina xwendevanan li ser rewşa edebiyata kurdî, nemaze li başûrê Kurdistanê, me têkîfî bi Yekêtiya Nivîskarên Kurd şaxê Duhokê re çêkir û çend pirs ji wan kirin. Me name û pirsên xwe ji bo deh nivîskarêni li Duhokê şandin, lê mixabin paşî çend mehan bersiv bi tenê ji (sê) nivîskaran hat! Em li vir pirsên xwe û bersivêni wan ji xwendevanê Nûdemê re belav dîkin. Di pêşiyê de em wan hersê nivîskaran bi we didin naskirinê, ew jî ev in:

*Fadil Emer di sala 1962'an de ji dayik bûye. Sala 1986'an xwendina pizîşkî (doktorî) temam kiriye. Ew ji destpêka salêni heysteyî de di warê lêkolînên zanisti, kurte-çîrok û li ser ziman dinivîstne. Li ser zimanê kurdî nivîsên wî yên hêja hene. Pirtûkeke wî ya kurteçirokan bi navê "Kalê Poşman" çap bûye. Nivîsarêni wî yên ji çapê re amade jî hene.*

*E. Kerim Findî di sala 1946'an de li gundekî nêzîkî Duhokê ji dayik bûye. Li universiteya Mûsilî zimanê Ingiltîzi temam kiriye. Ew lêkolinan li ser ziman û dîroka kurdan dinivise, lê zêde li ser dîrokê dixebite.*

1 - Nûjenkirina dîwana Bekir Begê Erizî

2 - Veguhastina çîrokên M. Emin Bozarslan (Meyro) ji tîpêni latîni bo yên erebî.

3 - (Gulçîn) folklor, ya hêja Ordîxanê Celîl ji tîpêni kirîli bo yên erebî.

Nivîsarêni wî yên ku ji bo çapê amade ne jî ev in

1 - Rojanê Şoreça ñone

2 - Dîroka Badîna

3 - Stranê Dîrokî

*Hesen Silêvaneyî di sala 1957'an de li gundekî nêzî Zaxo ji dayik bûye. Enstituya rêvebirinê li Bexdayê xwendîye. Ji sala 1986'an û vir de nivîs û kurteçirokên wî hatine weşandin. Nivîs û gotarêni wî di kovar û rojnameyên bi erebî de jî belav bûne. Dîwana helbestên wî "Helbestên Sava" îsal (1993) bi tîpêni latîni li Kurdistanê çap bûye.*


**M. Mayî:** *Îro rewşa edebiya-  
ta kurdî (çîrok, helbest, roman û  
şano) çawa ye?*

**Dr. Fadil:** Bi rastî em li her  
parçeye Kurdistanê di nav kevlo-  
janekî de ne, ango haya me ji  
perçen din nîne, her Kurdekkî  
haya wî ji perça ku ew tê de dijî  
heye, lewma ez dê behsa başûrê  
Kurdistanê bikim;

Helbest, li gor baweriya min  
li pêş e. Çîrok, wê jî gavêñ baş  
avêtine. Roman, di navbera heye  
û nîne de ye. Şano, qenc e.

**E. Kerîm Findî:** Rewşa ede-  
biyata kurdî niha li ber bûneke  
nû ye, hîn nezaye ku mirov bi-  
karibe wê nas bike.

**Hesen Silêvaneyî:** E z  
dibînim ku bi giştî rewşa ede-  
biyata kurdî pêşve diçe. Roj bi  
roj hejmara nivîskarêñ kurd zêde  
dibe.



*E. Kerîm Findî*

Helbesta kurdî ji kaylojankê kevn derdikeye û ber bi nûxwaziyê ve diçe. Helbes-  
tvanêñ kurd li Kurdistanê gavêñ xwe diyar kirine, helbesta kurdî baş e. Kurte-çîrok bas  
pêşde çûye, nemaze di van deh salêñ dawî de, ew jî saya serê xortêñ şareza di huner û  
teknika avakirina kurte-çîrokê de. Li gor baweriya min ger kurte-çîroka kurdî bi  
şarezayî bo zimanêñ biyanî bê wergerandin, dê dengê xwe hebe. Xwezi nivîskarêñ me  
yên li derveyî welêt bikaribin kurte-çîrokêñ kurdî wergerfinin ser zimanêñ biyanî da ku  
edebiyata kurdî bête ber çav. Romana kurdî hîn sava ye, lê bawer dikim dê pêş bikeve.  
Şano (teatr) mixabin ku di cih de mayî ye. Berî serhildana 1991 baştir bû.

**M. Mayî:** *Îro di rastîya me de edebiyata kurdî bi du diyalektan (kurmanciya jûrî û  
kurmanciya jêrî- soranî) û bi du alfabeuya (latînî û erebî) tê nivîsandin.*

*Gelo têkiliyêñ di navbera nivîskarêñ herdu diyalektan de çawa ye? ma haya we ji  
nivîsêñ hevdî heye?*

**Dr. Fadil:** Têkiliyêñ nivîskarêñ kurd di navbera kurmanciya jûrî jêrî de weke heval,  
weke Kurd gelek baş in. Lê weke edeb û nivîsandin, mixabin ku hevalêñ kurmanciya  
jûrî- soranî, haya wan ji nivîsêñ kurmanciya jûrî nîne. Baştir e ku ev pirsa ji wan bê  
kirin, ma gelo çîma..? Lê bi giştî nivîsarêñ ku bi kirmanciya jûrî- soranî tê nivîsandin  
em dixwînin, lê ew tiştîn me naxwînin.

**E. Kerîm Findî:** Li başûrê Kurdistanê nivîskar di qada xebatê de ne, her yek ji

aliyê xwe ve dixebite. Nivîskarê kurmanciya jûrî pirtir haya wî ji nivîsa kurmanciya jêrî (soranî) heye ji ber ku ew baştır dikare wê diyalektê bixwîne. Mixabin ev kêmasiye li ba nivîskarê kurmanciya jêrî- soranî heye, ango ew nivîsên bi kurmanciya jûrî naxwînin.

**Hesen Silêvaneýî:** Mixabin ku hevalêن kurmanciya jêrî (soranî) nivîsên bi kurmanciya jûrî naxwînin. Dema ku em ji wan dipirsin: Hûn ji bo helbest û çirokêن bi kurmanciya jûrî ci dibêjin? Ew bi kurtî bersiv didin û dibêjin: (Kake ême badînî naxwênin) Ma çima hun naxwînin birano?!

Lê nivîskarêن jûrî behra pirtir ji nivîsên wan dixwînin û carna li ser wan lêkolînan ji çêdikin.

**M. Mayî:** Astengêن di rêya çêbûna zimanekî kurdi yê standard û yekbûyî de ci ne? Îro zimanê me bi du alfebeyan tê nivîsin (latînî û erebî), hun kîjan alfebeyê ji bo zimanê kurdi baştır û bikertir dibînin?

**Dr. Fadil:** Astengêن çêbûna zimanekî kurdi yê yekbûyî ev in:

1- Nebûna hevgirtineke siyasî di nav tevaya Kurdistanê de, anku nebûna dewleteke kurdi a seranserî. Di dîroka Kurdan de, di dema mîrgehan de, her mîrgeha peyda dibû devoka wê mîrgehê dibû zimanê nivîsandinê. Di dema mîrgehê Botan û Behdînan de kurmanciya jûrî pêşde çû. Di dema mîrgeha Erdelan de goranî (hewramî) hate pêş û di dema mîrgeha Baban de zarê kurmanciya jêrî (soranî) hate pêş. Di dema nû jî de, besta netewî tev Kurd şiyar kirin ku ew bi zimanê xwe (kurdi) binivîsin, lê mixabin ber kes bi devoka xwe dinivîse, eger ev yeke bibe egara zengînbûna zimên jî, lê ji aliye kî din dibe egara jibevbelavbûna me.

2- Cografya Kurdistanê wekir ku di serdemên berê de têkilî bi hevudu re zehmet bû, lewma axiftina du gundêن nêzî hev jî, ne wek yek e.

3- Rola dagîrkeran. Gelek girov (belge) hene ku herdu şêweyêن kurmanciya jûrî û jêrî nêzî hev bûn, lê mixabin ku zarê Erdelanî û hinek hoz (eşir)ên arî guherînên mezin li kurmanciya jêrî kirin, lê kurmanciya jûrî piraniya belgeyên arî ya rojava parastine.

Di bara alfebeya kurdi de, diyar e ku eger latûnî kêmâsi hebin jî lê ji ya erebî baştır e. Ji hevalêن bakûrê Kurdistanê hîvî dikim ku ew baştır latûniya xwe bikin yek û rastir binivîsin.

**E. Kerîm Findî:** Astenga mezin di vê rê de nebûna dewleteke serbixwe ye li Kurdistanâ mezin. Ji ber ku zimanê kurdi ji binemala zimanêن hîndu-ewrupî ye, lewma alfabeya latûnî ji bo zimanê kurdi derman e.

**Hesen Silêvaneýî:** Ji ber ku ji mêt Kurdistan ji alê kolonyalizmê û dijminên Kurdan ve hatiye parvekirin, ev jî bûye egara nebûna zimanekî yekbûyî.

Ez ji dil dixwazim ku zimanê kurdi li hemû perçen Kurdistanê bi latûnî bêt nivîsandin. Ji hemû nivîskarêن kurd daxwaz dikim ku berhemên xwe bi latûnî çap û belav bikin, çunkî latûnî pirtir kêtî zimanê kurdi tê.

**M. Mayî:** Pişti serîhildana sala 1991'an, ev heyamek e Kurd bixwe mûrê serê xwe ne. Gelo hun hukumdariya Kurdan çawa dibînin? Serbesîya pêñus û nivîskaran di bin hukumdariya Kurdan de çawa ye?

**Dr. Fadil:** Hukûmet û perlemanê me eger kîmasî hebin jî, dê ji dijmin baştir bin. Kîmasiya ku hebe jî, dema em lê dinêrin, yan destek biyanî tê de ye, yan jî ji rewşa me ya aborî a xirab tê, lê ger azadî hebe dê ev tiştên din jî hebin.

Li gor baweriya min divê ku hukûmeta me berî her tiştî kesatî (sexsiyet) a kurd peyda bike. Divê ku em bi destêن xwe dîroka xwe binivîsin û pêşeroja me jî bi destê me bê avakirin.


Azadiya pênûsi? Ci caran pênûs azad nebûye, çunkî xwediyên pênûsê ne azad û serbest in. Ez dikarim bêl dudîlî bêjim; pênûsên azad li Kurdistanê nînin, nivîskar ketine nav gêleşoka partiyên siyasi û ketine pey pariyê nanî. Îro nivîskarêne me di qonaxa xew-hişyabûnê de ye, gêj e, nizane dê çi bike.

**E. Kerîm Findî:** Hukumdariya kurd ji gel re dermanê her nexweşiyê ye. Roj bi roj ber bi başiyê ve diçe, hemî xame (pênûs) li bin siya vê hukûmeta azad û serbest in, ci rî li ber wan nayêngirtin.

**Hesen Silêvaneyî:** Em pir dilşad û serbilind in ku paşî çend salêن dirêj ji xebata dijwar û bê rawestan berhemê bi hezaran şehîdên rîya pîroz a Kurdistanê xuya bû, em bûn xwedî hukûmet û parlemen. Li gor imkanêne ku nuha di destê hukûmeta me de hene, bi gişî başe, lê rewşa aborî li Kurdistanê gelek zehmet e.

Bi gişî hukumdariya me cihê serifaziya me ye. Em nivîskar di xizmeta hukûmeta xwe de ne, em dê giyanê xwe jî gorî wê bikin.

Qelem (pênûs) jî azad in, dema şaşiyek çêdibe, em bi azadî rexne dîkin û li rojname û kovarêne hukûmetê belav dîkin.



*Hesen Silêvaneyî*

**M. Mayî:** *Di van deh salêن derbasbûyî de gelek bûyer li Kurdistanê qewimîn, gelo kartêkirin û şopa wan bûyeran li ser edebiyata kurdi çi ne?*

**Dr. Fadil:** Em Kurd zû tiştan ji bîr dîkin, ne dûr e ger ew nebûba dê em weke netewe û millet nemabane, lê ew dibe sedema paşdemayina me jî.

Ez dibînim ku jiyana rojane û bûyeren nêzûk pirtir ji bûyeren dûr şopa xwe li ser edebiyata kurdi hêlane. Anku em pirtir bendewarêne kartêkirina (çawaftî) ne, ne ya (çendîfî), li gor baweriya min ev yek ji sedeman bû ku romana kurdi neyê nivîsin.

**E. Kerîm Findî:** Bûyerên deh salêن bûrî edebek nû peyda kir, edebê remzî û berx-wedanê peyda bû.

**Hesen Silêvaneyî:** Deh salêن derbasbûyî ku ji bo Kurdan nexwes û giran bûn, bo egera wê ku nivîskar baştır qelemên xwe pirtir tûj bikin. Dijiminan pîlanêن xirab danî-bûn ji bo têkdan û jinavbirina edebiyata kurdî, nivîskarêن kurd bi hişyarî û xebata xwe ew pîlan xerab kirin. Di egera bûyerên salêن çûyi de nivîskaran gelek berhemên hêja afirandine.

**M. Mayî:** *Di van deh salêن dawî de hejmarek mezin Kurd ji Kurdistanê derbeder bûn, di nav wan de hejmarek mezin nivîskar û roşinbîr hene. Gelo gotina we ji bo Kurdên derve, nemaze nivîskar û roşinbîran ci ye?*

**Dr. Fadil:** Kurdên li derve pir in, lê ûmkanêن wan belav in. Ger Kurdên derve ûmkanêن xwe bikin yek dikarin pir tiştan ji bo gelê xwe û Kurdistanâ xwe bikin, weke:

1- Her Kurdeك dikare mehane ji bo hukûmeta Kurdistanê alîkarîya diravî (pere) bişîne.

2- Dikarin her ciyê ew lê bin doza kurdî û zordariya ku dijmin li Kurdan dike, ji bo gelên cîhanê diyar bikin û bidin naskirin.

3- Ûmkanêن weşanê li welatên derve pir in, ew dikarin edebiyata kurdî biweşînin û bi dînyayê bidin naskirin.

4- Pir kes kene ku dikarin vegeerin Kurdistanê û xizmeta gel û welatê xwe bikin.

Bi kurfî, Kurdên li derve dikarin doza Kurdistanê gelek pêş bêxin, her yek li gor ûmkanên welatê ku ew lê dimîne.

**E. Kerîm Findî:** Kurdên li derve ji aliyê xebata roşinbîrî ve kêmâsi nakin, pir kovar, rojname û kitêban belav dikin, gelê me didin naşin, ew hêjayî spasiya me ne. Divê ew jibîr nekin ku iro li Kurdistanâ azad zanko (universite) bene, ji wan re kesen zane û pispor divên, welat kavîl û xirab e, jê re sexbêrî û avakirin divê, hukûmeta me sava ye, hejar e, jê re dirav (pere) divê. Kurdên li seranseri dînyayê belav bûne, bila wek abone pere û alîkarî ji hukûmeta kurdî re bişînin.

**Hesen Silêvaneyî:** Silavêن me ji Kurdên li derve re..

Her Kurdeك ji Kurdistanê re xizmet dike, ew cibê şanazî û serbilindiya me ye.

Em ji Kurdên derve daxwaz dikin ku li gor ûmkanêن xwe alîkarîya hukûmeta Kurdistanê bikin, nemaze iro ku em di tengaviyek aborî de ne. Mixabin ku hinek Kurd bazir-ganiyê bi me dikin, bi navê me alîkarîyê kom dikin û dixin bêrîkên xwe! Ji Kurdên derve hêvî dikim xwe ji karêن xirab dûr bixin, zimanê kurdî biparêzin, nexweşxane û zankoyêن me hewcedarê we ne, werin, Kurdistan bi azadiya xwe ve li benda weye.

# TU ÎSHAQ Î... CEMÎLEK Î...



---

Yılmaz ERDOĞAN

*Îshaq di hucreyeke dukesî ya girtîgehekê de ye... Umrê wî bihist û pênc e... Ji xêzên li ser rû û simbêlan fahm dibe ku ew kurd e.... Ew û pantolonê xwe li aliyê jor ê ranza dukesî dijîn. Îshaq pantolonê xwe, bi hêrs, ji bin cûhê razanê derdixe.*

**ISHAQ** - Xwedê bela xwe bidiyê... dîsan utî nebûye...

*Pasê deng tê... deriyê hucrê bi deng û tegereq vedibe... Gardiyan, kesekî li dora sîn salî, bejndirêj, merivekî ku ji her aliyêne wî dixuye ku îskence dîtiye, gêrî hucrê dike; Cemîl...*

**GARDIYAN** - De bikeve hundir... heta çendekê hûn ê du kes li vir idare bikin.

*Îshaq, binihêre, min hevalek ji bo te anî, hûn pev neçin, teşqelete nekin!*

**ISHAQ** - Kekê mesela me ya nameyê çi bû? Tu dé wê bişînî? Ez wê binim?

**GARDIYAN** - Lawo, ez ê çend caran ji te re bibêjim!.. Li hember vê zehmetiya ku ez ê bikişînim qezanca min ê çi bibe?

**ISHAQ** - Naxwe, min pere nedan te?

**GARDIYAN** - Ew ji bo nivisînê bû... Ji bo bi rêkirinê jî, ez dixwazim.

**ISHAQ** - Niha pereyên min nîn in, bixêr bila roja ziyaretê were.

**GARDIYAN** - De dirêj meke... Eger pereyên te nîn bin, name jî nîn e!

*gardiyan çû... Derî bi deng hate girtin...*

**ISHAQ** - Law ez ê di... Tu merivekî bênamûs î, kurê kerê.

**CEMÎL** - Birayo merhaba... navê min Cemîl e.

- ISHAQ - Ji min re çi? Ma kesî tu pirsîyî? De navê min jî Îshaq e... Lê name her ma... Kurê kerê wê naşîne...
- CEMİL - Nama çi?
- ISHAQ - Nameyeke ha... Puşîê xerdiyan wê naşîne...
- CEMİL - Ev name evçend girîng e?
- ISHAQ - Belê, pir girîng e... Eger ev name nebe, îdam ê were...
- CEMİL - Çawan, bidarvekirin?
- ISHAQ - Belê, belê, îdam... Heke wî ev bişanda wê baş bûya, wê gelekî baş bûya...
- CEMİL - Birayê Îshaq, ka sûç û gunehê te çi ye?
- ISHAQ - Kuştin...
- CEMİL - Te kî kuşt?
- ISHAQ - Birayê xwe... Yanê ew mîna birayê min bû, lê min lêxist, tu dê çi bikî, qeder...
- CEMİL - Çi, qeder?
- ISHAQ - Dijminahiya malbatî, dawa xwînê bû... gava dawe bibe dawa xwînê, bira jî dikare bira bikuje...
- CEMİL - Hê jî doz û daweyên xwînê ha?
- ISHAQ - Wan ez mecbûr kirim... Min got ku ez nikarim. Min got, Lezgîn birayê min e, me bi hev re kenger berhev kiriye. Çaxa destê wî bi stiriyekî bişê, ji tiliya min xwîn dere, min got... lê... li kêleka kadûnê min li Lezgîn xist... Xwîn welê herikî ku min got wey ew xwîna min e... Min ê xwe jî bikuşa! bawer bike!.. Ew gihiştin... Wan bernedan.
- CEMİL - Èê?
- ISHAQ - Îdam dane min...
- CEMİL - Ma wan bîryar xera nekirin?
- ISHAQ - Ew ê çawan bîryarê xera bikin? Min ew dîtiye, debançe kişandiye û lêxistiye... Ma sebebên xirakirinê hene?.. Eger Cîmhûrreisî Beg xira neke, ew ê min bi dar ve kin... Te li kî xistiye?
- CEMİL - Ez nizanim...
- ISHAQ - Çawan? Sûcê te çi ye?
- CEMİL - Ez siyasi me...
- Îshaq mat ma, xwîna wî vekişiya...
- ISHAQ - Ci? Tu siyasi yî? Tu siyasi yî, he?
- Wî xwe li caxêñ derî xist... êriş bir ser caxan...
- ISHAQ - Xerdiyyaan! Xerdiyyaan!
- Gardiyan hat...
- GARDIYAN - Ci bû lawo, ci qewimi?
- ISHAQ - Gelo tu çima nabêjî, ev siyasi ye?
- GARDIYAN - È, ci bûye?
- ISHAQ - Ez qurbana te dibim, bibêje, bila wî bibin têxin derekî din... Eger birêz Cîmhûrreisî Beg bibihîse ku ez bi merivekî siyasi re dimînim, ew ê min jî welê têbigihî, hingî ew qet min efû nake!
- GARDIYAN - Meqîre law! Eger ew siyasi ye, tu jî mîrkuj !! Eger tu careke din weha berhawa bang min bikî, ez ê serê te bîşkînim, êdî li gora wê!
- Gardiyan derket, çû... Îshaq li dewsa xwe ma...
- ISHAQ - Law dêqahp! Bi dîn û imana min ev xerdiyanê ha bênamûs e! Ez ci jî bibejim, ew nake... namê jî naşîne...
- CEMİL - Ev nama çi ye?

ÎSHAQ - Te alaqeder nake!

CEMÎL - Bi tenê min meraq kir...

ÎSHAQ - Meke! Tu bi min re mepeyive! Ci tu galegalê dikî?

CEMÎL - Baş e Îshaq, mîna ku tu dixwazî...

*Deqîqeyên ku bi pirâziya zarokekî bîhûrîn... Paşê Îshaq cixareyek vêtist... nefesek jê kîsand, carek li cixarê nîhêrî, carek li Cemûl... ew sekînî...*

ÎSHAQ - Tu dikişînî?

CEMÎL - Heke tu bîdi, ez ê bikişînim...

*Îshaq cixareyek dirêjî wî kir...*

ÎSHAQ - Temam, wê bikişîne û here...

CEMÎL - Ma ez herim ku Îshaq?

*Îshaq dikaribû, ji bo bersîvdana vê pîrsê, her tiştê xwe bida! Mesela panto lonê xwe...*

CEMÎL - Gelo em li hev hatin?

ÎSHAQ - Ez ê tiştekî ji re bipirsim.

CEMÎL - Bipirse...

ÎSHAQ - Ji min re bibêje, hûn çîma ji mixtarê me hez nakin?

CEMÎL - Kijan keya?

ÎSHAQ - Mixtarê me, lo, Kinyas Axa! Ji bo wî dibêjin ku ew merivê hukimatê ye, faşî ye...

CEMÎL - Faşîst?

ÎSHAQ - Erê... Ma ew faşî be, ci dibe, lawo! Xwendina wî heye, nîvisîn nîn e.

CEMÎL - Ez ê keyayê we ji ku binasim Îshaq?

ÎSHAQ - Hemû kesenî siyasi wî dinasin... tu çawan wî nas nakî?

CEMÎL - Ez wan siyasiyên ku tu behs dikî jî nas nakim.

ÎSHAQ - Tu nas nakî?.. Lawo, hê xebera we ji we tune ye!.. Baş e, eger tu mixtarê me nas nakî, çîma tu dibêjî, ew faşî ye, xayîn e?

CEMÎL - Min tiştekî weha negotiye.

ÎSHAQ - Esas xayîn hûn in!

CEMÎL - Çîma?

ÎSHAQ - Hûn qet li cîhê xwe nasekin ku! Hûn her şixulî tevlihev dikin! De bibêje, ma derew e?

CEMÎL - Îshaq... Binîhêre, em dixwazin ku kar û şixulên ku baş narin, bila baş herin... bila her tişt hîn çêtir be. Bila tu bikaribî hîn çêtir bijî... Yanê, di esasê xwe de em ci dikin ji bo te ye!

ÎSHAQ - Ji bo min? Yanê hûn niha ji bo min dixebeitin?

CEMÎL - Belê.

ÎSHAQ - Yanê hevwas însan ji bo min dixebeitin, na?

CEMÎL - Belê...

ÎSHAQ - Ji bo wê ye ku derpiyekî di qûna me de tune?.. Hûn dîn û şêt in, dîn!..

CEMÎL - Çîma?

ÎSHAQ - Hûn ji kesî hez nakin! Heta rîka we li dijî Axê jî heye... Ci ye? Bûye qorîci! Helbet ew ê bibe...

CEMÎL - Tu jî cêrdewan bûyî?

ÎSHAQ - ... na, naxêr...

CEMÎL - Tu çîma nebûyî?

ÎSHAQ - .....

CEMÎL - Ji bo ci tu ji Axa hez dikî?

- ÎSHAQ - Bi saya serê wî, em pariye kî nan dixwin.  
 CEMİL - Bi ya min, Axa bi saya serê we nan dixwe.  
 ÎSHAQ - Çawan?  
 CEMİL - Hûn dixe bitin, ew qezenc dike. Ma ne weha ye?  
 ÎSHAQ - Welê ye. ~ixulê Axê qezenc kirin e, yê gundiyyê mîna me jî kar û xebat e.  
     Yaziya eniya me welê ye.  
 CEMİL - Ha, em jî, jixwe, dixwazin vê qederê biguberînîn. Em dibêjin ku bila  
     kesen dixe bitin, qezenc jî bikin.  
     *Ji nişka ve Îshaq veciniqî..*  
 ÎSHAQ - Hêdî bipeyive, lawo! Ku yek gotinê te bibîhese, ez ê bişewitim! Paşê jî  
     were û di hepisxanan de birize!  
 CEMİL - Jixwe em di girtîgehê de ne, Îshaq...  
 ÎSHAQ - Bila be... Dengê xwe bibire. Tu dê belayekî bînî serê me!  
 CEMİL - Jixwe ïdam dane te, jê xirabtir êdi çi dikare were serê te!?  
     *Îshaq sekînî... Îshaq xemgir, li ber xwe ket. Cemîl jî ji gotinê xwe poşman  
         bû...*  
 CEMİL - Îshaq, li min bibore, min nexwest welê bibêjim...  
     Îshaq bû kelgirî...  
 ÎSHAQ - Erê, me ïdam xwariye... Lê min nameyek, ji bo diya xwe, da nivisîn. Diya  
     min ê derkeve huzûra birêz Reisîcumbur û ew ê jî min efû bike... Ew  
     dikare efû bike, di qanûnan de beqê wî heye!.. Lê belê ev xerdiyanê bêbav  
     namê naşîne!  
 CEMİL - Xwendin û nivisîna te heye?  
 ÎSHAQ - Na, tune...  
 CEMİL - Kê name nivisî?  
 ÎSHAQ - Xerdiyan... ji bo nivisînê, wî hemû pereyên min ji min girtin, ji bo  
     şandina wê pere neman.  
 CEMİL - Tu li peran mefikire, ew hêsan e... Hele em carekê li vê namê binihêrin...  
     *Bi kefeke bêpayan, Îshaq hilkişıya ser cîh... name ji bin cîh derxist...*  
 ÎSHAQ - Biferme...  
     *Cemîl name xwend. Ew hêrs nebû, nefret kir... Bir û hegê merivan, hawirdor  
         û tesîra wî... Lê mîna ku nizmahû û segbavî genetîk bû...*  
 CEMİL - Segbavê segbav!..  
 ÎSHAQ - Ci bû?  
 CEMİL - Na, tiştekî tune... Îshaq, em nameyeke nû binivîsin...  
 ÎSHAQ - Sebeb?  
 CEMİL - Ev name baş li hev nehatiye...  
 ÎSHAQ - Carekê bixwîne..  
 CEMİL - Dev jê berde... Em ê yeka nû binivîsin.  
 ÎSHAQ - Cemîl, de bixwîne, heyra, di vî işê de bênamûsiyek heye. Wê bixwîne!  
 CEMİL - Baş e...  
     *Cemîl, bêçare, dest bi xwendinê kir...*  
 CEMİL - "Dapîra min a delal, navbera te û kalikê min çawan e? Di nav cîha de hûn  
     çi dikan? Çivika kalikê min rep dibe? Ez ji te û çivika kalikê xwe re sila  
     van dişinim!.. Neviyê te yê beradayî Îshaq!"  
     *Îshaq mat bû... nihêrt.. fikirî.. pa...*  
 ÎSHAQ - Wî weha nivisiye?.. Ma min jê re weha gotibû!.. Min jê re gitibû ku... ew  
     ji diya min re bibêje ku... ji bo Reisêcimbûr... ez ê di diya wî...

*Wî xwe spart qîrinê û êrîş bir ser caxan...*

ÎSHAQ - Law pûş... bênamûs! Dêqahp, qahp kurê qahpan! Law ev çawan name ye!

Perê min li min vegeŕine law! Perê min...

*Îshaq giriya, li ser çogan ket, rûnişt... Cemil hat nik wî. Ji aliyê hucran  
dengê stranekê hat bihîstin:*

Yek mûmik, du mûmik...

Yek mûmik, du mûmik...

*Cemîl hinekî din hat ba Îshaq...*

CEMÎL - Îshaq, megirî, şerm e... Em ê yeka nû binivîsin..

*Ji nîskê ve, dengê gardiyân hat...*

GARDIYAN - Were vê derê law, kurê kerê!.. destê xwe dirêj bike, dirêj bike!

*Îshaq tiliyê xwe yên lerizî di nav caxan re dirêj kir... pênc caran li ser hev  
çavên wî verbûn û hatin girtin...*

GARDIYAN - Tu dê çérâb bikî, hei! de bîbîne... de niha bicehme, here...

*Gardiyân û cop derketin... Îshaq bêdeng ma... gurmikê xwe pihêt guvaşt...  
hilkişîya ser cîhê xwe û bêdeng dest bi giriye kir...*

CEMÎL - Li ber xwe mekeve Îshaq, pişti bîskekê wê derbas be.

ÎSHAQ - Na, ne welê ye, Cemîl... Min gelek lêdan xwariye... Lê meriv li ber lêdana  
weha dikeve... Ez, iro, sibê, ez ê derkevin, ci hewce ye ku ew weha li min  
xe, ne wisan?.. Ew çiqas zâlim e...

*Wî destê xwe avêt bin balîfa xwe, li tiştekî geriya... kulmeke benîştên bi  
şekir... bi nalenal yek da Cemîl...*

ÎSHAQ - Werbigire... benîş...

CEMÎL - Te benîş ji ku peyda kir, Îshaq?

ÎSHAQ - Mepirse, me ew ditiye, işte... jê gelekî hez dikim, lê gava şekirê wî jê dere  
êdi ew hew xweş e...

CEMÎL - Kaxiz, pêñûs hene, ji bo namê?

ÎSHAQ - Belê, hene. Wî bênamûsê anîbûn.

*Îshaq dîsan bi heyecana zarokekî û bi lez kaxiz û pêñûs anîn û ew hazir  
kirin...*

ÎSHAQ - Cemîl, gelekî spas, tu berxwudar bî...

CEMÎL - De dev jê berde, niha bîbêje...

ÎSHAQ - Binivise!.. Euzubillahûmîneşseytanîrrâm, bismîllahîrrehmanîrrehîm...

CEMÎL - Hinekî hêdî bibêje, Îshaq, ev çawan têñ nivisin?

ÎSHAQ - Eger ez vê bizanibim, çima êz ê bi te bidim nivisin?

CEMÎL - Di dewsa vê de, em weha dest pê bikin? "diya min a delal"?..

ÎSHAQ - Hele li kafîr binihêre! Ma meriv bê bismîllah dest bi şixul dike?

*Binivise... Bismîllahîrrehmanîrrehîm... Diya min a dilovan, tu çawan î; diya  
min, mamê min çawan e; diya min, kurêñ mamê min çawan in; diya  
min, xalê min çawan e...*

CEMÎL - Îshaq, ma te dil heye hemû gund bîhejmîri?

ÎSHAQ - Eger ez li hemûyan nepirsim, ew ê dilê xwe bigirin...

CEMÎL - Lê hema qet nebe, em van hemû "diya min" têxîn nav kevanokê.

ÎSHAQ - Çi?

CEMÎL - Yanê, em her serê carê nebêjin, diya min, diya min.

ÎSHAQ - Niha tu dê binivîsi yan ji na? Temam, ka bide min, ez bi xwe... ez li ku

nivisîn li ku!...

CEMİL - De hêrs mebe, Îshaq, bibêje, ez dînivîsim...

ÎSHAQ - Diya min, birayêن min çawan in? Ew baş in? Eger hûn jî halê min bipir sin, ez pir pir baş in, ji Xwedê re şukir, reheta min li cîh e...

Cemîl li rûyê Îshaq nihêri...

ÎSHAQ - Tu dizanî... bila ew li ber min nekevin... binivîse... Diya min, li vir xer diyanek heye ku bênamûsekî mîna wî tune!

CEMİL - Îshaq, em nikarin vê binivîsin... hingê name nare.

ÎSHAQ - Çima?

CEMİL - Ew ê namê bixwînin û neşînin.

ÎSHAQ - Hingî tu weha binivîse; xerdiyanê me pir bi pûstan dişibe.

CEMİL - Na, weha jî nabe.

ÎSHAQ - Hingî tu weha binivîse; ji bo xerdiyanê me dibêjin, ew pûst e, lê ew ne merivekî welê ye!

CEMİL - Îshaq, de were, em dev ji pasevan berdin, em vî nexin navê.

ÎSHAQ - Bila mîna te be. Diya min, birêz Reisêcumbûr idamîyan efû dike, ji mixtêr re bibêje, bila ew te bibe ba birêz Reisêcumbûr... Tu jî jê re behsa hal û hewalê min bike... xelk dibêje ku Reisêcumbûr merivekî baş e, efû dike... Diya min, ez ji destê mezinan, çavê biçûkan maç dikim... Lawê te Îshaq..... ma temam bû?

CEMİL - Ew temam e, Îshaq.

ÎSHAQ - Birayo Cemîl, tu dikarî, dêvla min, îmzayekê bavêjî? Bila ew jî hinekî kêfxweş bin, bila bibêjin, Îshaqê me bûye xwende...

CEMİL - Baş e, Îshaq, çima na...

Cemîl kaxiz li hev pêça û dayê ... Îshaq kaxiz xiste bin cîh... disan li panto lanê xwe nihêri..

ÎSHAQ - Ev hê jî rast nebûye, ev bûn du meh ku ez derdikevîm serê, lê hê jî rast nebûye...

CEMİL - Tu dê pê çi bikî?

ÎSHAQ - Gava ez ji xepisxanê derkevîm, herim gund, ez ê li xwe bikim...

CEMİL - Ha... welê... min fahm kir...

Cemîl rabû ser xwe... dest bi gerê kir, li hemberê nihêri...

CEMİL - Niha bihar e... Heye ku baran e... heye ku hê jî hinekî berf...

ÎSHAQ - Tu li ku dinihêri?

CEMİL - Li çiyan...

ÎSHAQ - Li kûjan çiyan?

CEMİL - Li Ciloyan, li Agiriyê... li yên van ên hember...

ÎSHAQ - Ka ew li ku ne, tiştekî naxuye bavo!

CEMİL - Ew dixuyin, Îshaq! Binîhêre, bîhna nêrgiz, binevş û gulbiharan jî tê... bîhna misk û emberê

ÎSHAQ - Ka? Pehhh! Bîhna gû tê, tu welê bawer ï ku ew bîhna çiçekan e! Ma ez nabêjim ku hûn maynaq in! Tu bi gotina min bawer meke!..

CEMİL - De hinekî serê xwe bişuxulîne, bi xeyalan bifikire, Îshaq...

ÎSHAQ - Çi?

CEMİL - Eger tu bixwazî bibînî, tu dê bibînî!.. Yanê...

ÎSHAQ - Lawo, bawer bike, tiştekî naxuye!

CEMİL - Dîxuye!

ÎSHAQ - Na, naxuye!

**CEMİL** - Ez dibêjim, dixuye!

**ISHAQ** - Naxuye, va ye, ez ï dinêrim, tiştekî tune, ez jî bîhn dikim, ji bîhna gû pê ve tiştekî tune!.. Hûn maynaq in, maynaq!

**CEMİL** - De bibire, tu jî! Em ne manyaq in ne jî tiştekî din... Ü meriv nabêje maynaq, dibêje manyaq.

**ISHAQ** - Belê, temam, ma em ci dibêjin, maynaq!

**CEMİL** - Xwedayo, law tu ci însan ! Çawan tu dikarî evçend lawaz bî? Haya te ji tu tişî nîn e, tu tu tişî fahm nakî! Tu bê nizanî, fahm nakî ku ez jî ruyê te, ji bo te, li vir im!!

**ISHAQ** - Ma min bang te kir?

*Cemîl rawesta... İshaq dîsan êriş bir ser pantolonê xwe...*

**CEMİL** - Tu ci dîkî?

**ISHAQ** - Ez pantolonê xwe utî dikim!

**CEMİL** - Tu xwe bê sebeb diwestûnî, ew ê utû nebe!

**ISHAQ** - Belê, ew ê bibe!

**CEMİL** - Ew ê nebe... tu carî!

**ISHAQ** - Ew ê rast be! Hem jî li gora dilê min! Gava ez derkevîm, ez ê wî li xwe bikim... da ku bila kes li gund nebêje ku pantolonê İshaq ku Reisêcumhûrê giregir efû kiriye, bê utî ye... Ez ê li dîwanxanê rûnim, li ser min jî ev pan tolon! Herkes ê ji bo xêrhatinî û kefaretê were, li ser min ev pantolon! Ew ê çay vexwin, dîsan ev pantolon... Law... law... Cemîl, me name ji bir kir... Cemîl em wê bidin?

**CEMİL** - Em bidin...

**ISHAQ** - Cemîl...

**CEMİL** - Ci ye?

**ISHAQ** - Tu hêrs bûyî?

**CEMİL** - Na, ez hêrs nebûm, ez ditirsim, İshaq...

**ISHAQ** - Çima tu ditirsi?

**CEMİL** - Ji mirinê İshaq...

**ISHAQ** - Metirse lawo, ew ê min nekujin, ma me name nenivisi!

**CEMİL** - Baş e, ya min?

**ISHAQ** - Te? te jî?

**CEMİL** - Belê...

**ISHAQ** - È, tu jî nameyek binivîse... Birêz Reisêcumhur merivekî baş e, ew ê te jî efû bike!

**CEMİL** - Serekkomarê te yê birêz min efû nake...

**ISHAQ** - Ma min negot, aha hûn weha ne! Mêrik ê efû bike, tu naxwazî!

**CEMİL** - De temam, İshaq, de hadi bang vî pasevanê bike!

*İshaq bang li der kir...*

**ISHAQ** - Xerdiyan, lo xerdiyan!

Gardiyane kete hundir...

**GARDIYAN** - Dîsan ci ye?

**ISHAQ** - Name! Lî ne ya ku te nivisi... Ew pir baş bû!

**CEMİL** - İshaq!.. Peran bidiyê...

*İshaq pereyên ku Cemîl danê, wergirtin...*

**ISHAQ** - Tu sax bî, çaxa ez derkevîm, ez ê deynê xwe bidim...

**CEMİL** - De peran bidiyê, İshaq!

*İshaq pere û name dan gardiyane... Gardiya çû... name çû...*

ÎSHAQ - Me esela namê jî hal kir... Di çend rojan de ew dere?

CEMÎL - Ez nizanim, lê heye ku di nav hefteyekê de...

ÎSHAQ - Hefteyek çûyina namê, hefteyek jî çûyina diya min a nik Reîsêcumbur... du hest... E, hingî pişî du heftan ez derdikevîm... ma ne welê ye?

CEMÎL - Wisan e...

*Ji aliyan hucran dîsan dengê stranan hat:*

DENG - Yek mûmik du mûmik...

Yek mûmik du mûmik...

Yek mûmik du mûmik...

*Pasê dengên zîz ên hin girtiyên din hatin bihîstin:*

DENGËN ZÎZ - De bibire law, qûno! Te niyet heye me dîn bikî! navê xwe bîbêje law, navê xweee!..

CEMÎL - Îshaq, ew ê ku distrê kî ye?

ÎSHAQ - Ez nizanim... siyasi ye... hertim vê dîlanê dibêje... Ew jî siyasi ye... maynaq e...

*Gava Îshaq dît ku Cemîl bi gotina wî eciz bû, hema mesele guhert...*

ÎSHAQ - Bi ya min, Reîsêcumbur te jî efû dike...

CEMÎL - Çima ew ê min efû bike?

ÎSHAQ - Ji ber ku ew merivekî baqil e... Ew dizane ku îdam şaş e... Niha min li yekî xist û kuşt, mehkeme jî li min xe, divê wê gavê yek i li mehkemê xe... dawa xwînê jî weha ye...

CEMÎL - Tu ji ku dizanî ku Serekkomar merivekî baqil e?

ÎSHAQ - Helbet, ez dizanim. Ma ew ne baqil be, dikare bibe Reîsêcumbur?

*Gava Îshaq ji binê cîh pantolonê xwe derdixe, tomareke kaxizê jelatîn direse erde...*

CEMÎL - Ev ci ne?

ÎSHAQ - Law... min ev ji bûr kiribûn... kaxizên cixarê ne...

CEMÎL - Jelatîn.

ÎSHAQ - Erê, ew kaxizê kebabê ne... Hema ez ji xwe re wan berhev dikim.

CEMÎL . Tu dê bi wan ci bikî?

ÎSHAQ - Ew lazim in... Kesê ku ji van hezar libî berhev bike, dikare bibe xwediyê erebeyekê, erebeyekê didinê, xerdiyan got... ereba bi teker.

CEMÎL - Jixwe erebe bê teker nabe, Îshaq.

ÎSHAQ - Lo, ka ew erebeyen ku kulek û seket lê siwar dibin... ji wan.

CEMÎL - Tu dê rebeyeke weha ci bikî?

ÎSHAQ - Lazim e, çaxa ez derkevîm , dikarim bidim yekî, sewab e... Cemîl...

CEMÎL - Bibêje...

ÎSHAQ - Ev kaxiz mîna neynikê ne, lê çaxa meriv lê dinêre, nkare xwe tê de bibîne. Çima?

CEMÎL - De bes e, Îshaq, êdî tiştekî mepirse... Ez ê razêm...

## II

*Ji navberê çiqas wext derbas bû, kes pê nizane... Jixwe kes lê meraq jî nake... Saetan berbangeke sibê lêdan... Îshaq radiza... Cemîl radiza... Deriyê hesinî vebû... Gardiyan kete hundir... yêngî razayî hisyar kir... Îmam, gaveke li pey gardiyan, radiwesta... Û kesên din ên li ber mirinê...*

GARDIYAN - Îshaq... Îshaq...

ÎSHAQ - Hii? Çi ye. çi heye?

GARDIYAN - Rabe... wext hat... Em ê herin...

*Tistin ji hingava Cemîl pekiyan...*

CEMÎL - Hûn ê herin ku?

*Îshaq, bi kîf, pengizî...*

ÎSHAQ - Aha! Roja min hat! Cemîl, ez derdikevîm... Bisekine, bisekine... ez panto  
lonê xwe...

*Wi pantolon ji bin cîh derxist...*

ÎSHAQ - Aha! Cemîl, binêre, pantolon ji utû bûye!

ÎSHAQ - ..... hem jî di wextê de....

*Êdî Îshaq ne didît, ne jî dibihîst...*

CEMÎL - Îshaq...

ÎSHAQ - Ew di wextê de utû bû! Hem jî tam di wextê de! Name bi kîr hat, Cemîl,  
tu dibînî! Deqeyekê birayê xerdiyan, deqeyekê, ez pantolonê xwe li xwe  
kim...

*Îshaq bi lez û hêrs dest lixwekirinê kir...*

ÎSHAQ - Birayê min Cemîl, ez ê tişten ku te ji bo min kirin, ji bîr nekim! Ez  
derim, xwezi bi te... Binêre, mesel vê namê careke din bifikire!.. Meraq  
eke, ez ê hertim bêm ziyareta te... Binêre Cemîl, ez xelas bûm. Min ji te  
re got, ew merivekî baqil e... Di wextê de utû bû... Ma ew ne baqil be,  
pantolonê wî bê utû dibe? ma ne welê ye, Cemîl?... ne welê ye...

CEMÎL - Oxir be Îshaq... Name bide nivîsin û bisîne...

*Gava wan Îshaq di nav xwe de kışandin û birin, ew hê diqîriya...*

ÎSHAQ - Te dîr Cemîl, ta di wextê de ew utû bû... Binêre, te digot ku ew utû nabe, lê  
bû, hem jî tam di wextê de, ma ne welê ye Cemîl! Ma ne welê ye, Cemîl!  
Cemîllllll!!

*Cemîl, bêdeng, li ser zemînê ji kevir, mîna keviran, rawesta... Û êdî bi  
tenê dengek dihatebihîstin...*

Yek mûmik du mûmik...

Yek mûmik du mûmik...

---

Yılmaz Erdoğan di sala 1967'an de li Hekariyê hatiye dinyayê. Ew mîna nivîskar û  
listikvan di gelek tiyatroyê Tirkîyeyê de xebitî ye. Mixabin ku mîna gelek ronakbîrên  
kurdan yêni li Tirkîyeyê xebatêni Yılmaz Erdoğan jî hemû bi tîrkî ne. Digel temenê xwe yê  
ciwan iro Erdogan li Tirkîyeyê xwedî cihekî bilind e. Wî nîvî musîkala bi navê "Geregi  
Düşünüldü" û listika bi navê "Kadınlık Bizde Kalsın" hemû nivîsandiye. Wî senaryoya bi  
navê "Umut Taksi" ya ku du salan li ser hev di televizyona Tirkîyeyê de listiye, nivîsandiye û  
mîna listikvan jî tê de listiye.

Bi hêviya ku wê Yılmaz Erdoğan hêdî hêdî bala xwe berde ser zimanê dayika xwe û dest bi  
musîkîl û piyesen bi kurdî bike, em beşekî ji piyesa Erdogan bi kurdî diweşînin.

# ŞÊX EVDILQA-DIRÊ GÊLANÎ

(1079-1166)



---

Zeynelabidîn ZINAR

---

Dema ku mirov li kûrayiya mêtjû dinêre, tê de gelek şopên kevnare yên bi-hadar derdikevin pêşberî bînabiya mirovatiyê. Ew şop wisane rind sîna xwe der-xistibûn holê, xasma li Rojhilata Navîn û li piraniya beşen dinyayê ku niha jî bo ol û oldaran serbilindiyeke payedar diafirînin. Lewra girfngtiya wan şopan hertim xwe parastiye û bo xwe rûpelên nûjen di mêtjû de vekirine. Îcar heçika ew şop bene çi di warê olî de bin, çi di warê zanîstî, medeniyet, afirandina nûjentiye, di yê çand û folklorê, nivîskariya bi zimanên cihê-cihê de bin, pêlîdanên rew-

neqa xwe li hafa gerdûn û gernasana eşkere kirine û bi pîroziya bihayê xwe şenîtiya dinyayê sermiş kirine.

Bêguman çewa ku bilbil hemû bengiyêñ gulistanê ne û tev diçin, her yekê li ser guleka rengîn didaniçe, kes ji wan têkiliya xwe ji kesî nayîne û yekser bi kêf û geşta xwe ve dilipikin, eynî wisan heçika mirovên ku navdarêñ dîrokê ne jî, her yekê di dem û çaxêñ xwe de bi guilekê ve lipikiye û şopa şan û şerefâ xwe li ser belgên wê diyarî hiştîye. Ta îro jî ew diyarî mîna durrêñ suftê bihayê xwe li bazara zanistîyê diparêzin û kiroxan bi ser xwe ve dikîşînin.

Bêguman yek ji şexsiyetên wisa yêñ dîrokî ku gera kumbeta taca xwe ji cîhana oldariyê re kiribû mîna konê pêgeha amac û daxwazan, herweha ku di Rêçika (teriçet) Kurdevarî ya Qadîrî de şan û şerefâ şerefdaran bi ganî û bêgiyanan dabû pejirandin, Şêx Evdilqa-dirê Gêlanî (1) ye.

Her çiqasî babeta Nûdemê; ziman, edebiyan û çanda Kurdî ye. Lê hêvidar im ku xwendevan bi nivîsên wisa şâş tênegihin. Ji ber ku kesên mîna Gêlanî û yên mîna Mewlana Xalîdê Kurdi (di hejmara heftan a Nûdemê de) jî, beşek ji dîroka Kurdistanê ne. Bêguman ev yek eşkere ye ku ne dîroka Kurdistanê bê wan kesan dibe, ne jî dîroka wan bê ya Kurdistanê dibe. Ji ber hindê me rewa dît ku di vê hejmara Nûdemê de, navê Şêx Evdilqadirê Gêlanê cibê xwe yê pîroz vegire û nifşen heyî pê agahdar bibin, ku Gêlanî jî yek ji civata bâpîrên me bû.

Damezinêrê Rêçika Qadîrî, zahidê navdar ê mensûrê bi Gêlanê Şêx Evdilqadir, di 471-ê (1077-78) de li gundê Nîfê (yan jî Nayf) yê girêdayê bi bajare Gêlanê ve hatiye dinyayê û di 561-ê (1166) de jî, li Bexdadê wefat kiriye (2). Navê wî bi temamî: *Ebdulqadir El Gêlanî Muhyeddîn Ebû Muhemed Binu Ebî Salih Zengî Dost e. Navê bavê wî, Ebû Salih Mihemedê Gêli ye. Diya wî Fatîme jî, keça Ebdullah Şewamî ye.*

*Gêlanî*, di temenê hijdesaliya xwe de bo xwendinê çûye *Bexdadê* û lêçuya wî, dayika wî ya dilova ji kisê xwe kiriye. *Gêlanî* serê pêşî li cem dersdarê navdar *Tebrêzî* (502=1109, miriye) *Serf û Nehw* xwendine, piştre li ba gelek dersdaran di mezhebê *Hembelî* de *Fiqf* xwendiyê. *Ebulheyr Muhemmed Binu Muslim El Debbas* (525=1131, miriye) *Gêlanî* bi bal tesewufê ve dehf daye. Piştî kutakirina ilmê *Tesewufê*, serokê medresa *Tesewufê Ebû Se'd Mübârek El Muherrimî* ebaya *Tesewufê* li *Gêlanî* kiriye. Piştre *Gêlanî* çûye li gelek mizgeftan waz dane xelkê û xutbeya nimêja ïnê xwendiyê. Wazên wî tîneke pir giran li xelkê kirine. Heta bi wê tînê gelek *Cihû û Fileh* misilman bûne, gelek misilman jî gihane feyza rûhanî.

Piştî hevnaşına *Gêlanî* bi *El Debbas* re, içar *Gêlanî* bûye hevnaşê *Şêx Yûsufê Hemedanî* û rind ketiye binê tîna wî. Piştî wê yekê *Gêlanî* evcar xwe bi temamî daye ser ilmê *Tesewufê*. Di wê navê de her ku çûye navûdengê *Gêlanî* belav bûye û xelk li dorê civiyaye. Wî, *Rêçika Qadîrî* damezirandiye û bi temamî xwe amadeyê ser wê rê kiriye.

Li gorê felsefa *Rêçika Şêx Evdilqadirê Gêlanî*, riya paqij; bikaranîna navê Xwedê ye ku ew jî zikr e. Lewra zikirin-kirina bo navê Xwedê, timî mirovan dişo û paqij dihêle... Rih, bêmirin e û ne girädayê bi gewde ve ye. Lewra gewde mala çûn û hatina rih a nexweser e. Pêşî rih, piştre hêj gewde hatiye afirandin. Gava rih dikeve gewdeyekî, ew gewde jîndar dibe. Gava rih ji gewde derdikeve, bûyera ku dibêjin "mirin" derdikeve holê. Piştî mirinê, vejîn heye.... Dinya piştre hatiye afirandin û bi fermanan Xwedê dinya her tê idarekirin.

Di *Rêçika Qadîrî* de fikra qezenza madî û hiskirna ji dînyayê cih nagire. Di bin-geha asası ya rêçikê de, parastineke dirust a bi Xwedê ve û bicihanîna fermnên wî yêr erêni û neyîni rada yekemîn vedigirin.

Hin awayê baweriya ku *Gêlanî* di *Rêçika* xwe de daye pêş, tenê ne ji çavkaniyêna ola İslâmî ne, herweha ger bi hindikî be jî tê de ditina hin şopêñ ber-maya ji *Zerdeştiyê* jî rapêşî çavan dibin.

*Rêçika Şêx Evdilqadirê Gêlanî*, tîna xwe li hemû welatêñ misilman kiribû. Xasma li Kurdistanê, li Anatoliyayê, li Îranê, Sûri û Iraqê bi sedan tekye û xwendegeh bi navê *Qadîrî* hatibûne vekirin. Şax û tîrhîn *Rêçika Qadîrî* xwe li van dever û welatêñ li jêrê belav kiribûn:

- 1- Li Yemen û Somaliyê: Esediye, Yafî`ye, Mûşari `Iye û Urabiye.
- 2- Li Iraqê: İsewiye, Hîlaliye, Ekberiye, Xalisiye (Xulûsiye).
- 3- Li Hindistanê: Bênaviye û Gurzmarîye, Xerîbiye.
- 4- Li Anatoliyayê: Eşrefiye, Hindiye, Nabulûsiye, Romiye (îsma îliye) û Westletiye.
- 5- Li Misrê: Ferîdiye, Qasimiye, Erûsiye.
- 6- Li Mexrifîbê: Emmariye, Erûsiye, Bû'aliye, Cilaliye.
- 7- Li Rojavayê Sûdanê: Beqa `Iye.
- Berhemên *Şêx Evdilqadirê Gêlanî* ku niha li holê hene ev in:
  - 1- El Kunye li Terîq-îl Heq.
  - 2- Futûh-ul Xeyb (78 we`zîn ku Gêlanê dane, kurê wî Ebdurezan berev û kîrine mîna pirtûk daye çapkirin).
  - 3- El Feth-ul Rebbanî (Yan jî Sittîn Mecâlis. Ji 60 we`zan hatiye holê).
  - 4- Hîzb û Beşâîr-ul Heyat (Wurdêñ Tewufû).
  - 5- Celal-ul Xatir.
  - 6- El Mewahîbur-Rehmaniye we-l Futûl-ul Rebbaniye Fî Merâtib-îl Exlaq-îl Saniye we-l Meqamat-îl Irfaniye.
  - 7- Yewaqît-ul Hükam.
  - 8- Fiyudat-ul Rebbaniye fi-l Ewrad-îl Qadirîye.
  - 9- Behcet-ul Esrar.
- Lê li gorî danasîna çavkaniyan, diyar dibe ku navêñ van berhemên li jorê hinekî têkil bûne û hin nav dubare, bi

kêm û zêdeyiya hin bêjeyan hatine nivîsandin.

Li gor agahdariya ku çavkaniyên dîrokî didin, *Sêx Evdilqadirê Gêlanî* çewa ku bizanîn, îdrak, kefş û kerametan mirovekî miştî melû bû, herwisan ji aliyê zaruyan ve ji gelekî dewlemend bûye. Lê ew çavkanî tenê behsa navên yazdeh lawên wî yên ku li riya bavê xwe meşiyane dikin û tarîxa mirina wan û devera ku lê hatine bigorkirin nivîsine. Yazdeh lawên Gêlanî ev bûne:

- Isa, 573 (1177/8), Misir.
- Ebdullah, 589 (1193), Bexdad.
- İbrahim, 592 (1196), Wasit.
- Ebdulwehab, 593 (1197), Bexdad.
- Yehya û Muhammed, 600 (1204), Bexdad.
- Ebdurrezzaq, 603 (1207), Bexdad.
- Mûsa, 618 (1221), Şam.
- Ebdulezîz, 602 (1205/6), li gundê Cilaya Sîncarê.

- Ebdurrehman, 587 (1179/80).
- Ebdulcebbâr, 572 (1180).
- Ebdusselâm 548-611 (1153-1215).

Li gorî çavnaniyan; di zemanê *Xelîfe Nasîr* de, malbata *Sêx Evdilqadirê Gêlanî* ji Bexdadê hatiye cihêlkirin. Û di çaxê vegirtina Bexdadê ji aliyê *Mogolan* ve(3), hin kes ji malbata wî di şerî de şehîd ji bûne.

Di sedsala XVI-XVII de, du carênu ku Sefewiyan Bexdadê vegirtiye, *Tekyaya Qadîrî* hilwesandine û xebata wê qedexe kirine. Lê gava Osmaniyan Bexdadê vegirtiye, dîsa destûr ji bo vekirina *Tekyaya Qadîrî* hatiye dayîn.

Nivîskarê hêja *Mihemed Salih İbrahîm Sepûl* nivîsiye (4), ku mamoste *Huseyn Huznî Mukriyanî*, di *Mêjûyî Mîrânî Soran* de gotiye: *Sêx Evdilqadirê Kurd ê Gêlanî* di 475-ê Koçê de hatiye dînyayê, 91 sal temen kiriye û di 565-ê Koçê de jî wefat kiriye.

Pirtûka "Exbar" çapa Lahorê, rûpel: 15-16, nivîsiye ku: *Sêx Evdilqadirê*

*Gêlanî* di 675-676 de ji dayîk bûye, 65 salan xerîkê îrşad bûye...

Xawenî İranşar Cildê yekemîn, rûpela 405 nivîsiye, ku: "Sêx Evdilqadirê Gêlanî, li Gêlana Kîrmansahê çêbûye.

Hafizê Kûrî di "Seyrî Dîmeşq" cild: 12, çapa Bêrûdê 1966, rûpela 302-an de nivîsiye ku: *Sêx Evdilqadirê Gêlanî* kurê Ebû Salih Mihemedî yê Cîlî (Gîlî-Gêlan) di 470 yi de çêbûye. Li cem Ebû Se idê Mexzûmî yê Hembelî Hedîs û Fiqif xwendine; di keşfû kerametê de têr tije bûye û di notsaliya xwe de wefat kiriye".

Mihemed Salih Sepûl dîsa domandiye, ku: "Pîrê Gêlanî berê li ser Rêcîka Hembelî çûye. Beramberî Rêcîka Îmam Safî ï û Îmam Ehmedê kurê Hembel fetwe dane... Û Seyid Tahayê Nehri (Semzînî), ewladê *Sêx Evdilezîz* kurê *Sêx Evdilqadirê Gêlanî* ye."

Di "Silsila Xitme"ya Rêcîkê de ji Mihemed Pêxember (ssxl) û berjê, navê *Sêx Evdilqadirê Gêlanî* di rada şeşemîn de cih girtiye. Pişî Pxember, navê Ebûbekrê Sidiq ï. Li dû wî, Hz. Selmanê Farîsî, piştre *Sêx Mihemed-il Awîsî*, Mihemed Muhyedînê navdarê bi Xewsê E'zem tê û piştre navê Hz. *Sêx Evdilqadirê Gêlanî El Kurdi* cih girtiye.

Basili Nikitin (5) di pirtûka xwe, li binê sernavê "Kurt Mistizmî, Seyhelerin Etkisi" de nivîsiye, ku Rêcîka Qadîrî li navâ eşrîn Kurd rind belay bûye. Sedemê yekemîn; ji ber ku *Sêx Evdilqadir* bi azbata xwe Kurd bû. Derwêştiya kurdî di layê eşîrtiyê de rêxistinî kiriye. Ji ber hindê Kurdistan li gorî cografiyaya eşîretan seranser bi "komikên mistik"ê hatiye vegirtin.

Ansiklopediya Navdaran (6) nivîsiye ku, *Sêx Evdilqadirê Gêlanî* (1078, Geylan-1166, Bexdad) bi "Xewsê E'zem" ji tê naskirin. Ew, yek ji bijareyên Rêcîka Hembelî bû. Xwendina xwe, di medreseyê Bexdadê de temam kiriye. Pişî ku bi *Sêx Ehmed Debbas* re hevnas bûye, içar bûye mirîdê wî. Belam pişti

ku pirtûkên li ser Fizik û Tesewufê nivîsandine, xwe li dîtina *Rêçika Qadîrî* eşkere kiriye. Rêçika ku wî bi xwe damezirandibû, gelekî zû li nava misilmanan belav bûye. Gora wî ya li Bexdadê, iro ji ji aliyê miridîn girêdayê bi Rêçika ku damezirandibû ve gelekî pîroz tête pejirandin.

*Ansiklopediya Mensûrîn Tirk û yên Dinyayê* (7) nivîsiye ku: *Sêx Evdilqadir* (1078-1166), mutesewîfê Îranî û damezînîrê *Rêçika Qadîrî* ye. Li *Gêlana* (*Cilan-Gilan*) li keviya Deryaya Xezerê hatiye dinyayê. Di xortaniya xwe de çûye Bexdadê û li gorî baweriya Şâfiîtiyê medrese xwendîye. Li gor xwerapêçana demê, zanistiya îslamî xwendîye. Piştre li *Rêçika Hembeli* lêkolin kiriye û xwe ji dîtina Şâfiîtiyê veguhaztiye.

Bêguman ev yek eşkere ye ku hin caran berpirsyarên *Rêçika Qadîrî* serokatiya serhildanên Kurd ji kirine. Rêçik bi xwe jî di riya kurdperwertiyê de gelekî destda û têglihişî bûye. Wek nimûne, di Şerî Yekemîn ê Cihânê de û berê jî çewa ku di şerê mabeyna Osmanî û Îngilîzan de, *Rêçika Qadîrî* ji bo Kurdistanê rizgar bike êrifş biriye ser Osmaniyanê xwînrêj. Heta derxistina Bexdadê û hawîdorê wê ji destê Osmaniyan, bi alîkariya wê Rêçika Kurdperwer serkeftî bûye.

#### TÊBINÎ:

- 1- El Mu'cemuz 'zehebî, rûpel: 518. Gil, navê wîlayete Teberistanê ye. Gilî, navê xelkê wir e. Gîlegî, navê zimanê Gêlaniyan e.

Gil-gil, bi kurdiya kevn û bi mana xwe ya fergokî, navê heriyê ye. Îcar li gorî rîwayetan; bajarê Gêlânê timî bi baran e û erda wir timî wek heriyê şil e. Ji ber hindê "gil-gil" ji wî bajarî re bûye nav. Lê di kurmancî de niha "gil" tenê nayê bikaranîn, "gil û giya" bi hevdu re têne gotin.

- 2- Ansiklopediya İslâmî, cild: 1, rûpel: 80. Eynî berhem, cild: 12/I, rûpel: 10.

Ji ber ku di alfabeşa erebî de tûpa G nîne,

bi erebî ji Gêlanê re "Cilan" tê gotin û her wisan jî tê nivîsandin.

- 3- Hulago Xan di 656-ê muherremê (1258) de Bexdadê vegirtiye.

4- "Jînawerê Zanayê Kurd le Cihânê İslamî, Mihemed Salih İbrahim Mihemedî Şepûl, çapxaneya Meharet, Tehran, rûpel: 144.

5- Kürtler, Basili Nikitin, çapa Özgürlikyolu, rûpel: 372.

- 6- Ansiklopediya Navdaran (Arkin) cild: 1, r: 12.

- 7- Ansiklopediya Türk ve Dünya Önlüleri, cild: 1, rûpel: 50.

#### AGAHDARÎ


Di hejmara NÜDEMê ya heftan de, di sernavê nivîsa Zeynelabidin Zinar a rûpela 93-an de, şâsiyek çêbûye. Sernav diviyabû "Şahê Nexşebend û Mewlana Xalidê Kurdi" batibûya nivîsandin, lê bi şâsi "Şahê Nexşebend; Mewlana Xalidê Kurdi" hatiye nivîsandin.

Di nivîsê de behsa *Mewlana Xalid* ji rûpela 93-an dest pê kiriye. Lê behsa *Şahê Nexşebend (Behaeddin Muhemed Buxarı)* ji rûpela 100-î, stûna diduyan dest pê kiriye.

Em ji *Rojen Barnas û Ferhad Shakely* re spas dîkin ku em pê agahdar kîrin. Em ji ber vê şâsiyê, ji xwendevanên xwe lêborînê dixwazin.

# EMPERYALİZM Ú PIRSA KURDAN

(1917-1923)



## A. CANTEKİN

**B**i giştî gel xwe û welatê xwe diparêzên. Ev jî bi saya hêsa netewî dibe. Ne ku meriv bi tenê yê xwe diparêze, herweha meriv çav berdide hebûnên kesên din jî.

Rewşa gelê kurd û Kurdistanê ya iro bi gelek hoyan ve girêdayî ye. Hoya yekemîn kurd xwe bi xwe ne. Eşîrtî rola yekemîn dilize. Eşîrtiyê, serekeşîran hem mala xwe û hem jî mala gelê xwe şewitandine. Nehîstîne ku Kurdistan jî bibe dewletek. Ji hêla din ve gelek adet, ziman û çanda kurdan jî parastine û anfîne ta roja fro.

Piştî eşîrtiyê, gelên pirhejmar, imparatoriyan, misilmantiya erekban, yek jî sosyalîzma rûs û çûnan pêsiya me girtine ku em jî serbixwe û xwedi dewlet bin.

Dema kurd ji êfîşen Saddam ya dawîn 1991 reviyan û hatin serên çiyan, pariyek nan ji destêن hev direvandin.

Kurdistan jî pariyek nan e. Ma kê nexwast ku bixwe! Kê hevûdu nekuştu!

Diroka herî xweş û rast ya ku meriv bi xwe dijiye. Diroka ku hinekêñ din jiyane û nivîsîne, kêm-zêde li gor wan e.

Gelek imparatorîyan dixwastin bibin xwedi Kurdistan û em jî xulamêñ wan. Em xapandin, em berdan hev. Em kirin şah û em dan ber guleyan. Ji ber ku dagirker pirtirin şâ bibin, serêñ kurdêñ başjêdikirin.

Iro jî em xulam in. Me dixapînîn. Ala û tifingêñ xwe didin destêñ me û me dişînîn ser şervanêñ serbixwebûn û dewletxwaz. Me li kuçeyan, di malan de, di girtîgehan de dikujin, dişewîtinîn. Gundan xîra dikin, dişewîtinîn, wek duh çawan bav û kalêñ wan wîrg kirin, ew jî adet û toreyen wan dom dikin.

Kî li paş wan heye? Di 1880 serhildana Ubeydullah de, bi alkariya generalîn Otriş farisan em dikûstîn. Osmanîyan bi alkariya Ingilizan mala me şewitandin. Ev duh bû. Iro jî dirok tê nivîsnê. Em dîsa bi tenê ne. Lê ew bi xwîna me zikê xwe têr dikine! Ev e dirok! Ev e merivî! Ev e mafêñ merivan!...

Ev pirtûka 328 rûpelîn li ser duh e. Ji me re dibêje ku ya ku iro dibe, duh jî bû. Lê bi awayekî din, zemanekî din, alavêñ din û di bin serektiya merivêñ din de bû. Armanca wan her wek xwe ye. Ya me jî. Ew dixwazin em xulamêñ wan bin. Welatê me di bin piyêñ wan de, namûsa me pênc pere be. Em jî dixwazin di mala xwe de, xwedîyê mala xwe bin. Enîvekirî, serbilind, serbixwe û xwendidewlet bin.

Alaya me hebe. Nasnameya me hebe. Pasaporta me hebe. Radyo, TV, rojname û pirtûkîn me hebin. Xwendegehêñ me û zanîngehêñ me hebin. Em bi awayekî serbest herin û werin welatê xwe. Em xwe bi xwe biryar bidin.

Pirtûka M.S.Lazarev bi zimanê tirkî ye û di pirtûkê de ev sernîvisar hene: 1. Kurdistan di tenîsta qırna nû de, 2. Ji nû ve destpêkirina parvekirina Kurdistanê, 3. Di 1918-1920'an de tevgera kurdî, 4. Riya ku diçe Sewrê, 5. Sewr û dongiyêñ wê, 6. Lozan.

Kurdan qasî ku ji Osmanî û Farisan re şer kirine, ji xwe re bikirana, a niha Kurdistan

ê dewleteke serbixwe û dewlemend ba.

Ev pirtûk divê pir baş bê xwendinê. Na-veroka pirtûkê baş bê hînkirinê. Ev hînkirina merivan baş bisidîne û hêza me ji bo welatê me bê rijandinê. Her kesê ku divê ew ji bo Kurdistanê dixebite, divê vê pirtûkê bixwîne. Bi seriyekî zelal li ser her peyvê bisekine. Dagirkeriyê, bindestiyê, sed parce bûyînê û dost û dijmin baş nas bike. Merivtî bazirganî ye. Bixwînin û bibînin.

Serê cihanê yê yekemîn qediyabû û parvekirina cihanê destpêkiribû. Para mezin a hêzpiran e. Osmaniyan bi alîkariya almanan xwîna êrmeniyan vexwaribûn. Kurd wek tiliyan ji hev hatibûn cihêkirinê. Pariyên hêzkêm, xwarina hêzpiran bûn. Daxwazên rûsan, planêng ilgulan yên mezin, dûr û dirêj, armanca wan nîşan dida. İro ji ew dewletên mezin û hinekên din li gor armanca xwe rola xwe dilizin.

Em divê vê ji bûr nekin, ew ne ji bo çavên me yên regbelek, lê ji bo zikênu xwe yên mezin têr bikin têdikoşin. Kurd divê edî vê bizinan.

Dîtina min li ser eşîrtiyê ji hêla îngilizan ve ji bi vî awayî tê bilêv kirin, 'Ji bo her eşfretê dewleteke kurd.' Ji bo vê ji eşîrtî, axatî, melatî, olperestiya Xumeynî û ereban ji me re nabin.

Gelê kurd, ji holêkakirina kevnepelerstî û bi paqijiyeke gişî dikare bigihêje rewseke sax.

Ji bo cih û hebûnen Kurdistanê, Asûristanê û Êrmenistanê pir plan û bêñ kirinê û pir ji xort û bêñ kuştinê.

Sex Mehmedâ Berzencî li dij îngilizan serî hildide. Li Suleymaniye Kurdistana serbixwe saz dike. Pere û pôlan çap dike. Wezfran amade dike û hukîmetê saz dike. Hinek eşîr bi vê sa dibin û hinek li hêla îngilizan li dij Berzencî şer dike. Hukîmet û dewlet xira dibe. Berzencî birîndar dibe û Suleymaniye dikeve. Îngiliz dixwazin kurdan wek xulam bi kar bînin. Ji bo vê ji naixwazin ku pirsa kurdan çareser bibe. Ji hêla din ve ji İttihat û Teraqî bi navê misil-mantiyê kurdan li hember îngilizan bi kar tînin. Tunebûna yekîtiyekê û serekekî, kurd kiribûn titikên (pêlistokên) dagirkeran.

Di ser vê rewşê de, eger meriv bi mêtî ne, lê bi dil biçe ser rewşa eşîrtiya kurdan,

hêstir di çavên merivan de namînin û rohniya çavan ê birije.

Dijminen gelan dîsa bi navê misil-mantiyê kurdan li dij êrmeniyan bi kar tînin. Ji ber vê ji kurd 'hem ji gotê û hem ji ji motê dibin'.

Simko ji dertê holê û ew ji rola xwe dilize. Lê di ci rewşê de û bi ci awayî..

Di vê pirtûkê de listikên tîrkan û dekên wan hene. Çawan kurd xapandine û ew bi kar anîne heye. Ji hêla din ve ji ji her all ve kembîna kurdan, wek organîze, yekîti û nezanîna wan heye. Duh neynika iro ye.

Dewletên xwedîhêz di 1919'an de, li Fransayê di 'Konferansa Parisê ya Aşitiyê' de, welaîten asûriyan, êrmeniyan, kurdan û ereban parve dikin. İro ji tiliya wan tê de heye.

Di 1919'an de, li gor Lazarev leşgerekî Emerika li Rojhelata Navîn tune bû. Lê hebûna zêrê reş Emerika anî herêmê û iro hêza yekemîn e.

Xwendîna pirtûkên dîrokî li ser kurdan qet ji ne gengaz (hêsan) in. Ji ber ku kurd gelekî ku bi sedan perçeye ye. Her perçeyekî daxwazeke xwe heye. Eger ne eşîret, lê gelekî yekbûyî hebûya û çend kesen ku bi xwe û gelê xwe bawer, dikaribûn cografa Kurdistanê biguhartana. Duh hinek eşîret ji bo Kurdistanê û hinek ji ji bo dagirkeran bûn. İro ji rewş kêm-zêde bi vî awayî ye. Eger gelê kurd dixwaze dewleteke kurdan bi navê Kurdistan çêbibe, divê bibin yek; nebin listikên ti dewletan. Xwedî rêtixtin û partî ji bo netewa xwe lê tev têbokişin. Her şer li goşeyê xwe, çend gotinê kêm-zêde nabin hemberên dijminan. Meriv xwe bi xwe dixapîne. Em divê ji dijminan bi hêztir bin.

#### EMPERYALİZM ve KÜRT SORUNU (1917-1923)


(EMPERYALİZM Ü PIRSA KURDAN)

Nivîsar M.S. Lazarev

Ji rûsi wergera tîrki: Mehmet Demir

Weşanen Özge, Enqere-Tirkîc

# SERÎHILDANA KURDAN YA 1880



Ahmed CANTEKÎN

Meriv vê pirtûkê bi dilxwazî û bi birçûneke deraxbilind dixwîne û dîroka demeke cîhanê dijî. Di destpêkê de wiha tê gotinê: Ev lêgerîna bi tevahî li ser serîhildana Şêx Ubeydullah ya 1880 ye. Ev lêgerîn ku di dîroka tekoşîna gelê kurd de gaveke girîng e. Vê serîhildanê ne ku bi tenê hukimetên farisan û tirkân tîrsandine, herweha dewletên îngilistan, Rûsyâ, Otriş û yên din jî tîrsandine.'

Lêgerîn bi çavkaniyan dibin.

Çavkaniyêñ nivîskî li ser kurdan û ji hêla kurdan ve ku hatine nivîsin geleki kêm in. Eger êrmenî, rûs, ewrûpî û yên din nebûna, rewşa me û dîroka me evqas jî baş nedihat zanînê.

Lêger C. Celîl rewşa Kurdistanê ya îro bi ya besê duhemîn ya qirna 19'an ve girê dide. Rewşa gelên bindest wek asûrî, êrmenî û kurdan di navbera du împaratoriyyêñ hov de dibe neynika îro.

Ji hêlekê ve împaratoriya Osmanî û Faris; û hêla din ve serokeşîr, axa û şêxan, jiyana asûrî, êrmenî û kurdan kirine qetran. Karmendêñ herdu împaratoriyan ta 40 bawet baca ji xelkê komkirine. Ev xelk ji hêla xwînmijêñ xwe yên dewlemend ve ji hatine rûçikandinê. Hemû dewlemendan dest di destêñ hev de, pariyê nanê di devêñ gundiyyêñ belengaz de ji jê standine. Nimûne bi nimûne meriv dikare rewşa gelên di navbera herdu împaratoriyan de bibîne. Ev nimûne, ji bo ku meriv ji bo pirsêñ îro re derman bibîne, merivan dewlemend dikein.

Talan, zilm û zordestiya herdu împaratoriyan, axayan, şêxan û serekeşîran ev civata Kurdistanê ya îro ji me re hiştine. Van zilmdaran li ser pişta gundi û belengazan jiyanike şahiyê jiyane û em bindest hiştine.

Împaratoriya Osmaniyan tev destbirakên xwe axa û serekeşîran ji gelên asûrî û êrmenî bacayêñ pir û pir girantir helgirtine.

C. Celîl bi vî karê xwe yê hêja, kelpîcekî zêrînî dide ser dîwarê dîroka kurdan û Kurdistanê.

Çawan ku meriv heta derekê dijîn, împaratorî jî heta heta nikarin bijîn. Di

dawiya Î. Osmaniyan de, gelek gelan ji bo serbixwebûna xwe serî hildan. Dest bi çek ser kirin. Osmaniyan jî bi dek û dolaban hinek eşîrên kurdan berdan hev, hinek jî bi kar anîn. Îro jî neynika rojêن borî ye. Lîstikvanêن duh di bin navekî din de dertêن hemberî me. Her yek kar û barê xwe dike. Yêن jîr, jêhatî, destênhevgor û xwedî maf ber bi serfîziyê diçin. Yêن tirsok, zexel, bêhêvî û ne xwedî maf, dibin temaşevanên dîroknîvisan û bi bin dikevin.

Ev agahdariyêن di çavkaniyêن nû de, xwendina pirtûkê gengaz; zanebûna merivan dewlemendit dikin. Duh bidestênhevgorîna gelên bindest wek êrmenî û kurd, îro jî dertê pêşıya me. Dagirker, xwînmij û mîrkuj yek e.

Hebûna kurdêن binamûs, welatparêz û ku serî li hember dijminan danayain, jiyanake enîvekirî pêşkêşî merivan dikin.

Di vê pirtûkê de meriv biratiya êrmenî û kurdan dibîne. Şervaniya jinêن kurd dibîne. Bi bawerî û hêvî ser kirin, serbixwebûnê tûne.

Qadî û karmandan tîrkan li hemberî pereyan girî berdidan. Ji nexweşîyan bi dehhezarân meriv dimirin. Kurdish ji birçibûnê êrisî ser çalêن gênim dikirin. Di 1880 de jî bi awayekî rêxistinî serî hildidin.

Bindestû ji serbestiyê re avis e. Di 1878'an de li Cizîrê serfîldana Osman û Huseyîn Bedirxanan gelekî girîng e.

Dewleta Osmaniyan derew kirine politîka xwe û bi navê misilmantiyê êrmenî û kurd berdane hev. îro jî ji hemû kurdan re dibêjin ku hûn êrmenî ne.

'..Weliyê Mehabadê Hesen Elî Xan dixwast bi fênekê serekeşîrê Menguran

Hemze Axa bixapîne û bi dest xwe bixwe. Wî goti bû ku Hemze Axa di cejnê de bê ba min û seriyeke li min bixe, ez ê wî biparêzim. *Weli Hesen Elî Xan* destê xwe dabû ser quranê û sond xwari bû. Di ser vê de *Hemze Axa* tev çend siwarêن xwe ve tê serfîldana cejnê. Lê weli *Hesen Elî Xan* bi awayekî bê şeref sonda xwe xira dike û bîryara kuştina *Hemze Axa* û siwarêن wî dide. Hemze Axa wek şeran ser dike û bi ber xwe dide. Lê di dawiyê de tê kuştinê. Weli serê wî yê jêkirî ji serlesgerê artêşa Farisan yê li Urmiyê re dişine.' Hem jî bi navê misilmantiyê.'

'...Şêx Ubeydullah ji Şêx Halîfe Alaskerî re nameyeke gelek girîng dişine: 'Ez ji farisan û tîrkan bêtir bi êrmeniyan bawer dikim. Ji dêlva ku tev faris û tîrkan yekîti çêbikin, bi êrmeniyan re çêbikin hîn baştir e. Ji ber ku faris ji me nefret dikin, tîr jî dixwazin me wek alaveke polîtîka xwe bi-kar bînin. Bira, ez ji te tîka dikim dev ji êrmeniyan berde û bi çavekî xirab li wan nenire. Em kurd tev êrmeniyan dijîn... ji ber ku bâyeren dawîn nîşanî min dan ku em di dest tîrkan de bê tiikan (pêlîstokan) ne tiştîki din in.'

Tu dixwazî dîroka xwe bizanî? Pêşeroja xwe bi xwe helbijêri? Wê demê vê pirtûka hêja hêdî hêdî bixwîne. Sipas

#### SERİHILDANA KURDAN YA 1880

Dr Celîle Celîl

Wergera ji rûsi: Yaşar Abdülselamoğlu  
Weşanen Jîna nû 1

**İsmail Beşikçi û pirtûka wî**  
**"Çend Gotin Li Ser**  
**Ronakbîrêñ Kurd"**

# **Îsmâil Beşikçi**

**Çend gotin li ser  
ronakbîrêñ Kurd**

Lokman POLAT

**M**amoto Ismail Beşikçi, dostekî hêja yê gelê Kurd e. Ew şergerê zanistiyê û rûmeta rewşenbirêñ Tirk e. *I. Beşikçi*, bi têkoşîna xwe ya bi rûmet ve, dagirke-riya Tirkan, şovenî û nijadperestiya *Kemalistiyê* xist ber lingan, wê pûç kir, rûreş kir.

*I. Beşikçi*, ji bo azadiya gelê Kurd bi mîranî şer kir. Wî pênûsa xwe wek çek bi kar anî. *I. Beşikçi*, hemû pirtûkêñ xwe li ser pirsa netewa Kurd û ji bo doza Kurd û Kurdistanê nivisandine. Nêzîkî sîh(30) pirtûkêñ wî hatine weşandinê. Lê

ji alî dadgeha dagirker a Tirk, hemû pirtûkêñ wî hatin qedexekirinê û berhev-kirinê.

*I. Beşikçi* ji deh salan zêdetir di zindanê de raza. Zilm û tebdeyiyeke bêhempa li wî hatiye kirin. Ev zilm û tehdâ, bîr û baweriya *Beşikçi* neşikand. Wî bîr û ba-weriya xwe hîn jî qihûm kir.

*I. Beşikçi*, jiyana xwe amadeyê parastina doza gelê Kurd kiriye. Wî her tim rastiya Kurd û Kurdistanê anîye zimên. Wî li ser cîvaka Kurd lêkolînên hêja kirine, encama wê bi zanistî ştrove kiriye û ew ditin û ramanên xwe eşkere kir û di pirtûkan de jî da weşandinê.

Mirovîn zanistî yêñ Tirk (Bi Tirkî ji wan re "Bilim Adamı" dibêjin), hemû doçent û profesorên Tirk qet li hember îdeolojiya fermî ya dewleta Tirk ranebûne. Wan şerefa zanistiyê ji bo menfeetên xwe yêñ seksî xistin bin lingan. Wan, realita Tirkîyê û rastiya Kurdistanê neanîne ziman.

*I. Beşikçi*, him li dij îdeolojiya fermî ya dewleta Tirk û him jî li dij wan profesorên sextekar têkoşîya. Di wê têkoşîna bi rûmet de, *Ismail Beşikçi* qet teredut nişan neda, tawîz neda. Ew di riya rast de, di riya heqiyê de, di riya zanistiyê de meşîya.

*I. Beşikçi* di dadgehêñ dewleta Tirk de, her tim parastina siyasi ya Kurd û Kurdistanê kir û zagonêñ dewleta Tirk yêñ nijadperest çîrûk kir. Wî di her dadgehê de gote: «*Li gor zagonêñ we, gotina Kurd û Kurdistanê qedexeye. Lê Kurd û Kurdistan heye, rastiyek e.*»

Mejiyên rewşenbirêñ tîrsok û profesorên sextekar li gor îdeolojiya fermî a nijadperestiyê têt şixulandin. Lê mejiyê *I. Beşikçi*, her tim li gor zanistîya îlmî dihat û têt şixulandin. Mejiyê *I. Beşikçi* mejiyêkî azad e, wek cewher e. Wî bi vî mejiyê xwe yê azad, şovenîzma Tirk, nijadperestiya *Kemalist* û derewê çapemeniya Tirkan deşfre kiriye, wan rezîl û ruswa kiriye. Ew bê tîrs û xof û kete zikê niviskarêñ *Kemalist* û hemû

rewşenbirên şovenîst yên Tirk.

*Ismail Xoce*, bi lêkolînên xwe yên zanîstî hîmî îdeolojiya *Kemalîzmê* leri-zand. Wî, di diroka nêzîk de hovîtiyênu ku dewleta *Kemalist* li dij netewa Kurd bi kar anîye hemû eşkere kirin. Hovîti, asîmîlasyon, jenosît û hemû qetliamên ku li dij gelê Kurd, bi destê dewleta komara Tirk hate bikaranînê danî ber çavan.

*Mamoste I. Beşikçi* bi jiyana xwe ya bi rûmet hevkarî û dostaniya xwe bi gelê Kurd da nişandanê. Li cem gelê Kurd cih, qîmet û rûmetâ *I. Beşikçi* pir bîlind e. Di Kurdistaneke azad de, dê heykelên wî bê danîn. Hemû pirtûkên wî dê bêne wergerandin û xwendin. Ji bo ku *Amed Tigris, Cemal Batun û J. Esper* du pirtûkên *Beşikçi* wergerandine zimanê Kurdi, ez wan pîroz dikim.

Ez ê, niha li ser pirtûka *I. Beşikçi* “Çend gotin li ser ronakbîrên Kurd” bisekinim û vê pirtûkê ji xwendevanan re bidim naskînî.

*Amed Tigris û J. Esper, pirtûka I. Beşikçi* ku bi Tirkî navê wê “Kürt Aydını Üzerine Düşünceler” bû wergerandine zimanê Kurdi. Wan navê pirtûkê kirine “Çend gotin li ser ronakbîrên Kurd” Lê, bi a min navê pirtûkê bikirana “Dîtinêni li ser ronakbîrên Kurd” hîn baştıır û rastır bû. Pirtûk 187 rûpele. Di dawiya pirtûkê de 10 rûpel jî Ferhengok e. Pirtûk di nav weşanê *Rewşen*’ê de derçûwe. *Rizgar CİZRE* jî, ji bo çapa Kurdi sê(3)rûpel pêşgotin nivisandiye.

*I. Beşikçi*, di pirtûka xwe da bi zanîstî li ser pîrsîn cur be cur disejkine. Pirtûk bi naveroka xwe ve dewlemend e.

Di pirtûkê de li ser Kurdên ronakbîr (*Rewşenbîr*) yên Îternasyonalist têt sekinandin û rexnên di cî de li wan tê girtin. *Beşikçi* dibêjê ku: «*Kurdan her tim Îternasyonalîzmê* ji bo ku nasnama(hu-wiyeta) xwe ya Kurdi veşîrin, ji bo ku pîrsa xwe bi dijwari neparezin bi kar

anîne.»

Ev gotin rastiyeke û bi her awayî xwe di jiyanê de dide xwiyakirin. Kurdên ku di nav parti û rîexistinê çep yên Tirk de ne (Ku ew bi xwe jî, qorno rewşenbir û politîkacî ne)tim ji xwe re dibêjin “*Em Îternasyonalîst in*” û bi vî tewîri nasnama xwe ya netewayî didine berşedanê.

*I. Beşikçi*, Kurdên Îternasyonalist dike du bes.

1-)Kurdên Îternasyonalist ên komünîst.

2-)Kurdên Îternasyonalist ên İslâmî.

*I. Beşikçi* li ser Kurdên Îternasyonalist ên komünîst dûr û direj disejkine, rewşa wan şirove dike û ji berê, ji salêni çûyi nimûnên berbiçav nişanî xwendevanan dide. *Beşikçi* di pirtûka xwe de, di dema 12 Adarê 1971’ê de ku bi sedan Kurdên şoreşger û welatparêz hatibûn girtin û bi hevre di girtîgeha (Hepixane) Diyarbekirê de bûn, nimûnê dida ku welatparêzê hêja; rehmeti *Edîp KARAHAN* bi yên ku dihatin serlîdana xwe re bi Kurdi diaxifi. Gundiyan jî, bi hev re û bi mirovên ku dihatin serlîdana wan re bi Kurdi dipeyîvîn. Lê, yên ku ji xwe re digotin *Marksîst-Lenînist* di karen xwe yên rojane û di têkiliyêne xwe de bi hev re bi Tirkî diaxîsin.

*I. Beşikçi* di pirtûka xwe de li ser hîsa netewî pir xwes disekinê. Ew, vê pîrsî dike.

Hîsîn netewî ci ne?

Ü bersîva wê weha dide.

«*Hîsîn netewî, bi kurtî, hezkirina welêt, ziman û netewê bi xwe ye. Girêdana mirov a bi nirxên xwe yên netewî ne.*»

*I. Beşikçi*, li ser Kurdên Îternasyonalistên İslâmî jî disejkine. *Ismail Xoce*, ji bo dînê îslamê vê rastîye dide xwiyakirin. Ew dibêjê:

—«*Gelek eşkere ye, ku hemû neteweyen Rojhilata Navîn, ola îslamî ji bo berjewendiyêne xwe yên netewî bi kar anîne. Nêrîn û nêzîkbûna Farîs, Ereb û Tirkan jî li ser vê bingehê ye. Tu dewle-*

*teke musliman, ji bo refeh û berjewendiyên gelên musliman li ola îslamê mîze nekiriye. Her neteweyî berjewendiyên xwe yên netewî, her tim li pêsiya her tigî girtiye. Ola îslamî jî, ji bo ku berjewendiyên xwe yên netewî pêş ve bibe, fireh bike, bi kar aniye. Bi gîstî, têkiliyên dewletên îslamî her weha ne. Ji vê nêrînê re rewşa Kurdan, mînakêke berbiçav e. Perçebûn û parvebûna Kurdan di navenda Rojhilata Navîn de, di navbera dewletên musliman wek Îran, Îraq û Turkiyê de, ne bi tenê kîmasî û serma dewletên îslamî ye. Her weha ji bo tevayiya mirovatiyê jî serme.»*

*I. Beşikçi, li ser qetîma Helepçe disekine û diyar dike ku di konferansa İslâmî de ji bo qetîma Helepçê li Seddam rexne nehatiye girtin.*

Kurdên INTERNASYONALİST ên îslamî jî dibêjin; Em di pêsiya hertişî de elhem-dullîlah misilmanin. Di îslamê de qewmiyet tuneye. Di pîrsa netewa Kurd de, ferqa wan û ên Kurdên Çepêñ INTERNASYONALİST qet tuneye. Kurdên Çep yên INTERNASYONALİST hetanî niha digotin; bila Kurd bisekinin, kîngê çîna karker a Tîrk şoreş kir, sazûmana sosyalist ava bû, wê gavê dê heqê Kurdan jî bidin.

Kurdên INTERNASYONALİST ên îslamî jî dibêjin; kîngê şoreşâ İslâmî çêbû, sazûmana şerîatê saz bû, wê gavê dê edaleta Hz. Omer bikeve jiyanê û dê hengî li kesî zilm û tehda nebe.

Bi kurû, herdu rê jî diçin gundekî.

*Mamoste I. Beşikçi, di vê pirtûka xwe de li ser Kurd û İslamiyete pir dirêj disekine. Di pirtûkê de qala bîranînê Şehîd Musa Anter jî dike û li ser pirtûka wî ya ku navê wê "Hâtiratum-Bîranînê Min" e disekine.*

*I. Beşikçi dibêjê: «Şêx Seîd ji bo Kurdan şehîd ketiye. Şêx Seîd ji bo KURDISTANÊ hatiye şehîdkirin. Ev rastiyen mezin in. Ji ber vê yekê, Şêx Seîd ji bo Kurdan nirxeke gelek girînge. Lî dîvê ev rewş, rastiya hebûna malbata Şêx Seîd jî, ji holê raneke. Tê zanûn, ku malbata*

*Şêx Seîd ji 1925'an vir ve, gelek êş, derbederiyên mezin dîtîye. Lî, herçiqas weha be jî, rastiyek heye, ku neviyên Şêx Seîd ji Şêx Seîd re nebûne xwedî. Kêm an zêde, bi îdeolojiya fermû re bûne yek. Bêguman ev ji bo hinek neviyên wî weha ye. Hinek neviyên Şêx Seîd, xwe dispêrin INTERNASYONALİZMA îslamî û hê jî, ji nasnama xwe ya KURDAYETI direvin....»*

*Mamoste I. Beşikçi, li ser ditin (raman)û livbaziyên (Eylem) PKK'ê jî disekinê. Ew methê PKK'ê jî dike, lê rexne jî digire. Ew rastî û realîta Kurdan û rewşa şerî heqiyê rast diyar dike. Ji bo şerî gerilla û şehadeta wan weha dibêjê:*

—«PKK... dest bi serekî dijwar kiriye û bi awayekî bîryardar şerî xwe didomîne. Têkoşin bi bîryar û îsrar tê domandin. Bi hezaran şehîd hene. Di çiyan, deşt, bajar û zîndanan de têkoşîneke bi zanyarî û bi bawerî berdewam e. Rastiyeke mezin e, ku vê têkoşîne avahîya ruhî ya Kurdan guherandiye. Bi Kurdan ve, civata Kurdan jî bi hawayekî bi lez û bez diguhere. Avahîya ruhî ya Kurdan bi hêz dibe. Dîtina ku li ber xwe dide, dîtina ku sedi sed dixwaze têkiliyê perçê bike; dibe dîtineke sereke û gîşî. Tîrs, ji holê rabûye an jî li ser rabûnê ye. Kurd, ne Kurdên 1960'î û 1970'ye ne, ku stûyê xwe ji her cure zilum û hegeretê re xwar dîkin. Li dij zilum û hegeretê serihildan û têkoşin pir bi lez pêş ve diçê, mezin dibe. Li KURDISTANÊ nîrx û hêjayîyen nû bi pêş dikevin.....

Ji vê prosesê encameke pir girîng derdikeye. PKK, rêexistina herî girîng e, ku bes bi hêza gelê Kurd û bi hêza xwe bawer dike. Sebebê bi hezaran şehûdan û sebebê tevbûna bi hezaran jinan ji bo gerilla yek jî ev e. Hege mirov bawerî bi gelê Kurd neyîne, hege mirov bawerî bi xwe neyîne, bi hezaran şehîd çawan dikarin hebin? Van insanên ciwan, van KURDISTAN ku hê jî li der û dora 20 salan in, van ciwanen ku hêj nebûne 20 salî; ji bo KURDISTANÊ diçin û dimirin. Ji bo netewa

Kurd diçin û dimirin. Ev bawerî, ev mîrxasî encew bawerî bi netewê, bawerî bi hêza netewê hebe, dikare pêk bê.»

Digel pesindayina PKK'ê, mamoste Beşikçi li PKK'ê ji rexnan sigire.

— «....PKK bi qasî ku ûtibar dide zimanê kolonyalîstan, nade zimanê Kurdî. Ev rewşa han qet naşibe sêl û helwesta PKK'ê ku me li jor behs kiribû. Pirtûkeke PKK'ê heye, ku bi giranî li ser pirsên seksiyetê radiweste. Ev pirtûk cara yekem di 1985'an de çap bûye. Navê pirtûkê "Di Kurdistanê de pirsa seksiyetê, Taybetiyen Militanê soregger û jiyana partiyê-Wesanên Serxwebûn". Di vê pirtûkê de, bêtir di nav rôexistinê de, li ser taybetiyen her endamekî PKK'ê divê çawa be, tê rawestandin. Militanê PKK'ê divê ji Kurdistanê hez bike, divê girêdayê netewa Kurd bibe, divê ji bo rizgariya Kurdistanê fedekariyên herî mezin bike û hwd. tê nivsandin. Di tu derê vê pirtûkê de, li ser zimanê Kurdî, ji bo militan û gerillayên Kurd noteke biçûk an ji tiştêkî din tune ye. Wek mînak nayê gotin, ku gerilla û militan çaxa ku bi gel re têkili datînin, bila bi zimanê Kurdî bîpeyivin an jî di wî warî de diqet bikin. Li ser vê pirsê nayê rawestandin. Eşkere ye, ku ev kêmasyeke mezin e. Ji aliyê din ve mirov şâş dimîne, ku qet hewce nedîtine, ku van tiştan bêjin û her tiştîn xwe bi zimanê kolonyalîstan ango tirkî nivsandine.»

Ev tiştîn ku Mamoste Beşikçi dibêjê rastiyeğ e. Divê hemû parti û rôexistinê Kurd, hemû şoresger û welatperwerên Kurd, li ser axaftin û nivsandina Kurdi bi hawayekî ciddî bisekinin.

I. Beşikçi, di pirtûka xwe de li ser rewşa Filistîniyan û têkiliyên wan û Kurdan, li ser welatên sosyalist ên berê û li ser çîna karkerên Tîrkan jî disekine. Ew bi metoda lêkolşîniyê û zanistiyê pirs û pirsgirêkan dinirxîne.

I. Beşikçi li ser neteweperestiyê ji disekine û vê rastiya Kurdan tînê ziman.

— «Di nav Kurdan de kêmasyen hîs û

ramanê şoresgerî, zanabûna helwest û tevgera Marksîzm-Lenînîzmê, tune. Tiştê ku di nav Kurdan de kêm e, hîsên netewî ne. Hîsa netewî, bi têgihiştandina welatparêzî ve encama hemû raman û hîsan e. Taybetiyen ramanê netewî, bi hezkirina Kurdistanê, yekûtiya axa Kurdistanê û taybetiyen civata Kurd, ziman û kultûre ve girêdayî ne. Ev hîsên netewî pêk tînin.»

Di dawiya pirtûkê de nama "Weqifa Azadiya Qisekirinê" û bersîva Beşikçi heye. Beşikçi di nama xwe ya dirêj de dide diyarkirin ku ji bo ci xelata waqfe Dîsa di dawiya pirtûkê de nivisara Uğur Mumcu'yê Kemalist heye. U. Mumcu li ser Beşikçi nivisandiye û rexne lê gititiye. Beşikçi ji bersîva wî daye.

Pirtûka mamoste I. Beşikçi "Çend gotin li ser ronakbirêñ Kurd" wek hemû pirtûkên wî, hêjâyê xwendinê ye û divê hemû Kurd wê bixwîmin.

Ji bo kêmâniya ditünê ku di pirtûkê de hatiye ziman, ez dixwazim bi kurû viya bêjîm. Rexneyên ku di pirtûkê de, mamoste Beşikçi haniye ziman di ci da ye. Lê, divê Beşikçi bi kurtasî ba jî, li ser ew ronakbirêñ(Rewşenbirêñ)Kurd ku(ta ji 1900'i hetanî iro)li nasnama xwe, li huviyeta xwe ya Kurdayetiye xweyi derketîne û ji bo çand, wêje û zimanê Kurdi xebitîne, bisekiniyana.

I. Beşikçi, li ronakbirêñ ku bi esle xwe kurd in, lê li Kurdistiya xwe xweyi derneketine û dernakevin û di nav ronakbirêñ Tîrkan de cîh girtine, mîze dike û dibêjê "Ronakbirêñ Kurda tune ye. Civata Kurdan, civateke weha ye, ku nebûye xwedîyê ronakbiran."

Li gor min, hendik be jî, bi tiliyan bêñ jimardinê jî, di her demê de ronakbirêñ Kurd hebûne. Beşikçi bi xwe jî di pêşgotina pirtûkê de dibêjê; «Mirov nikare civateke bê ronakbirîfikire. Her civatê ronakbirêñ xwe afirandîye.» Rast e û ev rastî ji bo civata Kurd jî dibûre. Civata Kurd jî, wek civatê kolonî yên cihanê kêm be jî, pirr hendik be jî ji nav

xwe ronakbîrên xwe afirandiye.

Ji mamestê mezin *Ahmedê Xanî* bigire, ta mala *Bedirxaniyan*, ji wê ta *Mehmed Uzun*, civaka Kurd her tim ji nav xwe ronakbîrên hêja derxistiye holê. Di dema serîhildana *Sêx Seîd de Fehmiyê Bilal û Dixtor Fuad*, di şerê Dêsimê de *Alîşêr û Beytar Nurî*, evana ronakbîrê gelê xwe bûn û di nav têkoşînê de cîhê xwe girtibûn. Di bûyera 49 kesî de û paşê jî di damezrandinê partî û rêxistinê Kurdan de ronakbîrên Kurd cîhêne xwe girtin. Van ronakbîran ji bo azadiya gelê xwe û rizgariya welatê xwe, ji bo pêşveçûna çand, edeb û zimanê Kurdi bi mîrxasî xebitîne û dixebeitin.

Ku mirov li iñternasyonalîstê çep û İslâmî, an jî li *Cemal Süreya*, *Selahatin Hilav*, *Toktamış Ateş* û bi sedan yên wek wan binêre, li halê wan, li rewşa wan mîze bike, dê bêje ronakbîrên Kurd tune ye. Lê, ku mirov li *Ahmedê Xanî*, *Mala Cemîlpaya*, *Mala Bedirxaniyan*, *Sâid Elçi*, *Faik Bucak*, *Dr. Şivan*, *Nureddin Zaza*, *Cigerxwîn*, *Osman Sebrî* û bi sedan yên din ku li nasnama xwe ya millî (netewî) xweyî derketine û derdikevin, binêre, wê gavê mirov dikare bêje ku; Kêm be jî, bi tiliyan bêj jimartin ji ronakbîrên Kurd hene. Yên ku pirtûka *İ. Beşikçi* wergerandine zimanê Kurdi, ew bi xwe jî du ronakbîrên Kurd in.

Ev rastiyeye têt gotin; Divê ronakbîr beriya herkesî bi êşa gelê xwe bihese û hewl bide ku vê êşê çareser bike. Ronakbîr (Rewşenbîr) agirê gelê xwe yê têkoşînê di xwe de bibîne, ges bike û ji bo guhertina rewşa bedbext pêşengiya gelê xwe bike. İro partî û rêxistinê Kurdan vê rastiyê bi cîh tînin. Ji *Abdullah Öcalan* û *Kemal Burkay* bigire hetanî Hemreş Reso, hemû serok û sekreterên partiyên Kurd di esasê xwe de Ronakbîr in. İro, ronensansa Kurd tê jiyandinê. Di vê ronensansê de mirov dikare rola ronakbîrên Kurd înakar bike. Na!.

İro, Kurdistan û gelê Kurd di pêvajoyeke dirokî de derbas dibe û rone-

sansa xwe dijî. Di her babetû de, di her reng û tewirîn têkoşînê de, bi kurtasî di her hêlê de kar û xebat têt meşandin.

Şerê çekdarî berdewam dike. Di hêla dirok, çand, wêje û ziman de lêkolînên hêja têt kirin. Ma gelo, yên ku van lêkolînan dîkin ne ronakbîr in? Helbet ew ronakbîr in. Di hêla dirokê de ronakbîrên ku lêkolinan dîkin û pirtûk afirandine evin:

*Hasan Yıldız*, *Kemal Burkay*, *Naci Kutlay*, *Ethem Xemgûn*, *Selhatîn Mihotoli*, *Botan Amedi*, *Cemîd Bender*, *İsmail Göltaş*, *Şerefxan Cizîri*, *Welatê Torî*, *Amed Tigris*, *Rohat*, *Malmisanij*, *Azîz Aşan* û bi dehan yên din.

Jibo pêşveçûna zimanê Kurdi, ji bo gramer û rastnivisa Kurdi yên ku lêkolîn û xebat dîkin jî evin; *Mehmed Emin Bozarslan*, *Murad Ciwan*, *Baran Rizgar*, *S. Réving*, *Torî*, *Kaya Muştakhan*, *Feqî Huseyîn Sağnîç*, *A. Balî*.

Jibo pêşveçûna kurte-çirok û romana nûjen a Kurdi, *Mehmed Uzun* û *Firat Cewerî* xebatên pirr mezin kirine û dîkin. Di hêla wêje de, ji bo afirandina berhemêne edebî, çirok, helbest û roman, ev niviskarên ronakbîr dixebeitin.

*Mehmed Uzun*, *Firat Cewerî*, *Naci Kutlay*, *Bavê Nazê*, *Hesenê Metê*, *Lokman Polat*, *Ahmed Huseynî*, *Şahînê Bekirê Sorekli*, *Seyîd Alp*, *Haydar Işık* û bi dehan niviskarên din in.

Ev mînakîn jorîn jî dide xuyakirin ku hendik be jî, ronakbîrên Kurd hene û bi her awayî kar û xebatên hêja dîkin.

## Mîr Celadet Bedir-Xan "Jiyan û Ramana Wî"

سلمان عثمان  
أبوبيه وشان

### المير جلادت بدرخان

«حياة وفكرة»



تقديم الأميرة روشان بدرخان

## Dilower MÊQERÎ

Bîranîna sedsaliya ji dayikbûna Mîr Celadet Ali Bedir-Xan (1893-1951), di nîsana vê salê de derbas bû. Lê mixabin, ev bûyera girîng di taristanê de ma. Tev li ku cîrûskin biçûk li dora wê pêketin; yek ji wan pirtûka "Mîr Celadet Bedirxan, Jiyana û ramana wî" bû. Xwediye vê berhemê Konê Reş, nivîskarekî ji Kurdistana Sûriyê ye. Wî orjînalâ lêkolîna xwe bi kurdî nivîsandiye; lê ji ber mercen sensura

resmî, nivîskar neçar maye ku nivîsa xwe wergerfine zimanê erebî.

Xuya ye ku Konê Reş bîranîna Mîr Celadet, wek berpirsiyariyeke dîrokî û exlaqî daye ser milê xwe. Ewî ligel çend hevalen xwe di sala 1991'ê de bîranîna çilsaliya koçbariya Mîr Celadet li bajare Qamışlo, li dar xistin. Ji bo ku pirtûka xwe bêtir bi bîranînen kesîti xurt bike, nivîskar gelek caran bi Rewşen Xanimê re rûniştibû û dûrûdirêj danûstendin bi wê re kiribû. Rewşen Xanim bi xwe pêşgotineke tenik ji bo vê pirtûkê nivîsandiye, tê de bi gelempêrî û serbilindahî vê xebatê dinirxîne: Ev ked nişan dide ku Mîr Celadet her dem wê di dil û canê kurdan de bijî.

Pirtûk ji du beşan tête pê: Beşa yekem; li ser dîroka Bedirxaniyan û bi taybetî li ser jiyana Mîr Celadet, hûr dibe. Beşa duyem; xebata Mîr Celadet ya li ser alfabeyâ kurdî û rola wî a bêhempa ji bo parastina zimanê kurdî, tîne zimên.

Tevli ku ji bo wergerandina zimanê erebî hinekan jî alîkariya nivîskar kiriye; disan em dibînin ku ristina zimanê pirtûkê, qels hatiye. Xuyaye ku nivîskar di beşa yekem de xwestiye ku jiyana Mîr Celadet mîna çîrokekê bîhûne û pirtûk bi wêneyêñ ji arşîvê xemilandîye. Nivîskar di dawî de dide xuyakirin ku kêmâsi di hevpariya wî de hene û ji rewşenbirêñ kurd hêvî dike ku jiyan û xebata Mîr Celadet di dema pêş de ronî bikin.

Kêmasiyêñ herfi balkêş di pirtûkê de, bi ya min ew e ku têkiliyêna nivîskêr bi pîrsên dîrokî re sist xuya dikin. Mirov dibîne ku çavkaniyêna pirtûkê bi xwe geleki kêm in. Em ê li vir çend kêmâsi û çewtiyêna dîrokî ku di pirtûkê de hatine kirin, raxin ber çavan. Bi hêviya ku nivîskar li ser wan raweste û di çapa pirtûkê ya bi kurdî de rastiya wan binivîsinê.

"Di sala 1247'an de, piştî ku dewleta Eyûbi zora dewleta Zengî bir û dawiya wê anî, hikûmeteke kurdî li Cizîra Botan

*dibin fermandariya malbata Ezîzan, hate damezrandin*" (rûpel 13)... Ger mirov li dîrokê veger, dibîne ku ev tişt çewt e; ji ber ku dewleta Zengî di sala 1173'an de bi destê *Selaheddînê Mezin*, hilweşîya ye û pişû vê bûyera dîrokî mîreka Ezîzan li Cizîra Botan çêbû.(1).

Di rûpela 14'an de, behsa şoreşa *Mîr Bedirxan Paşa* û çawa Osmaniyan bi pirsa olî listine, dike. Bi taybeşî xwestîna wan ku nakokiyê bixin navbera fileh û mislimanan ji bo ku şoreşê hilweşînin. Lê nivîskar behsa ketina fileyên asûrî li bin bandûra propaganda mîsyonerên îngilîzî û amerîkî û bandûra vî tiştî li ser têkiliyên asûrî û kurdan nake. Van herdu welatên rojava ku carna alîkariya Osmaniyan li dijî kurdan, dikirin.(2)

Li eynî rûpeli tê gotin ku Fransa ligel Îngîltîre li hember mîrê Misrê *Mihemed Ali Paşa* rawestiyabûn. Ew yeka han dema ku kurê wî *İbrahim Paşa* êrîş biribû heta nêzîkî paytexta Osmaniyan. Lê ev tişt şas e... Ji ber ku Fransa li Ewrûpayê tenha bû ku piştgiriya Mîrê Misrê dikir. Mirov dikare vê rastiyê di hemî çavkaniyên li ser wê serdemê radiwestin bibîne.

Di rûpelê 16'an de tê gotin ku Osmaniyan *Mîr Bedirxan Paşa* bi navê olê xapandin. Dema ku leşkerên wan rahiştibûn ayetên quranî di pêşîya ordiya xwe de. Û vî tiştî kir ku leşkerên kurdan ji ber hev bikevin. Ji ber ku wan rûmetâ ayetan girtin û êrîş nebirin ser ordiya Osmanî hwî...

Ev bûyera han mirov di tu çavkaniyan de nabîne. Ez nizanim *Konê Reş* li ser çi bingeha dîrokî, ev tiş nivîsandiye?... Li gor ku em dizanîn, ne *Bedirxan Paşa*, lê Kor Mihemed Paşa, yê ku li bin bandûra melayê xwe yê nezan, ketübû. Ew mîrê Rewandozê bû, ku di sala 1831'ê de şoreşke mezin li dijî Osmaniyan li dar xistibû. (3)

Di rûpelê 17'an de hatiye gotin ku di sala 1870'ê de, *Mîr Bedirxan Paşa* çûye

ser dilovaniya xwe. Lê em di hemî çavkaniyên dîrokî de dixwînin ku ew di sala 1868'an de miriye.

Di rûpelê 28'an de tê gotin ku Komela *İtihad ü Teraqî* ya tirk, di sala 1909'an de hate ser hukum û çawa *Bedirxaniyan* li dijî politîka asimilasyonê ya vê hukumetê rabûn. Lê nivîskarê me çewtiyek mezin kiriye gava ku dom dike û dibêje: "Sultan Abdulhemîd baş têgîhişt ku Bedirxanî ranawestin. Edî careke din ew surgun kirin"... Lê ya rast ew e ku Sultan Mihemed Reşad e yê ku *Bedirxanî* surgun kirin. Ji ber ku *İtihadîyan Abdulhemîd* ji xîlafetê avêtibûn û *Mihemed Reşad* di wê demê de wek xelîfe hukum dikir.

Nivîskar dûr û dirêj li ser pirsa ji dayîkbûna *Mîr Celadet* radiweste û dibêje ku gelek caran danûstendin ligel *Rewşen Xanimê* ji bo vê pîrsê kiriye. Paşê ew çend mînakân ji kovara *Hawarê* pêşkêş dike, ku li gor wan dîroka ji dayîkbûna *Mîr Celadet* ya rast, sala 1893 ye.(rûp 46)...

Lê em dizanîn ku *Mehmed Uzun* yekem car bû, di sala 1990'i de ev girîng beriz kiribû û bi çend mînakân ji *Hawarê* û ji notên rojbîranîna *Mîr Celadet* nîrîna xwe bi pişt kiribû.(4) Lê *Konê Reş* qala vî karê *M. Uzun* nake; ligel ku eynî nivîsa *M. Uzun* li cibekî din yê pirtükê wek çavkaniyekî bi cih dike...

Di rûpelê 47'an de tê gotin ku *Emin Ali Bedirxan* dengbêj û nivîskar (çirokbêj) û kesên zane bi zimanê kurdi ji Cizîra Botan dianîn mala xwe ya Stenbolê ji bo ku zarokên xwe fêri zimanê kurdi bike... Eger mebesta *Konê Reş* bi gotina (nivîskar) xoce be, ne rast e ku xoce (mamoste) mîna çirokbêj bihejmære. Lê bi nîrîna me dibe ku ev tevlihevî di navbera peyvan ji wergerê hatibe.

Di rûpelê 49'an de, tê gotin ku di sala 1908'an de gava şoreşa *İtihadî* (Înqîlaba Dîsetûri) çêbû, *Mîr Celadet* cihekî bilind û girîng di tevgera kurdi de stendibû û

carna danûstendinê wî ligel *Komela Jon Türk* ê li bin serokatiya *Mustefa Kemal Paşa* hebû... Bi rastî mirov nizane ji kîjan çavkaniyên dîrokî *Konê Reş* ev tişt wergirtiye... Ji ber ku mirov bawer nake ku xortekî panzdeh-şanzdeh salî di tevgera kurdi ya wê demê de cihekî ewqas bilind û girîng bistîne. Nemaze ku mirov bizanibe ku kesên mezin û navdar mîna *Emîn Alî* û serokên malbata *Bedirxaniya* û hwd berpirsiyariya tevgera kurdi dikirin. Şaşıya mezintir di vê pîrsê de ew e ku *M. Kemal Paşa* ne serokê *Komela Jon Türk* bû, lê komele li bin serokatiya kesên siyasi-leşkerî, mîna *Enwer Paşa*, *Talat Paşa* û *Cemîl Paşa*, bi rê ve diçû. *Mustefa Kemal Paşa* ew generalekî li ordiya Tirkî û Sûriyê, di dema şerê cîhanê ê yekem de, hate holê û piştî şikestina dewleta Osmanî di şer de, *M. Kemal Paşa* li Anadolê wek dijminê *Komela Jon Türk* ê yekem bû.<sup>(5)</sup>

*Konê Reş*: "Gelo ka Fransîzan ci bi dest xistin ta ku li dijî tevgera kurdan ya di bin serokatiya *Xoybûnê de piştigiriya tîrkan kirin*?... Û paşê serokên vê *Komelê* ji sînorê Sûri-Tirkî bi dûr xistin". Nivîskar vê pîrsê pêşkêşî rewşenbirêñ kurd dike û ji wan hêvi dike ku bersiva wê bidin (rûp 54,55)...

Bi rastî metodeke baş e dema ku lêkolînerek bersiva tiştekî nizanibe bibêje û baştir dema ku bi nefşbiçûkî hêviya bersivdayina wê ji kesên din bike. Em ê li gor zanebûna xwe tiştekî li ser vê pîrsê bibêjin: Wek tê zanîn, armanca mezin ya dewletên Hevgirtî (Bi taybetî Fransa, İngiltere û Rûsyâ) ji şerê cîhanê ê yekem ew bû, ku xak û desthilatdariya "Zilamê nexwêş" di nav xwe de beş bikin û ev tişt di peymana Sayx-Picot ya ku di sala 1916'an de, xuya bû. Gava deleta Osmanî di şer de şikest, îcar dewletên hevgirtî ev peymana han mîna serkeftina xwe, dîtin... Fransa, Sûriye û Libnan zeft kirin... İngiltere, Iraq, Urdîn û Filîstîn bi dest xistin û bi qasî nîvê xaka Kurdistan, kete destê Rûsyâ. Lê du

tiştan plana dewletên Hevgirtî tevlihev kir: *Şoresa Bolşevîkan* û tevgera *Mustefa Kemal* li Anadolê, ya ku *Xilafeta Osmanî* ji holê rakir. Fransa û İngiltere, bi dû van herdu bûyeran, ji eniyeke sor di navbera Bolşevîk û tîrkan, tîrsiyân. Rejîma Tirkîyê ya nuh ne tenê leşkerên fransî neçar kirin ku ji herêmê Kilikiye, derkevin... Lê belê alîkariyek xurt bi şoreşvanenê ereb, kurd û tîrkmen yên ku şerê partîzânî li bakurî Sûriyê li dijî stemkariya Fransa dikirin; dikir. Eđî ji bo ku bikaribe Fransa tevgera wan şoreşvanan rawestîne, neçar ma ku peymanan ligel tîrkan deyne û komara Tirkî razî bike. Herweha li gor van peymanan, Fransa alîkariya Tirkîyê kir, ku tevgera Kurdistanâ bakur, rawestîne û endamê *Komela Xoybûnê* ji ser sînorê Sûri-Tirkî dûr bike û wan endaman li Şamê bicîvînin ji bo ku bin çav bike. Tirk ji alîkariya xwe bi şoreşvanenê Sûri re birî û ji ber vî tiştî *Ibrahim Henano* serokê şoreşa bakurî Sûriyê neçar ma ku çiyayê Kurmênc berde û here Urdînê.<sup>(6)</sup>

Nivîskar sedema peywendiyan baş navbera malbata *Bedirxanî* û malbata *Haşîmî* ya ku fermanدارiya Urdînê dike, vedi-gerine yekîtiya olî.(rûp 60).

Bi rastî ev sedek pir sist û bê bingeh e. Em li vir dipirsin: Ma gelo hemû dewletên ku Kurdistan dagir kirine, ne ji wê ola "pîroz" in?!

Wek tê zanîn malbata *Bedirxanî* her dem li hemberî Osmanîyan şer kirin û di dema şerê cîhanê ê yekem de, İtihadiyan çend kes ji vê malbatê surgunî Yemenê kirin. Li wê derê tekiliyên wan ligel *Serîf Huseynê Hayîmî*, serokê tevgera erebî ya li dijî Osmanîyan re çêbû. Ji wê demê û pê de peywendiyan herdu malbatan bi hev re dest pê kir.<sup>(7)</sup>

Wek me berê jî got, beşê duyem ji vê pirtûkî li ser xebata *Mîr Celadet* ji bo amadekirina alfabeşa latinî û vejandina zimanê kurdi, hûr dibe. Nivîskar dest bi vê beşê dike bi çîroka ramana alfabeçeyê û çawa bi awakî li hevkatinê di sala

1919'an de *Mîr Celadet* re çêbû. Lê bi baweriya me gereke nivîskar vê pirsê bêtir, bixebitiya û li dîrokê vegriya. Ji ber ku ramana guhertina alfabeteyê ji tûpên erebî û amadekirina alfabeteyeke bi tûpên latîni, berî dema *Mîr Celadet* bi gelek salan dest pê kiribû. Wek tê zañîn mîsyoner û zimanzanê itâli *M. Garzonî*, yê ku di navbera sala 1764-1782'an de, li Kurdistanê geryabû, gava ku ew vegeviya welatê xwe, wî ferhengeke itâfi-kurdî bi alfabetaya latîni çap kir. Paşê em dizanin ku Salih Bedirxan ji (bavê Rewşen Xanim) behsa pêwistiya guhertina alfabetaya kurdî di çend gotarêñ xwe de kiriye. (8)

Di rûpelên 141, 142'an de tê gotin ku: "Kurdên wê demê yên ku dikarîbûn kurdî bixwînin li ser tiliyan dihatin hej-martin." Tiştekî rast e ku xwendevanê wê demê kêm bûn; lê ne wek ku nivîskar têgihiştiye û aniye ziman. Belkî haya *Konê Reş* jê tune ye ku di wê demê de çend dibistanê kurdî hebûn. Di çavkaniyêñ dîrokî de mirov dibîne ku bi taybetî li Şamê bi bîstan xortêñ kurd hinî zimanê kurdî dibûn. Lê mixabin pirtûka me qet behsa dibistanan, komele û kulübêñ kurdî yên wê demê nake. Yek ji sedema vî tişî, bi ya min ew e ku dokument û çavkaniyêñ nivîskar gelekî hindik in. Bi rastî pirtûkek li ser jiyaneke ewqas dewlemend mîna jiyana *Mîr Celadet* bi şes-heft çavkaniyêñ dîrokî têr nake. Ligel rûmeta me ji *Rewşen Xanim* û kesên din yên ku nivîskar danûstendin bi wan re kiribû, heye, lê xwezî *K. Reş* danûstendin ligel wan kesan ku li Şamê berpirsiyariya komele, klub û dibistanê kurdî kiribûn; bikira. Bi vî tişî wê ev berhem dewlemndit bibûya...

Di dawî de em dixwazin bibêjin ku armanca me ji şirûva van kîmasiyan ew bû ku em xwendevanan agahadar bikin û hêvîdar in ku nivîskar dema amadekirina çapa kurdî ya vê pirtûkê, hay ji wan kîmasiyan hebe. Em dizanin ku amade-

kirina pirtûkeke xwerû li ser jiyan û ramana Mîrrewşenbîriya kurdî xebateke pir zehmet e. Ji ber vê yekê Konê Reş bi nêrîna me karekî pîroz kiriye.

#### Çavkanî:

- 1- Li ser vê bûyerê binêre: M. Emin Zekî, Kurtahiya dîroka kurd û Kurdistan, çapa erebî 1939-Qahire, rûp 156.
- 2- Kendal Nezan, Kurd û Kurdistan (komeleke lêkolîneran), çapa erebî 1982-Beyrût, rûp 43.
- 3- Li ser herdu şoreşan, binêre: C. Celîl, Ji dîroka mîrekêñ kurdî, çapa erebî 1986-Şam.
- 4- Berbang, No 68, 1990-Stockholm, rûp 15
- 5- Li ser vê pirsê, binêre: Z.N. Zeyn, Peydabûna netewa erebî, 1972-Beyrût. C. Celîl, Jiyana rewşenbîri û siyasi ya Kurdistan, çapa erebî 1984-Şam.
- 6- Li ser vê pirsê binêre: H. Hekîm, Dokumenten dîrokî yên doza Sûri (1919-1946), 1974-Beyrût. Y. Al-Hekîm, Sûriye û stemakariya Fransî, 1983-Beyrût.
- 7- M. Şelîta û Y. Melek, Bîranîna Mîr Celadet 1953-Beyrût, rûp 10.
- 8- Li ser vê pirsê, binêre: E. Şemo, Li ser pîrsa feodalîyê li li nav kurdan, çapa erebî 1977-Bexda, rûp 30. C. Celîl, Jiyana rewşenbîri (çavkaniya pêşî), rûp 55.

**Konê Reş**  
Lêkolîn, 173 rûpel  
Çapeke taybetî, 1992-Şam

## Romana M. Bakṣî "Hêlin"



### Medenî FERHO

**H**êlin, romana *Mahmût Bakṣî*, jiyana mamosteyekî welatparêz e. Mamoste ne bi galgalê, ne bi şorêna nava heval û hogirêna xwe, ne bi dev tenê welatparêz e; ne bi tenê şoreşgerê ser masan e. Ew jiyana xwe hin bi mamostetiyê bo debara xwe û abora mala xwe, hin xebata netewî; tevgera yekbûn û şiyarbûnê li nava gundî û gelê xwe dike. Xebateke bîrewer û zanîn, bi armanceke bilind û pîrozî dimeşîne. Ew di sala 1980'ê de tê girtin. 12'ê ilonê ye... Lê ne ew bi tenê; jina wî, zarkêna wî, cîranêna wî, xal û apêna wî, gundiyanê wî û hwd...

Bingehê romanê li ser mamoste û aîla wî hatiye ava kirin. Lê, çîrok ya wan rojêñ reş û dirêj li Kurdistanê ye. Nîrengiya romanê aîle ye; ku di şerê welat de ye. Qehreman rewşenbîr e, ronakbîr e... Daxwaza wî bo gelê kurd nasîn, hebûn, şiyarbûn, rêxistin û bi van berheman, ji bo li xwe xwedî derbikeve. Dawî jin û zarokêna wî jî xwe di nava şerê netewî de dibînin. Rewşa 1980, dîroka nêzîkwext e. Em tev pê dizanîn û bi wan rojêñ reş û dirêj bi qismet û xwedî par in.

Di destpêka romana *Hêlin* de, *Mahmût Bakṣî* li xwe maye heyirî. Merivekî mîna wî hunermend, ji bo ci wisa qutbir dest pê kiriye ez nizanim. Xweş dizanîm ku *Mahmût Bakṣî* di alî nivîsandinê de pirr zana û zîrek e, kevnare ye. Li xwe û li destpêkê namîne heyirî. Ku çîrokvan, qewlvanê civatan bianiyan bîra xwe, ez guman dikim, wişa di destpêkê de ew hevok bi kar nedianî. Ji ber ku çîrokvan û qewlvan li gotinên pêşî qet namînin heyirî. Ew hoste ne. Di jiyana însan de, psîkolojiya guhdariyê pirr xweş dizanîn, bi destpêka salifan de rewşa destpêkê tînin. Zimanê peyvê û nivîsandinê çiqas ne wek hev bin jî, çîrokvan berhemâ destpêkê pirr girîng digire. Pirr nivîskarêna dînyayê li ser vê sedemê sekinî ne, bi hezaran hevok nivîsi ne, li hevdu rexne girtine. *Mahmût* di beşa pêşî de mîna gotina min dest pê kiriye, lê mixabin, beşa pêşî derî romanê ye. Haziriya romanê ye... haziriya nîrengiya romanê ye. *Mahmût* jî hoste ye. Dizanîm... Wî xweş nas dikim... Beriya nîvemreki...

Pirtûka *Mahmût* mîna epîk/destanîn

12'ê ûlonê ye. Bi çîrokî û dîrokî... Netewî ye... Xwendevanan tûne ser hiş, bîr û baweriya wan dibişkivêne, qewin dike.

"Min rojekê ji bavê xwe pirsî:

- Bavo, çima em bi zimanê xwe dersê nabûnîn ? Ji bo ci pirtûkên kurdî tune ne ?

Bavê min bersiva min da û got:

- Zimanê me qedexe ye keça min. Em kurd in. Ji bîr neke.

Gotina bavê min neket serê min." (Hêlin, rp. 31)

Ev gotin, ne gotine "ha yalla" ye, ku hatiye nivîsandin. Serpêhatî û berpêanîna *Mahmut Baksî* ya jîr û zana ye. Ev di jiyana pirr zarokên kurd de derbas bûye. Erê bavê her gedê kurd ne mamoste ye, lê pirraniya kurdan dilşewat û dilxwazê welatê xwe ye. Ji hebûna Tirkîyê û bi vir de 27/28 serîhîdan çêbûne. Di dîroka tu gelên din de, tiştekî wisa çênebûye. Sala duduwan ku ez çûme dibistanê, mamosteyê me tirk bû. Li ser textê reş "Her bijî ew kesê bêje ez tirk im" nivîsibû. Dawiya belavbûna zarokan, min ew gotin ji ser textê reş xera kir û "Her bijî ew kesê bêje ez kurd im" nivîsi. Gava adînî roja mamoste ew nivîs li ser text dît, em tev dane ber daran. Hem li me dida, hem dipirsî "Kê ev gotin nivîsî ye?"... Du kesan dizanîbû'... Yek apê min, yek jê jî min... Ev şîret jî apê min li min kiribû, da ez li têxt wilo binivîsinim. Ew nivîs ne bi devê min, lê bi destê min bû. Îcar gotina Mahmut ne gotineke ku di nava nivîsandinê de, li berdewam û tevgîra nivîsandinê de derketiye hole. Bizanîn û bi armanc daniye nava xeberdana

qehremanê xwe.

Beşen romanê kin in, hevok kin in. Xwendina rewşa nîvîsandina wî yekî digire, dipêçe, dikişîne... Yekî aciz nake... Yekî bi germî û şeranî girê dide. Gotinin ji ên Mahmut pirr xweş in. "Teklîfa diya min wek bizotên agir diket dilê min." Ew mîna hozanê ku li ber gotinan rûnê û hoste necarê bike, ew zîvkerê gotinan e.

Jiyana kurdan bi her alî qal dike: "Li Kurdistanê zewac meslekek girîng û pirr bi mesref e. Bûk anîn tiştekî zehmet e. Merev gerek qelen bide bavê keçan. Pirr caran keç û xort hevdu direvînin û winda dibin. Keçrevandin ne tiştekî hêsan e. Bav û birayêñ keçan tolê li erdê nahêlin û xwînê dirjînin. Mesele dibe mesela namûsê." (Rp. 33)


Jiyana gelê kurd zor e. Ne bes dewleta Tirk!... *Mahmut Baksî* neçariya xwezayî jî ji bîr nake. Berf e, teyrok e, lehî ye, şape ye, xweli ye ku li rezan dibare, gezo ye ku li werza dikeve; zivistana herî asê ye; dar tune ne, sar e, rê girtî ne, kuştine, eşîrtî ye û bwd...

*Mahmut Baksî* di romana xwe de her kes e, her tiş e: Bavo ye, dadê ye, Emo ye, Hêlin e, Azad e, Pîrik e, Xalo ye, tiving e, qaçaxçî ye, ber e, tirs e, şev e, tavehîv e, mayîn e, bêçareti ye, feqîri ye, xurtî ye, betlandin e, êş e, qolinc e... Ew di nava avahiya pirtûkê de ye... Bi kurtî ew kurdistana bindest e. Kurdistana di şerê netewî de ye. Kurdên perçiçî û serîhîdayî ye. Ev rewşa ha, romanê mîna ava li herik dimeşîne. *Mahmut Baksî* hoste necariya xwe pirr xweş daniye ber çavan...

## Kurtebibliografiyeke Edebiyata Kurdi bi zimanê Fransî

---

Amadekar: Ferhad PIRBAL



**E**m Kurte Bibliografiya, tenê beşekî keme lew berhemaney (pertûk û witar) ku bi zimanî Ferensi li ser edebyatî Kurdi bilaw bûnetewe, lê beşekî giringe.

Min awatexwazim ke em kurte bibliografiya, ji bo ew xwêndkaraney ke xoyan fêri zimanî Ferensi diken, herweha ji bo ew nivîskare Kurdaney ke Ferensi dizanin (le Kurdistan yan le xerîbî da) tiştekî sûdbexîş bêt.

Très peu de français connaissent l' existence de la littérature des Kurdes divisés, depuis 1923, entre la Turquie, l' Iran, l' Irak, la Syrie et L' URSS.

Cette petite bibliographie, qui rassamble uniquement les œuvrages (ou les articles) les plus représentatifs, ne pretende pas, bien sûr, donner une bibliographie exhaustive de tous les œuvrages et articles sur la littérature kurde. Nous espérons quand même qu' elle sera utile à tous ceux qui s' interressent aux Kurdes.

1- Kamuran BEDIRXAN : La lyre Kurde, vers en français d' un poète Kurde, éd. Saint-Germain-Des-Pres, Paris: 1973. 136 pages.

2- Kamuran BEDIRXAN et LUCI Paul-Marguraitte: Etudes sur la poésie kurde, éd.

Berger-Lerault, Paris: 1937.

3- Kamuran BEDIRXAN: La Qauestion Kurde, Vogue, 176, Quai jammapes, Paris 10e, Paris: 197?. 16 PAGES.

4- Kamuran BEDIRXAN: Le Roi du Kurdistan, Roman épique Kurde, traduit du Kurde par l' auteur et Adolphe DE FALGAIROLLE, Aux éditions de Trésor du siècle, Paris: 1938?. 84 pages.

5- Kamuran BEDIRXAN: Le Cavalier du Kurdistan, vers français d' un poète Kurde, I. R. A., Paris 5e.; 195?. 27 pages.

6- Kamuran DEDIRXAN: La neige de la lumière, Poèmes Kurdes traduits par l' auteur, 2me édition, , Paris: 1968.

7- Le prince Sureya BEDIR-KHAN: La Littérature populaire et classique Kurde, XVI Congrès Internationale d' Anthropologie, Imprimerie Médicale et Scientifique, Bruxelle: 1936. 8 pages.

8- Joyce Blau: Textes Kurdes Kurmandjîs, ( Têkstên Kurdî - Kurmancî ), Wiesbaden: 1968.

9- Joyce Blau: Le Kurde d' Amadiya et du Djabal Sindjar. ( Kurdiya Amêdê û Cebel-Sincarê; vekolîna zimannasî; têkstên folklorî; ferhengok ), Analyse linguistique, textes folkloriques, glossaries, Paris: 1975. 254 pages.

10- Joyce Blau: Les perles d' un Colliers , Textes kurdes; ( Mirwarîn gerdanê, têkstên Soranî ), Paris: 1981. 95 pages.

11- Joyce Blau: Mémoire du Kurdistan, Etudes et textes classiques et contemporaines, ( Biranîna Kurdistâné, Vekolîn û têkstên klasîk û nûdem ), éd. Findakly, Paris: 1984. 224 pages.

12- Joyce Blau: Contes Kurdes ( Hekayetên Kurdî ), collection " Fleuve et Flamme ", Paris: 1986. 169 pages

13- Joyce Blau: Trois textes de folklore Kurde ( sê têkstên folklorîkên Kurdî ), in Correspondance d' Orient etudes, Paris: 1980; pp. 29 - 50.

14- Joyce Blau: " La Littérature Kurde ", " Ereb ŞEMO ", " Ciger Xwêñ ", " GORAN ", " Hêmin ", " Ehmedî XANî ", " Hacî Qadirî Koyî ", " La revue Hawar ", in Dictionnaire des Littératures - Larousse, Volume 1 - 2, Paris: 1985, pp. 298, 458, 642, 697, 832, 847, 688.

15- Joyce Blau: Les Kurdes et le Kurdistan, Bibliographie critique 1977 - 1986, Edition PEETERS, Paris: 1989.

16- J. R. BLOCH: La nuit Kurde, Roman, éd. Bible, Paris: 1946.

17- Thomas BOIS: " Un Poète Kurde contemporain, Cegerxwîn ", in Roja Nû, N° 53, Bayrouth: Août 1945.

18-Thomas BOIS: " Coup d' œil sur la littérature Kurde ", in Al - Ma-chriq, Revue Catholique Orientale, PP. 201 - 240, Bayrouth: Mars- Avril 1955.

19-Thomas BOIS: Connaissance des Kurdes, chapitre 9 et 10, PP. 113 - 140, ed. Khayat, Bayrouth: 1965.

20-Thomas BOIS: " Kurdes et Kurdistan, La Presse et la littérature ", in Encyclopédie de l' Islam, T. 5., KHE - MAHI, Paris: 1986.

21-Thomas BOIS: " L' âme des Kurdes à la lumière de leur folklore ", in " Cahiers de l' Est, Bayrouth: 1946, N° 5, PP. 56 - 80, et N° 6., PP. 79 - 104 "; tirage à part, Bayrouth: 1946.

22- A. BRUNEL: Gulusar, Contes et Legendes du Kurdistan, éd. SFELT, Paris: 1946.

23-Gérard CHALIAND: Anthologie de la poésie Kurde, éd. Stock, Paris: 1980.

- 24- Ernest CHANTRE: Recueil de Notices et Récits Kurdes, Saint-Pétersbourg: 1860.
- 25- Jean DURING: Musique et Mistique dans la tradition Iranienne, Paris: 1990.
- 26- L. GARIBIAN: " Les Kurdes de l' Arménie Soviétique ", in Temps Nouveaux, N° 34, Paris: 1949.
- 27- Clément M. HUART: " Prière Coranique Musulman, Poèmes didactiques en langue Kurde ", in Journal Asiatique N° 3, Imprim. Nationale, Paris: 1895.
- 28-A. JABA: Recueil des Notices et Récits Kurdes, Saint- Pétersbourg: 1860.
- 29- Roger LESCOT: " Littérature Kurde ", in Encyclopédie de la Pléiade, Histoire des Littératures, Vol. 1., PP. 795 - 805, éd. Gallimard, Paris: 1977.
- 30- Roger LESCOT: Textes Kurdes, 1er partie: Contes, Proverbes et Enigmes, Paris: 1940, 2eme partie: Mamé Alan, Bayrouth: 1942.
- 31- Roger LESCOT: Proverbes Kurdes, dans Revue des Etudes Islamiques, Cahier 4, PP. 307 - 350, Paris: 1937.
- 32- Roger LESCOT: " La presse Kurde ", in Roja Nû, Bayrouth; Lundi: 3 Mai 1943.
- 33- LUCI Paul-Marguraitte et Kamuran BEDIRKHAN: Etudes sur la poésie kurde, éd. Berger-Lerault, Paris: 1937.
- 34- Kamal MAAROUF: Les Lurs, Le Luristan et le poète Baba Tahir Hammadâni; le début de la littérature Kurde, Paris: 1989.
- 35- Kamal MAAROUF: La vie et l' œuvres du poète Dildar, Pzaris: 1989.
- 36- G. MICHALIAN: La musique kurde, Hawar, N° 10, 23 Oct. 1932; p. 7.
- 37- V. MINORSKY: " Kurdes et Kurdistan, La Littérature Kurde " in Encyclopédie de l' Islam, T. 2., E - K, Paris: 1927.
- 38- J. DE MORGAN: Mission Scientifique en Persse, Vol. 2., Paris: 1904.
- 39- Muhemmed MOKRI: Recherches de Kurdologie, Contribution aux Etudes Iranienes, Librairie Klincksieck, Paris: 1970.
- 40- Muhemmed MOKRI: La légende de Bijan et Manija, Versiion populaire du Sud du Kurdistan, textes établis, introduction, traduction,- Librairie Klincksieck, Paris: 1966.
- 41- Muhemmed MOKRI: L' Esotérisme Kurde, Aperçu sur le secret gnostique de Fidèles de Vérité, éd. Albain-Michel, Paris: 1966.
- 42- Muhemmed MOKRI: Le Secret Indicible et La Pierre Noire en Persse dans la tradition des Kurdes et des Lurs Fidèles de Vérité ( Ahlî Haqq ), Librairie Orientale H. Samuelian, Paris: 1968.
- 43- Basil NIKITINE: " La poésie lyrique Kurde " in Ethnologie, N° 45, Paris: 1950.
- 44- Basil NIKITINE: Les Kurdes, cité pour La Littérature Kurde, Ch.12., PP. 255 - 297, Edition d' Aujourd' hui, Paris: 1959.
- 45- Basil NIKITINE: " Ria Taze, Journal Kurde d' Erivan en U.R.S.S. ", in L' Afrique et l' Asie, N° 43, Paris: 1958.
- 46-Yachar KEMAL: Entretiens avec Alain BOSQUET, Gallimard, Paris: 1992. 175 pages.
- 47- Père Ô: Contes du Kurdistan, ed. Poésie vivante, Genève: 1985. 85 pages. 12 contes.
- 48-Pierre RONDOT: " Publication Kurde en Caractères latins " Hawar"- Revue bimensuelle: Damas 1932 - 1933 ", dans Bulletin d' Etudes Orientales de l' Institut Français de Damas, T.2., P. 3 - 8., Damas: 1933.
- 49-Pierre RONDOT: " Les émissions littéraires de langue Kurde de Radio- Le Caire

- et leurs representations ", dans L' Afrique et l' Asie, N° 44, Paris: 1958.
- 50-Pierre RONDOT: " L' Alphabet Kurde en caractères latins d' Arménie Soviétaire ", in Revue d' Etudes Islamiques, Cahier 3, Paris: 1933; p. 411 - 417.
- 51- L. RAMBOT: Les Kurdes et le Droit, Les éditions du CERF, Paris: 1947.
- 52- Ereb SHEMO: Şivanê Kurde ( Le Berger Kurde ), Deux récits Kurdes traduits en français par Basil NIKITINE, éd. Institut Kurde de Paris, Paris: 1990.
- 53--TAWUPAREZ: Melayé Djezrî (un poète Kurde, sa vie et ses œuvres ), in Hawar, N° 35, Damas: Nov. 1941.
- 54- WIKANDER Stig: Recueil des textes Kourmandji, éd. Wiesbaden otto Harrassowitz, Uppsala: 1959.
- 55-Nouredine ZAZA: Contes et poèmes Kurdes, ed. peuples et création, imprimé en Italie: 1974. 64 pages; 7 contes et 7 poésies.
- 56-Nouredine ZAZA: Ma vie de Kurde, éd. P.-M. FAVRE, Suisse: 1982.
- Bibliografija po Kurdovedeniju, établie par J. S. Musaelijan et publiée, sous les auspices de l' Académie des sciences de l' URSS., aux éditions V.L., Moscou: 1963, 184 pages. 2 690 titres, depuis le 17me siècle sur les Kurdes et le Kurdistan dans les langues européennes.
- I.S.K. 's Kurdish Bibliography, éditée par Silvio Van Rooy et Kees Tamboer, International Society Kurdistan, Amstrdam:1968; 2 volumes. A et B, 656 pages. 9 350 titres en différentes langues.

## II

Celadet BEDIRXAN:

TRADUCTION EN FRANCAIS ( seulement numeros 10 - 16 et 24 - 57):

- 1 - Le beau de la steppe, ( le texte original kurde publié dans le N° 3 de la revue ); avec une introduction sur les chansons folkloriques kurdes, N° 24, p. 10 -12, N° 25, p. 15 - 16, le 1 Avril et le 19 Aout 1934.
- 2- Lavje, avec une introduction sur Lavje, N° 25, p. 11 - 15, le 19 aout 1934.
- 3- suite de Memé Alan, N° 27, 15. Nisan 1941; p. 14- 16.
- 4- Notices sur la littérature kurde et les coutumes kurdes, Memé Alan ( 15 ), N° 28, 15 mai 1941, p.15 - 16.
- 5 - Memé Alan ( la partie d' echecs ), N° 36, 1 Decembre 1941, p. 14 - 16.  
( a suivre )
- 3 - Hirkol AZIZAN: Çiroka Bingolé, N° 11, le 10. 11. 1932; p. 6. Traduit en français et publié dans le même numero; p. 7.

## LES CONTES

- 1 - çirokbêj: Mar û mirov ( le serpent et l' homme ), N° 6, le 08. Tebax 1932; p. 3 - 4. Ce cont est traduit en français et publié dans le numero 7 de la revue; p. 8.
- 2 - çirokbêj: Dik û Rûvî ( le coq et le renard ), N° 6, 08. Tebax 1932; p. 4. Traduit en français et publié dans le numero 7, p. 8.
- 2 - Celadet BEDIRXAN: Memé Alan, N° 10, 23 Oct. 1932, p. 6.
- 4 - Herkol Azizan: O sans maison, N° 10, 23 Oct. 1932, p. 7 - 8.

- 6 - Celadet BEDIRXAN: Memé Alan ( episode 3 ), N° 11, 10 Nov 1932, p;11  
 7 - Celadet BEDIRXAN: Memé Alan, N° 12, 27 Nov 1932, p. 7.  
 9 - HEWIN: Le nombre des repas chez les kurdes, N° 13, 14. 12. 1932, p. 8 - 10.  
 10 - Herkol Azizan: Deux variantes ( Xec ù Siyamend ), N° 14, 31.12.1932; p. 6 -

7.

## 12 - Celadet BEDIRXA

### Kamuran BEDIRXAN :

- 1- Kamuran BEDIRXAN : La lyre Kurde, vers en français d' un poète Kurde, éd. Saint-Germain-Des-Pres, Paris: 1973. 136 pages.  
 2 - Kamuran BEDIRXAN et LUCI Paul-Marguraitte: Etudes sur la poésie kurde, éd. Berger-Lerault, Paris: 1937.  
 3 - Kamuran BEDIRXAN: La Qauestion Kurde, Vogue, 176, Quai jammapes, Paris 10e, Paris: 197?. 16 PAGES.  
 4 - Kamuran BEDIRXAN: Le Roi du Kurdistan, Roman épique Kurde, traduit du Kurde par l' auteur et Adolphe DE FALGAIROLLE, Aux éditions de Trésor du siècle, Paris: 1938?. 84 pages.  
 5 - Kamuran BEDIRXAN: Le Cavalier du Kurdistan, vers français d' un poète Kurde, I. R. A., Paris 5e.; 195?, 27 pages.  
 6- Kamuran DEDIRXAN: La neige de la lumière, Poèmes Kurdes traduits par l' auteur, 2me édition, , Paris: 1968.  
 1 - Le prince Sureya BEDIR-KHAN: La Littérature populaire et classique Kurde, XV1 Congrès Internationale d' Anthropologie, Imprimerie Médicale et Scientifique, Bruxelle: 1936. 8 pages.

### Joyce BLAU:

- 1 - Joyce Blau: Textes Kurdes Kurmandjîs, ( Têkstên Kurdi - Kurmancî ), Wiesbaden: 1968.  
 2 - Joyce Blau: Le Kurde d' Amadiya et du Djabal Sindjar. ( Kurdiya Amêdiê û Cebel- Sincarê; vekolîna zimannasî; têkstên folklorî; ferhengok ), Analyse linguistique, textes folkloriques, glossaries, Paris: 1975. 254 pages.  
 3 - Joyce Blau: Les perles d' un Colliers , Textes kurdes; ( Mirwarîn gerdanê, têkstên Soranî ), Paris: 1981. 95 pages.  
 4 - Joyce Blau: Mémoire du Kurdistan, Études et textes classiques et contemporaines, ( Bîranîna Kurdistané, Vekolîn û têkstên klasîk û nûdem ), éd. Findakly, Paris: 1984. 224 pages.  
 5 - Joyce Blau: Contes Kurdes ( Hekayetên Kurdi ), collection " Fleuve et Flamme ", Paris: 1986. 169 pages  
 6 - Joyce Blau: Trois textes de folklore Kurde ( sê têkstên folklorîkên Kurdi ), in Correspondance d' Orient études, Paris: 1980; pp. 29 - 50.  
 7 - Joyce Blau: " La Littérature Kurde ", " Ereb ŞEMO ", " Cigerxwîn ", " GORAN ", " Hêmin ", " Ehmedî XANî ", " Haci Qadirî KOYÎ ", " La revue Hawar ", in Dictionnaire des Littératures - Larousse, Volume 1 - 2, Paris: 1985, pp. 298, 458, 642, 697, 832, 847, 688.

8 - Joyce Blau: *Les Kurdes et le Kurdistan, Bibliographie critique 1977 - 1986*, Edition PEETERS, Paris: 1989.

9 - Joyce Blau:

- J. - R. BLOCH: *La nuit Kurde, Roman, éd. Bible*, Paris: 1946.

- Thomas BOIS: " Un Poète Kurde contemporain, Cegerxwîn ", in *Roja Nû*, N° 53, Bayrouth: Août 1945.

- Thomas BOIS: " Coup d' œil sur la littérature Kurde ", in Al - Machriq, Revue Catholique Orientale, PP. 201 - 240, Bayrouth: Mars- Avril 1955.

- Thomas BOIS: *Connaissance des Kutrdes*, chapitre 9 et 10, PP. 113 - 140, ed. Khayat, Bayrouth: 1965.

- Thomas BOIS: " Kurdes et Kurdistan, La Presse et la littérature ", in *Encyclopédie de l' Islam*, T. 5., KHE - MAHI, Paris: 1986.

- Thomas BOIS: " L' âme des Kurdes à la lumière de leur folklore ", in " Cahiers de l' Est ", Bayrouth: 1946, N° 5, PP. 56 - 80, et N° 6., PP. 79 - 104 "; tirage à part, Bayrouth: 1946.

- A. BRUNEL: *Gulusar, Contes et Legendes du Kurdistan*, éd. SFELT, Paris: 1946.

- Gérard CHALIAND: *Anthologie de la poésie Kurde*, éd. Stock, Paris: 1980.

- Ernest CHANTRE: *Recueil de Notices et Récits Kurdes*, Saint-Pétersbourg: 1860.

- Jean DURING: *Musique et Mistique dans la tradition Iranienne*, Paris: 1990.

L. GARIBIAN: " Les Kurdes de l' Arménie Soviétique ", in *Temps Nouveaux*, N° 34, Paris: 1949.

Clément M. HUART: " Prière Coranique Musulman, Poèmes didactiques en langue Kurde ", in *Journal Asiatique* N° 3, Imprim. Nationale, Paris: 1895.

A. JABA: *Recueil des Notices et Récits Kurdes*, Saint- Pétersbourg: 1860.

- Roger LESCOT: " Littérature Kurde ", in *Encyclopédie de la Pléiade, Histoire des Littératures*, Vol. 1., PP. 795 - 805, éd. Gallimard, Paris: 1977.

- Roger LESCOT: *Textes Kurdes, 1er partie: Contes, Proverbes et Enigmes*, Paris: 1940, 2eme partie: Mamé Alan, Bayrouth: 1942.

Roger LESCOT: *Proverbes Kurdes*, dans *Revue des Etudes Islamiques*, Cahier 4, PP. 307 - 350, Paris: 1937.

- Roger LESCOT: " La presse Kurde ", in *Roja Nû*, Bayrouth; Lundi: 3 Mai 1943.

- Luc Paul-Marguraitte et Kamuran BEDIRKHAN: *Etudes sur la poésie kurde*, éd. Berger-Lerault, Paris: 1937.

- Kamal MAAROUF: *Les Lurs, Le Luristan et le poète Baba Tahir Hamadanî*; le début de la littérature Kurde, Paris: 1989.

Kamal MAAROUF: *La vie et l' œuvres du poète Dildar*, Pzaris: 1989.

- G. MICHALIAN: *La musique kurde*, Hawar, N° 10, 23 Oct. 1932; p. 7.

- V. MINORSKY: " Kurdes et Kurdistan, La Littérature Kurde " in *Encyclopédie de l' Islam*, T. 2., E - K, Paris: 1927.

- J. DE MORGAN: *Mission Scientifique en Persse*, Vol. 2., Paris: 1904.

- Muhemmed MOKRI: *Recherches de Kurdologie, Contribution aux Etudes Iranien-nes*, Librairie Klincksieck, Paris: 1970.

- Muhemmed MOKRI: La légende de Bijan et Manija, Versiion populaire du Sud du Kurdistan, textes établis, introduction, traduction,- Librairie Klincksieck, Paris: 1966.

- Muhemmed MOKRI: L' Esotérisme Kurde, Aperçu sur le secret gnostique de Fidèles de Vérité, éd. Albain-Michel, Paris: 1966.

- Muhemmed MOKRI: Le Secret Indicible et La Pierre Noire en Perse dans la tradition des Kurdes et des Lurs Fidèles de Vérité ( Ahlî Haqq ), Librairie Orientale H. Samuelian, Paris: 1968.

- Basil NIKITINE: " La poésie lyrique Kurde " in Ethnologie, N° 45, Paris: 1950.

- Basil NIKITINE: Les Kurdes, cité pour La Littérature Kurde, Ch.12., PP. 255

- 297, Edition d' Aujourd' hui, Paris: 1959.

- Basil NIKITINE: " Ria Taze, Journal Kurde d' Erivan en U.R.S.S. ", in L' Afrique et l' Asie, N° 43, Paris: 1958.

Yachar KEMAL: Entretiens avec Alain BOSQUET, Gallimard, Paris: 1992. 175 pages.

Pères: Contes du Kurdistan, ed. Poésie vivante, Genève: 1985. 85 pages. 12 contes.

- Pierre RONDOT: " Publication Kurde en Caractères latins " Hawar"- Revue bimensuelle: Damas 1932 - 1933 ", dans Bulletin d' Etudes Orientales de l' Institut Français de Damas, T.2., P. 3 - 8., Damas: 1933.

- Pierre RONDOT: " Les émissions littéraires de langue Kurde de Radio- Le Caire et leurs representations ", dans L' Afrique et l' Asie, N° 44, Paris: 1958.

- Pierre RONDOT: " L' Alphabet Kurde en caractères latins d' Arménie Soviéтидие ", in Revue d' Etudes Islamiques, Cahier 3, Paris: 1933; p. 411 - 417.

- L. RAMBOT: Les Kurdes et le Droit, Les éditions du CERF, Paris: 1947.

Ereb SHEMO: Şivanê Kurde ( Le Berger Kurde ), Deux récits Kurdes traduits en français par Basil NIKITINE, éd. Institut Kurde de Paris, Paris: 1990.

- TAWUPAREZ: Melayé Djezrî (un poète Kurde, sa vie et ses œuvres ), in Hawar, N° 35, Damas: Nov. 1941.

Noureddine ZAZA: Contes et poèmes Kurdes, ed. peuples et création, imprimé en Italie: 1974. 64 pages; 7 contes et 7 poésies.

- Noureddine ZAZA: Ma vie de Kurde, éd. P.-M. FAVRE, Suisse: 1982.

- Bibliografija po Kurdovedeniju, établie par J. S. Musaelijan et publiée, sous les auspices de l' Académie des sciences de l' URSS., aux éditions V.L., Moscou: 1963, 184 pages. 2 690 titres, depuis le 17me siècle sur les Kurdes et le Kurdistan dans les langues européennes.

- I.S.K. 's Kurdish Bibliography, éditée par Silvio Van Rooy et Kees Tamboer, International Society Kurdistan, Amstrdam:1968; 2 volumes. A et B, 656 pages. 9 350 titres en différentes langues.

# AGORA

*Li ser daxwaza hin xwendevan û nivîskarêن Nûdemê, me bi navê AGORA quncikeke nû ve kiriye. Di vê quncikê de em dixwazin di warê dînyaya huner û kulturê de bi metoda pirs û bersivê dest bi danûstendineke din ji bikin.*

*Me ji bo her pirsekê 5 alternatiyv danîne. Ji van 5 alternatiyvan yek rast e. Binê alternativa ku hûn rast dibînin, xêz bikin û li ser navnlşana Nûdemê bîştin. Xelata 5 kesên pêşin yên bi kêmancî ji 10 pîrsan 8'an rast bibersivîn, abonetiya Nûdemê ya salekê ye. Ji bo her hejmarê xelatên cûda têne dayin. Bersivêvê ve hejmarê û navên xelatgiran dê di hejmara 9-an de bêne weşandin.*

N Ü D E M

Amadekar: Mustafa AYDOGAN

## 1- Xelata Nobel ya Edebiyatê.

Ji sala 1901'ê û vir de her sal li gor wesiyetnameya *Alfred Nobel* di roja wefata wî yanî di dehê Çileyâ Pêşîn de, di pênc şaxên cûda de xelatên Nobel têن belavkirin. *Xelata fizik û kimyayê* ji aliyê Akademiya Zanistê ve; *Xelata Fizyoloji* û tibê ji aliyê Enstituya Karolinayê ve; *Xelata Aştiyê* ji aliyê Parlementoya Norwêcê ve û ji 1969'an û vir de jî xelata şesan, bi navê *Xelata Ekonomiyê* ji aliyê *Banka Dewletê ya Swêdê* ve tê belavkirin. Gelo *Xelata Edebiyatê* ji aliyê kijan mueseseyê ve tê belavkirin?

- a- *Universiteya Uppsalayê*
- b- *Akademîya Swêdê*
- c- *Pirtûkxaneya Qiraliyetê ya Swêdê*
- d- *Parlementoya Swêdê*
- e- *Hukûmeta Swêdê*

## 2- Nav û paşnavê bestekarshî.

"*Dansa Ciwanêñ Kurd*" ji aliyê wî ve hatiye bestekirin. Ew di 06.06.1903' an de li Tiflisê hatiye dînyayê û di 01.05.1978'an de li Moskovayê wefat kiriye. Di nozdeh saliya xwe de ji *Gnessin* ders stend, dû re ket Konservatuara Moskovayê û bû şagirtê Wêsilanka û *Miyaskovski*. Di berhemên wî de jiyana mirovên Sovyetû bi awayekî xurt xuya dibe. *Gayane*, *Dansa Ciwanêñ Kurd*, *Lezgînkaya Gurciyan*, *Hopaka Ukraniyan* û *Dansa Şelaho ya Ermeniyan* mînakên ber bi çav yên têkiliya berhemên wî û kombînezona gelên Sovyeti ne. Wî bi "*Senfoniya Yekem*" nav da û bi saya *Gayanehê* jî di nav welatên rojava de cihê xwe girt.

- a- *P. Çaykovskî*
- b- *S. Prokofiyev*
- c- *A. Xaçatûryan*
- d- *D. Şostakoviç*
- e- *S. Rahmanînov*

### **3- Navê Berhemêke John Steinbeck.**

Ev berhem berê, di sala 1937'an de mîna piyesevê hatibû nivîsandin, lê tu kesî nexwest vê piyese bileyize, ji ber vê yekê wî ew berhemêka xwe mîna romanekê ji nû ve nivisi. Û ançax gava ev berhem mîna romanê bi ser ket, hingî mîna piyese li ser dik û sahneyên Amerîkayê û paşê ji li gelek deverê din yên dinyayê pêşkêşî temaşevanan bû. Navê vê berhemê ji ji helbesteke helbestavanê Skoçî *Robert Burns* hatiye wergirtin. Navê herdu karekterên sereke yên romanê *George û Lennie* ye.

- a- *Rêya Bihiştê*
- b- *Mîşk û Mirov*
- c- *Tiriyên Xezebê*
- d- *Heyv Çû Ava*
- e- *Otobusa Evînê*

### **4- Berhemêke Bethoven.**

Bethoven di 1802'an de dest bi vê berhemê kiriye û xebata wî ya li ser vê berhemê sala 1803'an jî bi temamî daye ber xwe. Bethoven li ser vê esera xwe ji ber hîsên xwe yên azadî, biraû û wekheviyê navê Napolion yê ku li gor wî mîna simbola van hîsan hatibû xuyakirin nivîsandibû. Lê gava mirovê ji Korsikayê yanî *Napolion* di 1804'an xwe imператор ilan kir, Bethoven xeyalşikestî bû û navê wî ji ser senfoniyê xera kir û ji berdêla navê wî navê wê yê ku heta roja hatiye nivîsand. Ev senfonî bi *Senfoniya No:3* jî tê naskirin.

- a- *Pastorale*
- b- *Eroica*
- c- Qeder weha li derf dixe
- d- *Fidelio*
- e- *Tava Heyvê*

### **5- Nav û paşnavê nivîsharkî.**

Pêşevanê Naturalizmê ye. Bavê wî itâli û diya wî fransî bû. Di 02.04.1840'ı de li Parisê hate dinyayê, di 18.09.1902'an de ji gazê jehrî bû û çavên xwe li vê dinyaya gewrik girt. Di koleja Aixê de dest bi xwendinê kir û li Parisê dewam kir. Lê di îmtihanان de bi ser neket û xwendina xwe ya huqûqê nîvco hişt. Derdê feqîriyê kişand, ji aliyekevî ve li lîman û pirtûkxaneyan dixebeitî û ji aliye din ve jî di rojnameyan de rexne dinivîsand. Ji xwe xebata wî ya li ser romanen jî li vir dest pê dike. Di daweya bi nav û deng "Daweya Dreyfus" de aliye Dreyfus girt û li hemberî edaleta Fransayê derket. Jiyana civakî bingeha romanen wî bû. Romanen wî mîna laburatuareke civakî ye. Di romanen wî de xweza û civak weke xwe têne xuyakirin. Li gor wî; mirov ne mexlûqekî bi serê xwe, ne ferdekî bi sir û ne berhemê tesadufan e. Mirov berhemê bûyerên yekgirtî ye loma jî ji bo fahmkirina wê divê li wan baş bête kolandin.

Hinek ji berhemên wî ev in; *Rüpele Evînê, Meyxane*.

- a- *Emile Zola*
- b- *Henri Barbusse*
- c- *Honoré de Balzac*
- d- *Albert Camus*
- e- *Simon Claude*

## **6- Pêşevanê fîkrî û edebî yê existentialismê.**

Di navbera 21.06.1905'an û 15.04.1980'yi de jiwaye. Beriya herba cihanê ya duyem li gelek deveran mamestetiya felsefeyê kiriye. Di herbê de dikeve destê *Almanan*, lê pişti demekê ji kampa êşiran direve û dibê yek ji wan pêşevanên tevgera berxwedanê. Di 1964'an de di warê edebiyatê de layiqî *Xelata Nobel* hate dîtin. Lê wî ji ber baweriya "Ger giraniya tesîrên derve tev hêza bêjeyan bibe, dê neheqî li xwendevanan bête kîrin" ev xelat qebûl nekir û paş de vegerand. Ew di wê pirtûka xwe ya ku navê wê "Eksistensiyalîzm Humanîzm e" de, fîkrêن xwe yên di derheqa vê ekolê de bi awayekî fireh dide diyar kîrin. *Sensa Talî*, *Çaxa Eqil*, *Mirina di Hundurê me de*, *Desten Qirêjî*, *Miriyêñ Bêmezel*, *Seytan û Xwedê* hinek ji berhemên wî ne.

- a- *Bertolt Brecht*
- b- *Heinrich Böll*
- c- *Jean Paul Sartre*
- d- *Milan Kundera*
- e- *Aleksandr Soljenitsîn*

## **7- Nivîskar û ramanwerchî pirrhêt.**

Di sala 1872'an de hat dinyayê, dema ku wefat kir emrê wî 98 sal bû. Di 78-saliya xwe de yanî di 1950'î de, di warê edebiyatê de *Xelata Nobel* wergirt. Ew bi xwe bi matematîkî û felsefeyê ve mijûl dibû û berhemên xwe yên herî balkêş jî di van waran de afirand. Lê di warê edebiyatê de jî bi qasî ku bigihêje dereceya stendina xelata Nobel, berhemên xurt afirand. Wî hukûmeta federal ya dinyayê diparast û ji ber fîkrêن xwe jî mîna "Voltaire" yê hevçax hate bi navkirin. Di sala 1920'î de diçe Rûsyayê û Lenin dibîne, lê pişti vegera xwe, pirtûkek bi navê "Bolşevizm, Teorî û Pratîk"ê dinivîsîne; di wir de helwesta xwe ya li hember vê pêvajoyê diyar dike. Di salên 1960'î de jî li hember siyaseta *Dewletên Yekbûyî yên Amerikayê* derket. Li unîversiteyên Londrayê profesortî kir û li yên Chicago û California'yê jî wek mamesteyê mîvan ders da. Li gor wî; "Ger mirovatî çend nesil li dû hevdû bikarîba bê herb bijiya, wê gavê herb dê mîna duelloyê komik bîhata dîtin."

Li gor rîwayetekê, di nava wî û qiraliçeya Brîtanyayê de, sohbeteke weha derbas bûye: Qiraliçeya Brîtanyayê jê re dibêje, "ger ez û tu bi hevdû re bizewiciyana, wê zarokên me mukemel bûwana; mîna te biaqil û mîna min xweşik." Nivîskarê me jî weha bersiv dide, "Qiraliçeya min, bifikire ku berevajiya wê çêbîba; mîna min ne xweşik û mîna te bêaqil."

- a- *Arthur Miller*
- b- *Bertrand Russel*
- c- *Ernest Raymond*
- d- *Ezra Pound*
- e- *Rafael Sabatînî*

## **8- Ramanwerê azadiyê û edebiyatvaneh.**

Di sala 1694'an de li Parîsê hate dinyayê, navê wî esil "*François Marie Arouet*" Pişti xwendina huqûqê, ji ber fîkrêن xwe yên azadiyê û helwesteya xwe li hember paşverûtiyê dikeve hefsê, pişti derketina ji hefsê, mecbûr dimîne ku têkoşîna xwe li derveyî Fransayê bidomîne. Pişti mirina *Luisê Panzdehem* vedigere Parîsê. Xelk vegera

wî bi merasîmêne gelekî mezin pîroz dike. Pişti vegera xwe bi sê mehan, yanî di sala 1778'an de wefat dike.

Dêra Fransayê ji ber Xwedênenasiya wî veşartina wî qebûl nekir. Lê ew pişti demekê di nav Fransiyê navdar de li "Panteone" yê hate veşartin. Wî weha digot: "Ez ji fîkrêne nefretê dikim, lê ji bo azadiya parastina fîkrêne we, ger pêwîst be, ez amade me ku canê xwe fedâ bikim."

Wî di hemû jiyana xwe de ji bo azadiyê û toleransê şer kir, sedsala hîjdehem ya Ewrûpayê di bin tesîra fîkrêne wî de bat jiyandin. Di warê helbest, rexne, name, dîrok, felsefe, çîrok, roman û tiyatroyê de gelek berhem afirandine. Hinek ji berhemên wî ev in: *Oedipe*, *Brutus*, *Nameyên Britanyayê*, *Zadig*, *Candide*, *Ferhenga Felsefeyê* û hwd...

- a- Jean Jacques Rousseau
- b- Voltaire
- c- Diderot
- d- Victor Hugo
- e- Anatole France

#### 9- Helbestvanê vê helbesta ku du çarîn jê hatiye wergirtin.

Îro ji destê dîlberê  
Pir bû li min fîkr û xeyal  
Bedhal kirim dêmenwerê  
Wextê ku min dî ew xezal

Wextê ku min dî ew leşîf  
Qamet ji reyhana xesîf  
Min dî di xalê da nezîf  
Têtin ji min sed nalenal

- a- Feqiyê Teyran
- b- Ehmedê Xanî
- c- Eli Herîrî
- d- Siyahpos
- e- Mele Ehmedê Bateyî

#### 10- Dî huner û edebiyatê de sholek.

Navê vê ekolê di sala 1916-an de ji aliyê helbestvanê Romanî, Tristian Tzara hatiye danîn. Di şertê herba cîbanê ya yekem de, di nava wan kesen ku ji ber herbê reviyabûn û li bajarê Zurîhê civiyabûn, mîna ekoleke norm û prensipnenas derket ortê. Di destpêkê de, li hember kultura dînyaya rojavayê mîna reaksiyonekê xuya bû, lê dû re bû aksiyonek ku hemû têkiliyên xwe ji vê dînyayê qut kir. Hemû ekolên beriya xwe bi perçeyek ji çerxa herbê tawanbar dikirin. Temsilkarên wê li hember dînya medenî û hemû qaîdeyan serî hil didan. Ew hem li hember qaîdeyên estetikê û hem jî li hember yên zimên derdiketin. Di berhemên wan de, peyv ji kontrola şûrû rizgarkirî û gelek caran bi awayekî serberjîr dihatin nivîsandin; hece bi awayeke bêmane dihatin ba hevdû; ji kaosa peyvan helbest dihatin afirandin(mîna Richard Hulsenbeck). Di warê resimê de jî perçeyen kaxizan û yên camên şikesî bi cawêن tabloyan zeliqandin, xusûsiyeta wan ya herî berbiçav bû (bo numûne, tabloyen Hans Arp). Max Ernst, Francis Picabia û hwd hinek ji pêşevanên vê ekolê ne.

- a- Surrealîzm
- b- Futurîzm
- c- Existensiyalîzm
- d- Expressiyonîzm
- e- Dadaîzm

# Li Mala Osman Sebrî

Firat CEWERÎ

*Osman Sebrî jî ji nav me koç kir. Lêdan, girtin, zîndan û sîrgûnan hêviya wî ya Kurdistanekê azad neçilmisand. Ew heta dawiya umrê xwe bi wê hêviyê jiya. Bi koçkirina apê Osman, di dîroka miletperwerî û rewşenbîriya Kurdistanê de rûpelek hate girtin. Ew endamê dawî yê ekola Hawarê bû. Mîna endamên din yên vê ekolê, keda Osman Sebrî jî di warê ziman, edebiyat û hîgyarbâna gelê kurd de pir e.*

*Bi hêviya ku wê nivê nû xebatên nîvcîmayî yên ekola Hawarê bidominin, em ji malbata Osman Sebrî û gelê kurd sersaxiyê dixwazin.*

*Herweha em vê hevpeyvîna li jêr, ku di sala 1987'an de li mala wî ya li Şanê pê re hatibû çêkîrin û di eynî salê de di Kurdistan Pressê de hatibû wesandin, careke din diweşînin.*

**E**z her tim li navekî rast dihatim. Min kijan kovar û rojnameyên kurdan yên kevin vedikir, navek dihate ber çavên min. Di binê pir helbest, çîrok, bend û nîvisên li ser ziman de navekî ku ji min re ne biyanî bû, hebû. Dû re li Ewrûpa di bin navê Apo de pirtûkeke helbestan derket. Ev nav roj bi roj dihate dîtin û li ser dihate peyivandin. Ev nav, navê Osman Sebrî bû. Navê hevalê gorbuhişên Celadet, Cegerxwîn û Qedîrcan bû. Navê hevalê marmoste Nûredîn Zaza bû.

Rojek ji rojêñ nîsana 1987'an ji bo ku ez xwedîyê vî navî bibînim, ez digel dostekî, li Şamê, bi Ruknedîn ve bi hewa ketim. Ruknedîn bilind e, weke çiyayekî ye. Xanî di qûn hev de û li ser hev hatine lêkîrin. Gava mirov ji jêr ve lê dînihêre, xanî taa bi serê çiyê weke derencan dixuyin. "Tu vê taxa han dibînî, heyâ bi serê çiyê piraniya wan



*F. Cewerî, Osman Sebrî û Ezîzî Ekrawî li mala Osman Sebrî*

"kurd in" dostê ku bi min re bû ji min re got. "Kurd her tim xwe wilo li cihêن bilind digirin". Ma bilindahî jî peyv e, beta ku em gihîştin ber mala Osman Sebrî, ez di xwêdanê de mabûm. Em hebekî li ber derî rawestiyâ, me xwêdana xwe pakij kir û paşê me li derî da. Pir tê re neçû, peyayekî kal û bezinkurt ji me re derî vekir. Ew peya

Osman Sebrî bû. Me destê hevdu hejand û min ew bi hesreta salan hemêz kir. Gava wî destê min guvaştibû, bawer bikin destê wî mîna destê xortekî bîst salî zexim bû. Bi wî awayî wî da pêsiya me û em birin odeya xwe ya rûniştinê. Ode piçûk bû, an jî ew ji min re piçûk hat. Raxistina odê ji du dîwan, maseyeke piçûk û çend kursiyan pêk dihat. Her çar dîwar jî bi wêneyan ve xemilandî bûn. Pişti ku min çavek li hundur gerand, êdî min awira xwe dagerande ser wî. Bala min her li tevger, peyv û rabûn û rûniştandina wî bû. Min ew peyayê mezin û bi nav û deng, di odayeke piçûk de zept kîribû.

- *Ê apo, tu çawa yî, saeta te çawa ye?*

Ji ber ku guhêñ wî giran bûbûn, deng neçûyê. Min pirsa xwe ducare kir:

- *Apê Osman tu çawa yî, tu rehet ??*

- Wele jî aliyê giyanî ve ez çûme û min tu caran jî rehetî nedîtiye. Kurdêñ bi namûs

û rehetî? Serê me kurdan her tim di bele û teşqeleyan de ye. Dijminê me jî mar e, ew xwe bi hêsanî berdide nava me û jehra xwe di nava me de belav dike. Kengî ku me ev marê fenek kuşt, hingî em ê rehet bibin...

Wî ji nişkê ve peyva xwe birrî, weke çipiskê ji cihê xwe pekiya ber derfî û bi dengekî bilind bang kir:

- Kewêê!... Kewêê!... Ka tu ji mîvanan re çayekê çenakî keça min?

Piştî kurtedemekê Kewê çaya me anî. Apê Osman sênîk ji desîê wê girt û wî bi xwe çayê li me belav kir.

Hîn berfî ku ew li cihê xwe rûnê, mîna ku wî dizanîbû ez ê çi jê bipirsim, dest bi peyvê kir:

- Rehetî? Ji me re rehetî tuneye, bavo! Dermanê rehetiya me yekîtiya me ye. Lî hezar heyf û mixabin ku em nabin yek. Em bûne eşîr û em bi serê eşîrtiyê dimeşin. Em do çi bûn, em îro jî ew in. Em bûne peyayêن xelkê. Hin ji me bûne peyayêن erekban, hin bûne yên farisan û hin jî bûne yên tirkan. Dibêjin em komunist in, lî bi serê bûrjûvazî dimeşin. Ma welê dibe? Em ê bi vî awayî çi saff bikini?

Gava dipeyivî, carinan hêrs dibû, radibû ser xwe û dîsan rûdiniş. Bi qasî ku ew bi dev dipeyivî, ew ewqasî jî bi destan dipeyivî.

- Dibêjin em komunist in, lî bi zimanê xwe napeyivin, naxwazin bipeyivin. Li malên xwe, bi jin û zarokêن xwe re bi tirkî, bi erebî û bi farisî dipeyivin. Lî bi kurdî napeyivin, naxwazin... Ma komunistû welê dibe? Wey xwelî li serê me be!...


Herçiqaş min pirsên li ser edebiyat û kulturê jê dipirsî jî, ew dîsan dadigeriya ser siyasetê.

- Ger em ji xwe re nebin, kes jî ji me re nabin û em ji kesî re jî nabin. Kengî ku em bûne destek, hingî dê herkes li ber me biggerin. Lî ka ew roj? Ne ku ew roj nayê, lî wê pir bikişîne. Divê em pir bixebitin, pir xwe biêşînin, da ku em bigihîjin mafê xwe. Na, ku em li malên xwe rûnê, lingêن xwe biavêjin ser hev û behsa azdiyê bikini, em ê her tim welê bindestê xelkê bin.

Tiştîn ku min ji peyv û gotinêن wî fêhm kirin, ew ji nivîskar û helbestkarekî wêdetir têkoşerek bû. Têkoşerekî ku bi salan bêwestan xebitîye, bêhejmar car hatiye girtin, işkence û lêdana nemirovi dîtiye û digel vê jiyana bi trajedî jî, ew hîn bi hêviya Kurdis-taneke azad dijî.

Şam, 1987

# BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!



Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolin, huner, sînema  
û hwd. hebe, pêşniyareke me heye; bibe aboneyê NÛDEMÊ!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya herçar perçeyên welêt haydar bibî û  
edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê  
NÛDEMÊ!

NÛDEM dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu ji alîkariya wê bikî,  
bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re  
min bikin aboneyê NÛDEMÊ.  
Ji bo Swêd salekê 190 Skr. Welatên din 39 \$

Nav û paşnav.....

Navnîsan.....

Vê karta jor dagirin û fotokopiya wê li ser navnîşana NÛDEMÊ bişînin. Çer ku ew  
bigihîje me, em ê NÛDEMÊ di gel karta abonetiyê ji we re bişînin.

**NÜDEM**


No 1 1993



Kevra Hünç, Edebi & Çandı

**NÜDEM**

No 2 1993



Kevra Hünç, Edebi & Çandı

**NÜDEM**

No 3 1993



**NÜDEM**

No 4 1993



**NÜDEM**

No 5 1993



Kevra Hünç, Edebi & Çandı

**NÜDEM**

No 5 1993



Kevra Hünç, Edebi & Çandı

**NÜDEM**

No 6 1993



Kevra Hünç, Edebi & Çandı

**NÜDEM**

No 8 1993



Kevra Hünç, Edebi & Çandı

**NÜDEM  
BÛ  
DU SALÎ**

**DUSALIYA NÜDEMÊ PÎROZ BE!**

**NÜDEM**

**No 8 1993**